

# **Abdurehman Nacîm**

## **Edîb, Şâîr, Perwerdekar, Hiqûqnas**

**Seîd VEROJ**

**İsmail Beşikçi Vakfı Yayınları**

**Abdurehman Nacîm  
Edîb, Şâîr, Perwerdekar, Hiqûqnas  
Seîd VEROJ**

İBV Çapa Yekem: Tîrmeh 2017, Stenbol  
Edîtor: **Seîd VEROJ**

Dîzayna Berg: Şemal Medya  
Çap:

Kayhan Matbaası

Bakır ve Pirinç Sanayicileri Sitesi, Orkide Cad. No: 9  
Zemin Kat Haramidere / Beylikdüzü-İstanbul

Tel: 0 212 576 01 36

Kayhan Matbaası Sertifikası: 12156

Roni Yayın Sertifikası: 25474

**ISBN: 978-605-85491-7-3**

Ji bili jêgirtin û danasînê, bi tevayî an hin beşen pirtûkê bêyî  
destûra nivîskar, Weqfa Îsmaîl Beşîkcî û Roni Basın Yayın  
Ltd. Şti. nayê çapkîrin û belavkirin.

**İsmail Beşikçi Vakfı Yayınları**

Roni Basın Yayın Tanıtım Dış. Tic. Ltd. Şti

Kuloğlu Mah. İstiklal Cad.

Ayhan İşık Sok. No:21/3 Beyoğlu/İstanbul

Tel: 0212 245 81 43

GSM: 0541 391 81 49

e-mail: roniyayin@gmail.com

# **Abdurehman Nacîm**

## **Edîb, Şâîr, Perwerdekar, Hiqûqnas**

**Seîd VEROJ**

**İsmail Beşikçi Vakfı Yayınları**

**Seîd VEROJ:** Sala 1966ê li Diyarbekir ji dayik bû. Dibistana serayî li gund, navendî, lîse û Unîversîte li Dîyarbekir xwend.

Xebatên wî yên li ser kurdan, di salên xwendina unîversîteyê de dest pê kirine. Di sala 1997an de bi tevî hinek hevalên xwe dest bi weşandina kovara *Warê* kir û hetanî sala 2004ê edîtorîya weşan û kovara *Warê* domand. Di Newroza sala 2005an de weşanxaneya *Bîr* damezirand û dest bi weşandina kovara *Bîr* kir. Ji Mijdara sala 2011yê vir ve kovara *Bîr*; bi awayekî dijîtal li ser navnîşana [www.kovarabir.com](http://www.kovarabir.com) weşana xwe berdewam dike û ew jî sernivîskar û edîtorê vê malperê ye. Di sala 2011yê de li Unîversîteya Artuklu ya Mardinê dest bi xwendina masterê kir û di destpêka sala 2014yê de bi pêşkêşkirina têza xwe ya bi navê “*Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancî/ Hevberkîrina Gramera Zazakî û Kurmancî*” xwendina masterê xelas kir.

Berhemên wî yên çapkirî:

- *Rêzepirtükên Zarokan* (li ser hev 6 pirtûk, Weşanên War, Stenbol, 2001)
- *Ferheng-Vajname: Kurmancî - Hewremanî - Dimîlî - Sennadajî* (Seîd Veroj- Abdurehman Uçaman, Weşanên War, Stenbol, 2002)
- *Ferhengê: Kurmancî - Dimîlî - Tirkî û Tirkî- Dimîlî Kurmancî* (weşanên War, Stenbol, 2002)
- *Di Dîroka Me ya Nêzîk de Büyereke Girîng: Kuştina Seîd Elçî û Dr. Şivan* (Weşanên Bîr, Dîyarbekir, 2005)
- *Dadgehkirina Pêşewa Qazî Mihemed* (Weşanên Bîr, Dîyarbekir, 2007)
- *Geşepêdanê Rojhelatanavîn, Sûriye û Kurdistana Rojava* (Weşanên Doz, Tîrmeh 2012, Stenbol)
- *Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancî/ Hevberkîrina Gramera Zazakî û Kurmancî: Dîyalekt, Alfabe û Fonetîk, Morfoloji* (Weşanên Ava, Dîyarbekir, Gulana 2014)
- *Mehmed Mîhrî Hîlav û Kovara Kurdistan* (Weşanên Weqfa İsmail Beşikçi Vakfı, Stenbol, Tebaxa 2015)
- *Mewlanzade Rîfat û Rojnameya Serbestî* (Weşanên Weqfa İsmail Beşikçi Vakfı, Stenbol, Tebaxa 2017)

## Têdeyî

Pêşgotin .....	9
----------------	---

### Beşa yekem (I)

1. Ciyê ji dayikbûn, malbat û xwendina wî .....	11
2. Hatina Stenbolê û destpêkirina karê matbûat û kutibxane-yan.....	12
3. Abdurehman Nacîm ji karê Îlmîyeyê derbasê Mûlkîyeyê di be.....	14
4. Bersiva Konsolosê îngiliz .....	16
5. Tevgera Şêx Ubeydullahê Nehrî, sîyaseta Brîtanya û xabata Mr. Trotter .....	24
6. Xwendin û şiroveya metnê .....	27
7. Di pêşkevtina edebiyatê de rola çapemeniyê .....	29
8. Nivîsên li ser edebîyatê .....	32
9. Pesnê Xan Abdulhemîd .....	36
10. Nivîsên wî yên di rojnameya Tercûmanî Haqîqet de ....	39
11. Keyfi kî ye? .....	41
11.1.Bersiva Mr. Trotter ê Konsolosê Brîtanî yê Diyarbe- kirê.....	46
11.2. Nivîsên wî yên di rojnameya Tercûman-i Hakîkat de .....	52

### Beşa duyem (II)

1. Berhemên Abdurrehman Nacîm .....	56
1. 1. Defter-î Kütübhane-yî Damad Îbrahîm Paşa .....	57
1. 2. Teshîlût -Tahsîl .....	58

1. 3. Defter-î Kütübhane-yî Ragip Paşa .....	58
1. 4. Safvetûl-Kelam .....	60
1. 5. Hûvîyet-î Subhanî ve Mahîyyet-î Însanîye .....	61
1. 6. Rahnameyî Dîyarbekir .....	63
1. 7. Türkçe Mantık Hulasası [Xulaseya Mantiqê Bi Tirkî]... 84	
1. 8. Hedîyetû'l-Umem ve Yenbuû'l Adab ve 'l-Hîkem.	85
1. 9. Gulzar-î Asar .....	85
2. Dawî .....	88

### **Beşâ Sêyem (III)**

1. Hinek nivîs û helbestên Abdurehman Nacîm û Keyfî di nav rûpelên Tercûman-i Hakîkat (Tercûmanî Heqîqet] de .....	89
1. 1. Kürdistan ve İstanbul gazetesi/ İmzasız .....	90
1. 2. Varaka: Kürdistan .....	93
1. 3. Kürdistan .....	97
1. 4. Mesele-i Medeniyet ve Ruhbaniyet [Medeniyet meselesi ve ruhbanlık] .....	100
1. 5. Kurd kiyamında reng-i siyasi .....	104
1. 6. Kürdler iddiasına mukabil, tarafsızlık veya taraftarlık .....	106
1. 7. Gazel (Kurdî) .....	110
1. 8. “Cevabnam-î Manzum” .....	113
1. 9. Arap edebiyatı ve İslam siyaseti-1 .....	117
1. 10. Arap edebiyatı ve İslam siyaseti-2 .....	119
1. 11. Arap edebiyatı ve İslam siyaseti-3 .....	122
1. 12. “Britanya konsolosuna cevap” .....	124
1. 13. Funun-Kürdler .....	131

1. 14. “Başlıksız şiir” .....	134
1. 15. “Başlıksız nazire” .....	135
1. 16. “Gazel” .....	136
1. 17. “Başlıksız Nazire” .....	137
1. 18. “Sait Paşa yazılan başlıksız nazire” .....	138
1. 19. “Başlıksız Gazel” .....	138
1. 20. “Nuance Kelimesi üzerine” .....	140
1. 21. Türkçe Mantık Hulasası .....	141

## **Jêder**

1. Weşanên peryodîk .....	148
2. Pirtûk .....	149
3. Malperên internetê .....	150



## Pêşgotin

Bûyer û rûdanên sedsala nozdeyan, hem li cîhanê û hem jî di nav Împeratorîya Osmanî de encamên pirr girîng derxistin meydanê. Bi taybetî jî Peymana Berlinê (1878) û Şerê navbera Împeratorîya Rus û Osmanîyan; qrifzên aborî, sîyasî û civakî yên nava Împeratorîya Osmanî kûrtir û berfirehtir kirin û bûn sebebê guherîn û têkçûna pergala Împeratorîyê. Siltan Abdulhemîd II., di navbera Meşrûtiyeta Yekemîn û Meşrûtiyeta Dûyemîn de, gelek caran hewl da ku di çarçoveya “Yekgirtina Musilmanan” de fikra “Osmanîparêzîyê” bi pêş bixe û bi vê awayî împeretoriyê li ser hev bigre, lê bi ser neket.

Herweha vê rewşa hanê, bandoreke girîng li ser rewşa aborî, komelayefî û sîyasî ya Kurdistanê jî kir. Sîstema otonom a mîrnîşîniyê li Kurdistanê bi dawî hat, pêşengî û serokatîya tevgera civakî û sîyasî ya Kurdistanê derbasê tebeqeya şêx û ulema bû. Di sala 1878an de, hewldana serhildana Husêن û Osman Paşayên Bedirxanî, xeleqeya dawî ya vê dewrê bû. Du sal pişfî vê hewldanê, di 1880an de bi serokatîya Şêx Ubeydulahê Şemzînî tevgereke nû dest pê kir. Şexsiyet û bûyerên ku bûne mewzûya vê xebatê jî, divê di bin bandor û rewşa vê demê de bêne xwendin.

Xusûsiyeteke Împeratorîyê jî ev e ku di nav de gelek qewm, kom û komikên etnîkî, dînî û kulturî bi hev re dijîn. Ziman û edebîyateke neteweyî ya Împeratorîyê tune bû. Gelek nivîskar, edîb û entellektuelên împeratorîyê di kar û xebatên nivîskarî de, zimanê cihê cihê bi kar anîne; yanî ew nivîskarên pirrzimanî yên împeratorîyê bûn. Dema em bala xwe bidin zimanê nivîsandin û nivîskarên wê demê, weha dîyar dibe ku digel zimanê xwe yên qewmî pirranî bi zimanê erebî, farisî û osmanî nivîsandine.

Di salên dawî yên împeratorîyê de, ji ber bandora belavbûna fîkrîn neteweyî, peyderpey di nav kurdan de jî fîkrîn kulturî yên qewmî [neteweyî] peyda dîbin. Netewetiya kulturî, di bin bandora bûyerên sîyasî yên wê demê de, pêşiyê bi

rêya çapemenî û çalakîyên kulturî geş dibe û paşê jî di warê sîyasî û rêxistinîyê de. Di vê çarçoveyê de, berhemên nû yên edebîyata kurdî jî di vê demê de peyda dibin. Edîb û nivîskarê kurd, êdî qîma xwe bi dubarekirina teşbîhên şairên berê naînin. Şair û rexnegirê kurd Keyfi, di nivîseke xwe de pêdi-vîya guherîna naveroka berhemên edebî û cûreyên ciyawaz ên nivîsinê weha tîne ziman û dibêje: “Nabe ku meriv her daîm bi dubarekirina teşbîhên şairên berê, şîr nivîsandinê ji xwe re bike sermîyan. Berîya ku meriv bi van xîyalêney beyxude re mijûl be, mijûlâyîya bi îlmên pozîtif re bêtir faydedar e.”

Di wê demê de parastina hebûna edebîyat, ziman û kultura kurdan, bi kurdî nivîsandin, helwesteke cihê bû û destnîşankirina cûdayîyek kulturî ya neteweyî bû. Divê nêrîn û helwesta rewşenbîrêne wekî Abdurehman Nacîm, Keyfi, Hesen Zûhdî û hevalên wan jî di vê çarçoveyê de bête nirixandin. Em dikarin xebat û çalekîyên kulturî û rewşenbîrî yên di navbera Meşrutîyeta Yekemîn û Duyemîn de, ji alîyekî ve wek destpêka fikra neteweyî ya kulturî qebûl bikin. Lîbelê di wateya xwe ya modrn de, berhemên edebîyata kurdî ancax piştî Meşrutîyeta Duyemîn, bi rêka kovar û rojnameyên wê demê peyda bûne.

Pirranîya belge û materyalên vê pirtûkê, bi lêgerîn û lêkolîna li ser hejmarêne rojnameya *Tercüman-ı Hakikat [Tercümanî Heqîyet]* derketine holê. Bawer dikim rojnameyên dema Dewleta Osmanî bi awayekî berfireh bêne lêkolandin, dê li ser kurd û Kurdistanê gelek materyalên nû yên balkêş derkevin ronahîyê.

Di peydabûna vê xebatê de keda gelek dost û hevalan heye, bi taybetî mamoste Cemîl Amedî bi wergerandina met-nêne Osmanî û A. Meretowar jî bi hesasîyetek zimanheziyê ji bo sererastkirina zimanê metnê keda xwe ya birûmet û nûrê çavan rijandine. Herweha hevalên ku navê wan nehatiye nivîsandin û keda wan di vê xebatê de çê bûye, ji bo wan jî gelek sipas dikim.

16.03.2017

# Beşa yekem

## 1. Ciyê ji dayikbûn, malbat û xwendina wî

Abdurehman Nacîm, entellektuelekî tewr girîng ê dema xwe û miletê kurd e, li ser babetên cûr bi cûr xebat û nivîsên wî hene; ew bi nasnamaya xwe ya perwerdekarî, hiqûqzanî, edîbî, şâîrî û karê tesnîfkirina kutbxaneyan tête naskirin.

Li ser ciyê ji dayikbûna wî hemfîriyek giştî heye; ku ew li bajarê Silêmanîyê ji dayik bûye, endamê malbateke namdar û giragir ê vî bajarî ye. Li gor lêkolîner Alî Bîrîncî, “ew, di 21ê Gulana 1833-9 Gulana 1834ê de li qezaya Şehrezor a girêdayî bajarê Silêmanîyê ji dayik bûye. Navê bavê wî Mihemed Beg e, ji mîrekên Silêmanîyê û kesayefîyeke navdar ê wê deverê bû. Abdurrehman Nacîm bi leqeba xwe ya Mewlanbegzade jî tête nasîn.”<sup>1</sup> Lêkolîner Îbrahîm Goksel jî dibêje: “Mewlanbegzade Abdurehman Nacîm Efendî, sala 1832an li Silêmanîyeya Iraqê ji dayik bûye. Navê bavê wî Mihemed Beg e û ew ji



Abdurehman Nacîm

<sup>1</sup> Ali Birinci, *Tarih Gölgesinde Meşâhir-i Meçhûleden Birkaç Zât [Di Siya Dîrokê de ji Meşâhirên Meçhûl Çend Zat]*, bn. Sicill-i Ahval Defteri (BOA. C. 18, s 125), Dergâh Yayınları, 2001, İstanbul, r. 287

malbateke navdar û giregirêن mîrekêن Silêmanîyê bû. Li wê deverê malbata wan bi navê Mewlanbegzadeyan tête nasîn.”<sup>2</sup>

Wî, tehsîl û “Xwendina xwe, di medreseyêن Silêmaniye û Bexdayê de îkmal kirîye û îcazeta xwe girtîye.”<sup>3</sup> “Di 21 salîyê de selahîyeta îrşadê û di 23 salîya xwe de jî selahîyeta îcazatê ji Şêx Osman Siracedîn Efendî yê Tawîlan wergirtîye ku ew jî xelifeyê Mewlana Xalid bûye. Ji wê şûn ve nêzîkê 4-5 salan di medreseyêن Bexdayê de li ser îlmên Îslamî ders dane.”<sup>4</sup> Li ser dewra zaroktî û ciwantîya wî, agadarîyên berfireh li ber destê me nîn in. Pişti temamkirina xwendinê, “qasî 4-5 salan di medreseyêن Bexdadê de li ser îlmên Îslamî ders daye. Li gor dosya wî ya sicîlê; bi zimanê turkî, erebî û farisî dixwend û dînîvîsand, herweha muqtedîfrê axaftina zimanê kurdî bû.”<sup>5</sup> Wî heman demî perwerdeyîya hiqûqê dîtîye û ew di tesewufê de girêdayî terîqeta Neqşebendî bû.

## 2. Hatina wî ya Stenbolê û destpêkirina karê mat-bûat û kutibxaneyan

Qasî ku tê zanîn ew di dawîya salên 1850yan de hatîye Stenbolê. Ji salên 1850yan şûn ve li paytexta Osmanîyan hejmarâ kutibxaneyên giştî zêde dibin û digel wan, kutibxaneyên weqfan jî têne damezirandin. Lîbelê rêz û sîstemek van kutibxaneyan tune bû. Ji ber vê, nîşandana agahdarîyêن li ser bîblîyografiya berhemên nivîsandî û hêşankirina karê xwendevanan, dirûstkirina katalog û îndeksên pirtûkxaneyan wek pêdivîyekê dertê meydanê. Di dema Dewleta Osmanî de cara pêşî di navbera salên 1850-1854an de xebata li ser katalog

<sup>2</sup> İbrahim Göksel Baykan, *Abdurrahman Nâcim Efendi ve ilk kütüphane katalogları*, <http://web.firat.edu.tr/harput/sempozyum/2/19.%20%C4%B0.G.Bayan.pdf>, 29.10.2015

<sup>3</sup> Ali Birinci, J. b., r. 287

<sup>4</sup> İbrahim Göksel Baykan, [http://www.yek.gov.tr/Link/ShowLink?LINK\\_CODE=50&LAN\\_CODE=TR](http://www.yek.gov.tr/Link/ShowLink?LINK_CODE=50&LAN_CODE=TR), 25.11.2015

<sup>5</sup> İbrahim Göksel Baykan, J. b., 29.10.2015

û ïndeksên pirtûkan têne amadekirin û çapkiran. Abdurehman Nacîm, di 9ê Temûza 1861an de ji bo Mifetîşıya Kutibxaneyên Dersadetê tête tayînkarin. Di tayînkarina vî karî de, zanîn û tecrûbeya wî ya di medreseyên Kurdistanê de wek referans hatiye qebûlkirin. Herweha ew di dereceyeke bilind de weqfê ziman û edebîyata erebî, farisi û osmanî bûye.

Abdurehman Nâcîm, di karê tesbîtkirin, tesnîfkirin û amadekirina katalogên kutibxaneyan de, gelek xizmetên girîng kirine. Pişti ku Abdurehman Nâcîm tête Stenbolê, “di 8ê Temûza sala 1861ê de dest bi karê memuriyetîyê dike û dibe Mifetîşê Kutibxaneyên Dersaadetê.”<sup>6</sup> Pişti ku ew dest bi vî karî dike, ji bo amadekirina katalog û ïndeksên pirtûkxaneyan gelek xebatên girîng têne kirin. Ew, pêşiyê hejmar û cûreyên pirtûkên di kutibxaneyan de dîyar dike û ji wê şûn ve jî dest bi amadekirina fihrist û katalogên wan dike. Pêşiyê fîhrîstê kutibxaneya Damad İbrahîm Paşa di Gulana sala 1963an de tête çapkiran. Fîhrîstê kutibxaneya Ragip Paşa jî di sala 1871ê de ji alîyê A. Nacîm ve tête amadekirin û di Takvîmhane-î Amîre de tête çapkiran. Alî Birîncî dibêje: “Ew, yekemîn mûrrettîbê defterên matbuatên kutibxaneyên Stenbolê ye, şâîr, hiqûqnas, zanayê edebiyata elsîne-î selase<sup>7</sup> ye û di rêya Neqşîbendîtîyê de bû.”<sup>8</sup>

Ew “Dema ku karê Mifetîşıya Kutibxaneyên Dersadetê dike, sala 1864ê di bin maîyyeta Saîd Beg de wek katib pê re dixebite û sala 1865ê ji bo mamostetîya Mekteb-î Osmanîye ya li Parîsê tê wezîfedarkirin û nêzîkê du salan li wê derê dixebite. Sala 1867ê vedigere Stenbolê û karê xwe yê berê berdewam dike.”<sup>9</sup>

<sup>6</sup> İbrahim Göksel Baykan, J. b., 29.10.2015

<sup>7</sup> Nivîskarê sê ziman: Arebî, farisi û turkî.

<sup>8</sup> Ali Birinci, J. b., r. 287

<sup>9</sup> İbrahim Göksel Baykan, J. b., 29.10.2015

### **3. Abdurehman Nacîm ji karê îlmîyeyê derbasê mûlkîyeyê dibe**

Abdurehman Nacîm, xwedî îlm û îrfaneke dewlemend û berfireh bû û di kar û meslekên cur bi cur de xebitîye. Ew, “Di seha îlmîye, edliye mûlkîyeyê de xebitîye. Muhasibîya Takvîmhaney-î Amîre û li Parîsê jî mamosteyîya Mektebî Osmanî û li Ruşdîyeya Bayazidê jî mamosteyîya farisî kirîye û herweha miduryetîya rojnameya *Vakay-î Zabtîye* ya Nezreta Zabtîyeyê kirîye.”<sup>10</sup> Sala 1870ê, karê A. Nacîm guherîye; ji mifetîşîya Kutibxaneyê Dersaadetê derbasê Mûlkîyeyê bûye. Di vî demê de, ji bo kontrolkirina desthilatdarîya xwe, rîverbirêne imparatorîye berdewamî meqam û mekanê memûran diguherandin. A. Nacîm jî wekî gelek karmendên wê demê dikeve ber bayê vê pêlê û wî pêşîyê rîkirine ji bo qaymeqamîya Larendeya Konyayê. Lîbelê ji ber sebebekî nedîyar, berîya ku li Konyayê dest bi kar bike, wî rîdikin ji bo qaymeqamîya Şamê. Di vê navberê de nêzîkê şes salan qaymeqamîya qezayêne wekî Bealbek (11yê Adara 1872), Bekaûl- azîz, Lazkîye, Hasbîye û Edhemîye dike. Di navbera salên 1878-1880yan de li Lûleburgaz û paşê li Edirneyê wezîfeyê Muawînîya Muddeê Ûmumî dike. Sala 1880ê careke din vegerandine Sûriyê û li Helebê bûye Muddeyê Ûmumî yê Mehkemeyên Îstînafê û ji wê şûn ve jî di sala 1882an de bi postê reîsê Mehkemeyên Îstînafê neqlê Diyarbekir bûye. Ji wê şûn ve jî, di navbera salên 1882-1886an de dibe Reîsê Yekemîn ê Mehkemeyên Bîdayetê [Mehkemeyên Eslîye]. Di sala 1888an de ji ber tehqîqatekê ji wezîfeyê tête ezilkirin. Di dawîya lêpirsîna du salan de, di 10yê Sibata 1890ê de Medelyeya Îftixar a Pêbawerîye didinê û paşê di 17yê Temûza 1890ê de ji bo kar û meqamê xwe yê berê tê iadekirin û dibe Muddeyê Ûmumê Mehkemeyên Îstînaf a wîlayeta Beyrûdê.<sup>11</sup>

<sup>10</sup> Abdurrahman Nacim, *Mantık Metinleri-1: Türkçe Mantık Hulâsası*, İşaret Yayınları: 78, İstanbul, r. 5

<sup>11</sup> Ali Birinci, J. b., r. 288

Nivîskar di berhema xwe ya bi navê *Rahnameya Diyarbekir* de, xweşhalîya xwe ya ji bo çûyina Amedê weha tîne ziman: “Dema ku zivistan çû û bihar hat, qerar ev bû; dê biçim Diyarbekir yanî Amed. Ew tiştê ku di gelek şevan de dilê min wan dîtî bû, Ameda reş Diyarbekir bû.”<sup>12</sup> Nivîskar piştî rêuwîtîyeke dûr û dirêj, digîje Diyarbekirê, roj û dîroka bidawîhatina wê rêuwîtîyê weha neqil dike: “Roja duşenbe dozdeyê meha Recebê, pazdeh ji meha Nîsanê bêzehmet û eziyet. Gihîstim Dîyarbekir bi kîf û xweşî, ev nezma me jî gîhîşte paşî.”<sup>13</sup>

Li vê derê wek têbinîyek, bi bîrxistina hinek agahdarîyên li ser rewşa dîrokî û îdarî ya Diyarbekirê, dê ronahîyek bide rast têgehîştina rewşa wê demê. Diyarbekir, wê demê di herêmê de navendeke girîng bû. Piştî salên 1515-1516yan, Diyarbekir bi tevayî ketibû bin bandora osmanîyan. Di serdema 19yan de, sînorêñ îdarî yên Dîyarbekir gelek berfireh bûn; ji aliyê rojava ve ji Meletiyê dest pê dikir û ber bi rojavayê başûr ve hetanî Mûsilê dirêj dibû, ji aliyê bakûr ve ji Kemahê dest pê dikir û ji başûr ve hetanî sînorêñ Sûriyeya îroyîn dirêj dibû. Ji îlankirina Tanzîmatê şûn ve, ji sala 1846an bigre hetanî sala 1867an Dîyarbekir, bûye navenda “Eyaleta Kurdistan”ê. Wê demê Bedlîs, Wan, Mûş beşekî girîng ê Botan, Riha, Mêrdîn, Elezîz, Batman, Sêrt û Şîrnaxê jî bi ser Diyarbekirê ve bûn.

Di navbera salên 1869-1870an de, ji bo sazkirina wîlayet û rêvebirîyên herêmî qanûneke nû hate çêkirin; li gor vê qanûnê şaredarî hatin damezirandin û sîstema yekrû ya wîlayet, lîwa (sancax) û qezayan hate damezirandin, meclîsên herêmî çêbûn û digel wê selahiyetên walîyan hatin zêdekirin. Di çarçoveya van guhartinan de, di sala 1869an de li Diyarbekirê jî gelek sazîyên nû hatin damezirandin. Sazîyên wekî Şaredarîya Diyarbekirê, Meclîsa Wîlayetê, Îdareya Mearîf, Komîsyona Ahwalî Sicîl, Daîreya Nafia, Têlgrafxane, Mehkema İstinâfê

<sup>12</sup> Mudde-i Umumi serveri Abdurrahman Nacim, *Rahnameya Diyarbekir*, 27ê Nisana 1885

<sup>13</sup> Mudde-i Umumi serveri Abdurrahman Nacim, J. b.

û alayîya cendirmeyan bi vê qanûnê hatin damezirandin.<sup>14</sup> Pişti vê kurteagahdarîya dîrokî, dixwazim cardin vejerim ser mijarê.

Wekî ku di destpêka vê nivîsê de jî hate gotin; A. Nacîmî, qîma xwe tenê bi karê bûrokrasîyê neanîye, wî herweha pirtûkên dersê jî amade kirine û bi sê zimanan gelek berhemên menzum û mensur jî nivîsandine. Digel vê yekê, di rojnameyên cûr bi cûr de li ser babetên cihê cihê, tevlî hinek nîqaşan bûye û meqeleyên wî yên balkêş hatine neşirkirin. Bi taybetî jî meqale û refleksên wî yên li ser kultur û edebîyata kurdî, li gorî wê demê pirr balkêş, têr û tije ne.

#### 4. Bersiva Konsolosê Brîtanya

Mehkemeya İstinafê li Diyarbekir, sêzdeh sal berîya çû-yina A. Nacîm hatibû damezirandin. Dema ku A. Nacîm li Diyarbekir reîsê daîreya Mehkemeyen İstinafê bû, Konsolosê Brîtanya Mr. Trotter li hin deverên Kurdistanê digere; serdana hinek gundan, koçberan û cotkaran dike û li ser encama vê gera xwe daxuyanîyek belav dike û di naverokê de: Kurdan bi cehalet û hovîtîyê dide nasandin û herweha dibêje qewmê kurd ji maarîfetê [îlim-kultur] mehrum e. Ev daxuyanîya Konsolos, di nav nivîskar û rewşenbîrên kurdan de nerehetî û acizîyek peyda dike, kesayetîyên wekî Keyfi, Abdurehman Nacîm û Hesen Zûhdî bi rîya rojnameya *Tercûman-î Hakîkat* bersiva wî didin.

Gengeşe û nivîsên di nav rûpelên *Tercûman-î Hakîkat* [*Tercûmanî Heqîqet*]<sup>15</sup> de, ferezanî û hîkmeta A. Nacîm a li

<sup>14</sup> Derleyenler: Joost Jongerden-Jelle Verheij, *Osmanlı Döneminde Diyarbekir'de Toplumsal İlişkiler (1870-1915)*, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, 2015, r. 44-45

<sup>15</sup> Rojnameya *Tercûmanî Heqîqet*, di 27 Hezîrana 1878an de dest bi weşanê kirîye, damezirêner û rêvebirê rojnameyê Ahmed Midhad e û xwedîyê imtiyazê ji Mehmed Cevdet e. Weşana rojnameyê 34 sal dewam kirîye û li ser hev 15325 hejmar hatine weşandin; ji damezirandinê hetanî 1912yê rêvebirê

ser edebîyat û kultura kurdan, bi gelek aşkerayî dide dîyarkirin. Divê em vê rastîyê jî dîyar bikin ku berîya wî, refleksên bersîvdana Konsolosê Brîtanya, ji alîyê Keyffî ve hatîye nîşandan. Keyfi, li ser daxuyanîya Bînbaşî Mr. Trotter, di hejmarê 969 û 974 ên *Tercûman-i Hakikat* de, rexne li daxuyanîyêne wî digire û bi “Kurdîya Goranî” du xazelênen goranî bi tevî tercumeya wan a turkî pêşkêş dike. Herweha nivîskarê bi navê Hesen Zûhdî jî bi meqele û rexneyêne xwe ve tevlî vê gengeşeyê dibe û piştgirî dide nêrîn û nivîsandina Abdurehman Nacîm.

Keyffî di destpêka nivîsa xwe de dibêje:

“Mr. Trotter ê Konsolosê Îngiltere yê Diyarbekirê, li ser Kurdistanê nivîsek belav kirîye û bê tefekûr têde gotîye edebîyata kurdî “nîn” e. Di rastîyê de li kutibxane, gelek eserên edebîyata kurdî hene; li vê derê ez dê xazeleke kurdî ya sade û herî kêmhûner, wekî “mukadîmeyeke redkîrina” tehqîqatêne wî, bi tevlî tercumeya wê ya turkî ji bo rojnameya we rêkim. Hûn dê bibînin ku gotin û agahdarîyêne wî çiqas dûrê rastîyê ne.”<sup>16</sup>

Piştî nivîsên Keyfi, Abdurahman Nacîm jî di nivîsa xwe ya bi navê “Ulema ve Kürd ahalisi” [Ulema û gelê kurd] de bersiva Mr. Trotter ê Konsolosê Brîtanyayê Dîyarbekirê dide û dibêje:

“Ew meqaleya ku ji alîyê Konsolosê îngiliz ve hafîye nivîsandin û di rojnameyan de hatîye neşirkirin; dûrê hal-kirina heqîqetê ye û ne li gor arzûyan e. Li ser vê babetê

---

wê Ahmed Midhad bû, prensîb û politikaya weşandina rojnameyê ne dûrê politikaya Abdulhemîd II. bû û ji ber vê yekê piştgirîya maddî û manewî ji desthilatdarîya siyasî digit.

Di sala 1908ê de piştî ragehandina Meşrûtiyetê, her çiqas di wan şertan de xwe bêlî ilan bike jî di esasê de politikayeke dijberê desthilardariya Îttihad û Teraqî taqîb kirîye. Piştî mirina Ahmed Midhad (28 Kanûna 1912) rêvebirîya rojnameyê diguhere, di rêvebirî û sernivîskarîya Ahmed Agaoglu de rojname dikeve bin bandora Îttihad û Teraqî. Qası ku tê zanîn, ev rojname hetanî 12yê Kanûna sala 1924an hatîye weşandin.

<sup>16</sup> Keyfi, *Tercûman-i Hakikat* [Tercûmanî Heqîqet] gazetesi, no: 974, s. 3, 19 Eylül 1881

tehqîqatê Konsolosê navborî, sivik û bê bingeh in. Ji ber vê yekê divê bêne redkirin û sererastkirin. Lewra Konsolos bohtan li hemû kurdan dike û dibêje ew nezan û wahşî ne, bê îlim û bê îrfan in. Halbûkî qewmê necîb ê kurd, bi delîlên aşkere xwedîyê fazîletên rast, berhemên hêja, qelem û eserên îlmî ye.

Ji alîyê îlim, fazîlet, xettafî û şâîriyê ve qewmê kurd, li gorî yên din bêtir navdar e. Her çeşid telfî û tesnîfê kurdan, eserên xwedî itibar ên kutibxaneyan in.

...

Di çarçoveya meseleyên fiqhî de li ser ibadetê, muamelat, aktî nîkah û hiqûqê cezayê, qanunên edlî, şer'î û yasayên îlahî û rêvebirinê tesnîfên wan ên bêhejmar hene. Kurdish li ser metn û te'lifên hazretê Îmam Şaffî, Nevehî, Rafî'î û Gazelî şerh û haşîyeyên bêhejmar neşir û tedvîn kirene. Şerh û haşîyeyên telfî û manzûmeyên ulemayên kurd yên wekî Hezretî Mewlana Ebubekir ên bi navê "Vûduh", "Enver", "Siracû'l Kûlub"; "Menku'lû Ttefasir" a Yusuf Esmam; "Zatûş Şîfa"ya Îbnû'l Cezîrî; "Kifaye" û şerha wê "Hîfa'ye" ya ellame Beytûşî; telfî û manzûmeya "Ahmediye" ya Şêx Marûf Berzencî li meydanê ne. Di Silêmanî-ye yeyê de, ji malbata Berzencî û Heyderîzadeyan şexsiyetên xwedî îlim û fen ên wekî Sigbehtullah, Ehmed, Heydar, Ebdullah efendî û wd. alimên gewre yên kurdan li ser babetên fiqh, tefsîr, usûl, nehîv, serf, mentiq, kelam, hendeşe, hesab, arûz, exlaq, edebîyat, tarîx, sîyayî, fen û babetên cûr bi cûr berhemên wan ên telfî û tesnîfskirî hene.

Wan, bi van nirx û berhemên xwe, pirtûkxaneya dinyayê neqîşandine û ronî kirine. Te'lifên "Şerh-î Makamat" û "Diwan" a Hezretî Mewlana Şêx Xalidê Silêmanîyeyî, di nav ulemayê de dest bi destan hatîye gerandin. Ev dengê payebilind ên îlim û îrfanê, ronahî dane Şerq û Xerbê. Tef-tazanî yê ku wek ulemayê duyemîn tête qebûlkirin, Celal

Dewanî û Mihemed Feyzî Efendî yê Silêmanîyeyî ku nûha miftîyê Bexdadê ye. Gelo ma ev ne ji payebilindên ulemayê kurd in?

Pêbawerê demê û seyîdê esrê Şêx Ebdulqadir Efendî ku iro li Silêmanyeyê xwedî kûrsî ye û ders dide, Seyîd Kake Ehmed Efendîyê Berzencî, Mewlana Ehmed Efendîyê Tûtşî, Mihemed bîn Resul Efendîyê Rewandûzî û Evdi-rehman Efendîyê Robjeyanî kesayetîyên têr û tije ne û di her îlmê de xwe gihadine, zûhd û teqwa jî, di rêka Hezretê imam Gazelî de ne, bi berhem û te'lîfên xwe ji dûr û nêzik ve têne naskirin. Gelo ev kesên navdar hemû ne alimên kurd in?

Ji alimên gewre yên kurd Îmam Cezîrî, Yehya Efendî Amadî, Seyîd Ebdulletîf Efendîyê Şehrezorî, Mewlana Elî Efendîyê Qizilçî, Îbnî Adem û Îbnû'l Hacc û Ellame Erbîlî bi qelem û eserên xwe yên îlmî wekî tava rojê li meydanê ne, iro te'lîf û berhemên wan di hemû kutibxaneyên Sten-bolê de jî hene û hatine parastin.

Welhasil dîyar e ku ulemayê kurdan bi lûgatê arebî, farisiî, turkî û bi zimanê xwe yê maderzadeyî yê kurdî her çeşid eser nivîsandine.

Ji ber ku zimanê kurdî gelek dewlemend û ji alîyê şîweyan ve jî rengîn e, bi kurdî gelek pirtûkên edebî yên mensur û menzum hatine nivîsandin.

Ji alîyê şâîrên kurdan ve bi zimanekê zelal, manîdar, şâîra-ne û hakîmane quesîde, mesnewî, rubâî û şîrîn cûr bi cûr di şîklê nezmê de hatine nivîsandin.

Ulema û şâîrên kurdan; wek eser û şâîrên erebên bedewî, ehlê faris û zimanpakên turkî şîr nivîsandine û eser his-tine. Ji van navdarên wekî Hezretî Şêx Mewlana Xalid, Beytûşîyê Ellame, Şêx Marûfê Berzencî û miftîyê Bexda-dê Şêx Mihemed Feyzî Efendî bi eserên matbu û muteber hatine nasîn.

Xelkê kurd bi xwe jî aşînayê zimanê arebî û farisî ye. Hînekê wan jî bi zimanî îngilizî û fransizî tahsîl dîtine....”<sup>17</sup>

Amdurahman Nacîm di nivîsa xwe ya dirêj de, piştî van agahdarîyan, ev car bi xwe vedigere pirsan ji Konsolos dike û dibêje:

“Gelo Konsolosê navborî, 30-40 medreseyên bajarê piçûk ê Silêmanîyeyê geriyaye ku hemû bi xwendevanên îlmê tije ne? Yaxud li mekteb û medreseyên bajarê Sineyê geriyaye? Gelo medreseyaya pîroz a Darûl Îhsanê dîtîye ku wekî Cemîû'l Ezhera Misrê, odayê wê yên bêhejmar hene û ji bajarên dûr gelek xwendevanên ji bo tehsîla îlm û fennê têde xwendina xwe dom dîkin. Yaxud medreseyên li Savucbulaq, Saqiz, Banê, Şino, Tercan, Serdeşt, Nistan, Enderkaş, Bokan, Beytûş, Çimîyan û medreseyên din ên bi van deran ve girêdayî bi çavêن xwe dîtine? Yan jî medreseyên li qezayêن piçûk ên ser bi Silêmanîyê ve wekî Qerîdax, Helepçe, Kelanbar, Beyare, Bazyan, Qizilan, Asker, Akçayan, Merge, Maun, Pêşder û medreseyên li Rewandûz, Koyê, Erbîl, Îmadîye, Xoşnav, Şemdînan û ciyên din dîtine û li ser wan agahdarîyêن wî hene? Ku ev medrese û mekteb her yek wek Darûl Maarîfek e.

Konsolos hîç hevdîtinek bi ulemayêن xwedî şeref re kirîye ku ji Şîrevanê, Talîşê, Geylanê, Daxistan û bajar û ciyên din ve ji bo tehsîlê têne li medreseyên Kurdistanê xwendina îlim û fennê dibînin, dersên esasî dixweynin û îcazet-name werdigrin û ji bo neşirkirina îlmên nûranî vedigerin welatêن xwe?

...

Haşa! Konsolosê navborî ne ev bihîstiye, ne dîtîye û ne jî li ser tehqîq kirîye. Gelo Konsolos dizane ku iro piranî ya ulemayêن medreseyên li bajarê Erzerum, Diyarbekir,

<sup>17</sup> Abdurrahman Nacim, *Tercüman-ı Hakikat* [Tercümanî Heqîqet] gazetesi, no: 982, 29 Ekim 1881, r. 2-3

Mêrdîn, Sîwaz, Xarpêt, Mûsil, Heleb, Bexdad, Şam, Misir, Medîneyê Mûnewere, Mekeyê Muazzama kurd in? Na, nizane.

Yaxud eserên îlmî û mifedar ên hinek şexsiyetên xwedî fazîlet û alimên kurd ên li tekyayêñ Humul û Hafa ya Sten-bolê nas dike ku îro di rojnameyan de têne neşirkirin? Na, nikare nas bike.

Konsolosê navborî ne dikare wan nas bike û ne jî muqte-dîrê naskirin û têgehîştina eserên wan e....”<sup>18</sup>

Nivîskar gotinê tîne li ser sejimêrîya kurdan û rewşa sos-yolojîk a civata kurd. Belavkirina raportên bi vî awayî, wek helwesteke şexsî û populer ê konsolosên Awrupayî dinirxîne, belavkirina van cûre reportan û çavkanîyêñ wan muteber na-bîne û dibêje:

“Konsolos; mîqdarê nifûsa kurdêñ medenî û yên eşîrêñ koçberêñ konê reşan jî nizane û li ser wan agahdarîyêñ xelet belav kirîye. Wekî ku di gotinek pêşîyan a ereban de hatîye gotin, “Xwedîyê malê, nava malê baştir nas dike.” Lê mixabin, sed car mixabin ku konsolosên werkîno, daîmî li ser Dewleta Alî Osman û miletêñ necîb ên musilman agahdarîyêñ kêm û xelet didin dewletêñ xwe û herweha meqeleyêñ wan ên rojnameyan jî rast têne qebûlkirin. Ü gelê Awrupayê jî bi vê yekê têne xapandin û berdewamî di aleyhê me de îtirazan dikin. Nizanin ku meqeleyêñ wan bê bingeh in û agahdarîyêñ wan jî, ji çavkanîyêñ muteber ne-hatine bidestxistin. Nizanin ku li nik van kesan şıura pev-girêdanîya dewletê, kêmtür e ji bi destxistina şohretê.”<sup>19</sup>

Nivîskar, di dawîya nivîsa xwe de dibêje, em hêvîdar in ku Konsolos pişti van agahdarîyêñ berfireh, xeletîya xwe se-

<sup>18</sup> Abdurrahman Nacim, *Tercüman-ı Hakikat* [*Tercümanî Heqîbet*] gazetesi, no: 982, s. 2-3, 29 Ekim 1881

<sup>19</sup> Abdurrahman Nacim, *Tercüman-ı Hakikat* gazetesi, no: 982, s. 2-3, 29

Ekim 1881

rerast bike û qethen ji me jî aciz nebe û herweha bi bîrxis-tina risteyên Nalî, dawî bi nivîsa xwe dihêne.

*“Bo çi negirim sed kertim dil dişikînî  
Bo çi mey nerijî şîşe le sed cîke şikawe.*

Yanî:

*Çawa û ji ber çi ez negirîm, tu her roj sed car dilê min ê wêran dişikînî.*

*Çawa û ji ber çi şerab nerije, şûşeya wê li sed ciyan şikes-tiye.”<sup>20</sup>*

Wekî ku di destpêkê de hate gotin, yên ku tevlî vê geneşeyê bûye, ji wan yek jî Hesen Zûhdî ye. Li gorî agadarîya wî, wê demê ew li hidudê Yunan îqamet dike û ji wê derê bi rêya rojnameya *Tercüman-î Hakîkat*, bi sernivîsa “Fûnun-Kurd” piştgirî daye nêrînên Abdurehman Nacîm û gotîye:

“Mr. Trotterê konsolosê dewleta gewre ya Brîtanya li Di-yarbekir, di heqê Kurdistanê de tehqîqatek di rojnameyan de daye neşirkirin û di xulesayê de dibêje, qewmê kurd ji maarîfetê [îlim-îrfan] mehrûm maye. Meqaleya li ser navê Abdurehman Nacîm; rastîyê anîye ziman û dîyar kirîye ku vekolînên (hînkarî) wî yên li ser vê babetê mahsulê nezanîyê ye û ew bi xwe jî ne weqfê heqîqet û hûrgilîyên marâfetê ye. Meqaleya Abdurahman Nacîm a ku di hejmara 982 yê rojnameya *Tercüman-î Hakîkat* de hatîye neşirkirin, çavê me vekirîye û bi ïftixar hatîye müşahedekirin....

Konsolosê navborî di gera xwe ya ji bo herêma Kurdistanê de, agahdarîyên ku bidest xistine gelek kurt û kêm in. Agahdarîyên wî jî li ser rewş û jîyana hinek ehlê gundan e.

Ew nêrîna ku bi pêşînhikum bibêje ev qewm ji maarîfet û edebîyatê mehrûm e, di nezera heqîqetê de ev nêrîn bâtil [beyxude] e. Bâtil bi temamî bâtil e, heq jî bi temamî heq e; ku ev yek jî bo îsbatkirina îddeaya tête kirin nebes be, ji

<sup>20</sup> Abdurrahman Nacim, *Tercüman-î Hakîkat* gazetesi, no: 982

nav vî qewmî gelek kesayetîyêñ xwedî fazîlet, ulema, şâîr, xefîp û xizmetkarêñ wd. derketine, eser û qelemêñ wan li meydanê ne. Em hêvî dikin Konsolos Efendî eserêñ van zatan bibîne, pê qeneat bike û kêmanîya xwe ya di heqê vê babetê de sererast bike û ji xeletîyê vegere.”<sup>21</sup>

Gengeşeyêñ weha berdewamî di navbera ronakbîrêñ kurd, gerokêñ bîyanî û ronakbîrêñ osmanî, ereb û farisan de çêbûne. Gerokêñ bîyanî bi agahdarîyêñ xwe yên kêm û şas, yên dewletêñ navborî jî di bin navê “umetparêzî” û ”yekîtîya îslamî” de înkara milletê kurd, ziman û kultura wî kirine. Di vê babetê de nimûneyek herî balkêş di nivîsek Abdullah Cevdet de hatîye dîyarkirin ku dibêje:

“Dostekî min ê rêzdar û ezîz, kovara *Rojî Kurd* li ser maseya min dît û vege riya ji min re got ev mecmua çî ye? Min ji wî re got: Weşana lêgerînêñ civakî û qewmî yên li ser kurdan e. Hevalê min rûpelên kovarê vekirin û rastê meqaleyek kurdî hate û vege riya ji min re got: Madem ku ne turkî ye û bi zimanê kurdî ye, wateya wê ew e ku rojnameya “cûdaxwazî” ye û *Rojî Kurd* bi hêdîka danî li ser mêza min.”<sup>22</sup>

Genegeşeyêñ werkîno di berîya derketina *Tercumanê Hakikat* û piştî wê jî her hebûye; ji ber vê yekê, zana û ronakbîrêñ kurd mecbur mane ku bi berdewamî behsa dewlemendî û dîroka edeb, ziman û kulturê kurdan bikin. Gengeşe û nivîsen werkîno paşê di nav rûpelên *Rojnameya Teavûn û Terakkî ya Kurdan*, kovara *Rojî Kurd* û weşanêñ piştî wan de jî her hebûne. Ji van nivîsan yek jî ya Salih Bedirxan e ku di nav rûpelên *Rojî Kurd* de hatîye belavkirin û têde dibêje:

“Di dîroka kurdan de gelek şair, edîb û alimêñ muazam û mezin derketine. Lê her me navê wan negirtîye, qedrê wan

<sup>21</sup> Hasan Zûhdi, *Tercüman-i Hakikat* gazetesi, no: 1014, s. 3, 8 Teşrin-i Sani 1881

<sup>22</sup> Dr. Abdullah Cevdet, *İttihad Yolu, Rojî Kurd*, no: 2, weşanêñ War, Stenbol, 2002, r. 51

nezanîye, ew jî her ji kurdanîyê derketine, ji qewmên dî re mane. Ji ber ku dîrokeke me ya nivîsandî jî tune ye, ev babet di nezera kurdan de menfi û mechul maye.

Alimên qedirmezin ên wekî dîrokzan Îbnûl Esîr û Ebu Sadîr, Şêxûl İslâm Ebu Suud, Goranî, Şêx Ehmedê Cezîrî, Harîrî; şair û edîbên herî bijare yên wekî Fuzûlî, Ehmedê Xanî, Neffî, Mewlewî, Kurdî, Harîk, Nalî, Hecî Qadir, Şêx Riza ji nav kurdan derketine.”<sup>23</sup>

## 5. Tevgera Şêx Ubeydullahê Nehrî, siyaseta Brîtanya û xabata Mr. Trotter

Ji şerê salêن 1877-1878an ê dewleta Osmanî û Rusya şûn ve, di pêşengîya siyasî û civakî ya tevgera kurd de jî guherînên girîng ên nû çêbûne. Pêşengîya tevgera kurd, ji rêvebirên mîr-nîşîniyan derbasê ulema û rîberên dînî dibe. Şêx Ubeydullahê Nehrî, mînakekî girîng ê temsîla destpêka vê dema nû ye. Şêx Ubeydullah, rewşa siyasî-civakî ya piştî Sherê Osmanî-Rusan û dewleta Qajarî ya Îranê wek keyseke nû dinirxîne û di sala 1880an de dest bi rîexistinkirina tevgereke nû ya kurd dike. Ew, berîya destpêkirina serhildanê, ji Nasturiyan jî destekê digire û pêşiyê berê xwe dide rojhelatê Kurdistanê yanî beşê Kurdistana bin destê dewleta Qajarî ya Îranê.

Ji agahdarî û dokumentan weha dîyar dibe ku armanca tevgera 1880an ev bûye; pêşiyê bajarêن Kurdistanâ Îranê bêne rizgarkirin, paşê jî berê xwe bidin Kurdistanâ Osmanîyan û bi vî awayê her du parçeyan bigihînin hev. Lîbelê konjok-tora siyasî ya navdewletî û hêzên emperyal ên wê demê; bi taybetî jî Brîtanya û Rusyayê, nedixwestin statuya mewcud a Împeretörîya Osmanî û Îranê, li dijraberê berjewendiyêن wan biguhere.

Pitî şerê 1877-1878an, ji erdê osmanîyan bajarêن wekî

<sup>23</sup> M. Salih Bedirxan, *Kılıçtan Evvel Kalem [Berî Şûr Qelem]*, Roji Kurd, no: 3, weşanên War, İstenbul, 2002, r. 78

Qers, Bazîd, Erdexan û Batum ketibûn bin destê Rusya. Li herêmê zêdebûna tesîra Rusyayê, rêya bazirganîya Behra Reş a Berîtanyayê dixist xeternakîyê û herweha bandora wî ya li ser nifûsa krîstiyânê di nav sînorêna Dewleta Osmanî de zêdetir dikir. Ji ber vê, Brîtanya nedixwest Rusya sînor û bandora xwe ya ber bi başûr ve berfireh bike. Lewma paras-tina yekîtiyâa dewleta Osmanî û Îranê, berdewambûna bando-ra wan a li herêmê, li gor pêdivîyên sîyaseta Brîtanyayê bû. Dîplomatên Brîtanya yên li herêmê, di çarçoveya vê sîyasetê de kar kirine, qethen nexwestine tevgera kurd bi pêş keve û yekîtiyâa wan çêbe. Lewma dîplomat û serbazên xwe yên bi-jarte şandine herêmê û statuyeke taybet a dîplomatên wan ên li Kurdistanê hebû. Li hemberê tevgera kurd, sîyaseta Rusya jî paralelê ya Brîtanyayê bû.

Bi girêdayî Balyozxaneya Brîtanya ya Stenbolê ve, “di 24 Nîsana 1879an de Serheng Charles W. Wilson, bi navê Konsolosê Giştî yê Anatolyayê tête tayînkirin. Herweha Ser-pel (Yuzbaşî) E. Clayton wek konsolosê leşkerî bajarê Wanê, Serpel W. Everett wek cîgirê konsolosê leşkerî yê Erzeromê û Amîrhêz (Bînbaşî) H. Trotter jî wek konsolosê leşkerî yê Kurdistanê têne wezîfedarkirin.”<sup>24</sup> Wê demê balyozê Brî-tanya yê Stenbolê, Austen Henry Layard bû. Li ser pêşniyara Layard, dewleta Brîtanya di 17yê Gulana 1879an de Serpel E. Clayton, bi unwanê Vîskonolosê Kurdistanê tayînî bajarê Wanê dike. Clayton bi girêdayî konsolosê Erzeromê Amîrhêz Trotter dixebeitî. Lîbelê Dewleta Osmanî, karkirina wî ya di hemû bajarên Kurdistanê de qebûl nake. Piştî redkirina vê biryarê, nêzîkê mehek derbas dibe û “di 24ê Hezîrana 1879an de daxuyanîyek konsolosê Erzeromê Trotter, di hejmara 583 yê rojnameya Tercûmanî Efkar de tête belavkirin ku dibêje: Ez bi navê Konsolosê Kurdistanê hatime tayînkirin û herêma

---

<sup>24</sup> Bilal Şimşir, *Ermeni Gailesinin Tarihsel Kökeni Üzerine*, Ermeni Araştırmaları Dergisi, Sayı 1, Mart-Nisan-Mayıs 2001

wezîfa min wîlayetêن Erzerom, Dîyarbekir, Mûş û Wan e.”<sup>25</sup>

Li gor agahdarîyên Trotter, “Konsolxaneyên leşkerî yên wîlayetêن navborî, têkilî û statuya wan a bi rêvebirêن Dewleta Osmanî re di çarçoveyeke taybet de bû: Li gor Wezareta Derve ya Brîtanyayê, konsolosêن navborî ne ji rêzê bûn, li gor peymana navbera alîyan, wan wek ajanêن sîyasî yên taybet kar dikir... Ev statuya taybet, di navbera salêن 1879-1883an de dewam kirîye.”<sup>26</sup>

“Piştî ku Trotter wek Konsolosê Kurdistanê tête wezîfe-darkirin, gelek caran serdana wîlayetêن Diyarbekir, Mûş, Bedlîs û Wanê dike û li ser rewşa van wîlayetan agahdarî û raportan rîdike Balyozxaneya Stenbolê.”<sup>27</sup> Daxuyanîya wî ya ku bûye mewzûya nivîsên A. Nacîm û Keyfî, yek ji wan reportan e. Li gorî neqilkirina Wadie Jwaideh di raportek Trotter de armanca tevgera Şêx Ubeydullah weha hatîye ragehandin: “Armanca Şêx Ubeydullah ev e; ku memûrêن Sultan ji herêmê dûr bixe, xwe wek serokê Kurdistanê bide qebûlkirin û bandora xwe ya li ser herêma navbera başûrê Wanê û bakurê Mûsilê xurttir bike.”<sup>28</sup> Di berhema navborî de Claytonê cîgirê Konsolosê Brîtanyayê jî dibêje: “Bi dîtina min, armanca wî ev e, ku yekîtiya hemû kurdan pêk bîne û di bin serokatîya xwe de dewleteke serbixwe damezirîne.”<sup>29</sup>

Ji şerê Rus-Osmanî şûn ve, di destpêka sala 1880an de li herêmê bûyera herî girîng a ku bala Brîtanyayê dikşîne ser xwe, Tevgera bi serokatîya Şêx Ubeydullahê Nehrî ye. Wekî gelek caran, Rusya û Brîtanya li ser vê tevgera 1880an jî

<sup>25</sup> Ayşe Bayraktutan, Atatürk Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Tarih Bilim Dalı, *Erzurum İngiliz Konsolosluğu ve Faaliyetleri*, Yüksek Lisans Tezi, Erzurum, 2010, r. 116

<sup>26</sup> Ayşe Bayraktutan, J. b., r. 113

<sup>27</sup> Ayşe Bayraktutan, J. b., r. 116

<sup>28</sup> Wadie Jwaideh, *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi Kökenleri ve Gelişimi*, İletişim Yayıncılık, 8. Baskı, İstanbul, 2014, r.166

<sup>29</sup> Wadie Jwaideh, J. b., r.165

hevûdu gunehbar dikan, digel ku sîyaseta wan paralele hev bû. Li gor neqirkirina Celîlê Celîl Trotter, di raporta xwe ya ji bo Balyozxaneya Stenbolê de dibêje: “Tevger û serhildana kurdan, bûyereke pirr xeternak e.”<sup>30</sup> Û herweha ji bo têkbirina tevgera kurd, bi wesîteya ajanê xwe yên li herêmê berdewamî xebitîne û bi rêvebirên Dewleta Osmanî û Îranê re jî di nav hevkarîyê de bûne. Brîtanya, ji bo têkbirina tevgera kurd, giranî û bandora xwe ya li ser her du alîyan bi kar dianî ku sînorêñ xwe qewîtir bikin û rê nedin çûn û hatina kurdan. Dîrokzan Celîlê Celîl dibêje: “Brîtanya ji bo têkbirina tevgera kurd, berdewamî bi Stenbol û Tehranê re hevdîtinêñ dîplomatîk pêk anîye û ji her du alîyan xwestîye ku li hemberê kurdan bi hev re tevbigerin.”<sup>31</sup> Di meqaleyeyeke rojnameya *Tercümanî Heqîqet* de, helwesta Rusyayê li hemberî tevgera kurd weha hatîye diyarkirin: “Eger dewleta Îranê nekaribe serhil-dêrên kurd terbiye bike, em dê derbasî wî alîyê hidudê bibin û wan terbiye bikin.”<sup>32</sup>

Di hinek çavkanîyan de, helwesta Stenbolê ya li hemberê tevgera 1880an, lawaz û bêlayen hatîye şirovekirin. Lê encama bûyeran nîşan daye ku şiroveyek weha nerast bû. “Di destpêka hereketê de, wek piştgirê kurdan xuyabûna Seraya Osmanî, ji ber du sedemên bingehîn bû: Yekem, ji ber na-kokîyên dîrokî yên bi Îranê re, Seraya Stenbolê dixwest bi vê munasebetê Îranê bixe tengasîyê; yê duyem, dixwest na-kokîyên di navbera kurdan û komên Krîstiyân ên ermen-asuran kûrtir bike û wan li hemberê hev bi kar bîne.”<sup>33</sup>

---

<sup>30</sup> Celîlê Celîl, 1880 *Kürt Ayaklanması; Şeyh Ubeydullah Nehri*, Avesta Yayınları, İstanbul, 2014, r. 65

<sup>31</sup> Celîlê Celîl, J. b., r. 90

<sup>32</sup> *Tercüman-i Hakikat, Kurd kıyamında reng-i siyasi*, no: 755, 20 Muhamrem 1297-H (1880), r. 1-3

<sup>33</sup> Celîlê Celîl, J. b., r. 90

## 6. Xwendin û şiroveya metnê

Di xebatên weha de babeteke herî girîng jî xwendin û şiroveya metnên berdest e. Metnên di nav vê xebatê de, di bîst salêن dawî yên serdema 19.yan de hatine nivîsandin. Bi dîtina min, nirixandin û şiroveya metnên werkîno, ji alîyê dîroka edebiyata kurdan ve pir girîng e. Lewra di van metnan de, ji alîkî ve bersiva pirsa hebûn-tunebûna edebîyata kurdan hatîye nirxandin û ji alî din ve jî hinek nimûneyên berhemên edebîyata kurdan hatine pêşkêşkirin û şirovekirin. Digel vê, meseleya “edebîyata împeratorî û edebîyata neteweyî”, pirzimanî bûna nivîskarên metnan û xwendina berhemên wan, babeteke girêdayî vê beşê ye.

Li ser xwendina têkilîya di navbera metn û demê de, rêbazên cihê cihê hene. “Eger şiroveya metnek, li ser bingeha têkilîya di navbera metn û demê de be, di şiroveya vê metnê de du rêbaz derdikevin pêşîya me: Ji metnê ber bi demê ve û ji demê ber bi metnê ve. Rêbaza yekemîn, bi girêdayî “peydabûna manaya metnê” be; ya duyemîn jî bi girêdayî “peydakirina stratejîyên manaya metnê” ye. Yanî di xwendina metna demeke dîyarkirî de lêgerîna dewreyekê, tê manaya xwendina zemîna pêkhatina metnê; di vî rewşa hanê de gotara di bareyê manaya metnê de, girêdayî bi rewşa wê demê ve peyda dibe. Bi vî awayî “dema metnê” tê xwendin. Eger xwendina me ya di bareyê metnê de ji şiroveya rewşa demê dest pê bike, wê gavê jî peydakirina stratejîyên ji manaya metnê dertên pêşîya me. Êdî ya girîng, di metnê de lêgerîna demeke dîyar e; wê gavê tiştê ku tête xwendin “metna wê demê” ye.”<sup>34</sup> Di vê beşê de rêbaza me, ji xwendina demê ber bi metnê ve ye.

Em dizanin ku zeman û mekan tesîreke girîng li ser berhemên edîb û şâîran dikin. Cîyê ku zimanê erebî, farisî û osmanî serdest be û berhemên edebî yên van zimanana di rewacê

<sup>34</sup> Mehmet Fatih Uslu- Fatih Altuğ, *Tanzimat ve Edebiyat: Osmanlı İstanbul’unda Modern Edebi Kültür*, Türkiye İş- Bankası Yayınları, İstanbul, 2014, r. 342

de bin, bêguman bi giştî dê hunermendên wê demê jî di bin bandora ziman û kultura wan de bin. Di dema împeratorîya Sefavî û Osmanîyan de, ji vîalî ve bandorek pirr giran hebû, bi taybetî ew ên ku bi farisî nenivîsanda, wek şâîr û edîbêñ maqûl nedihatîn qebûlkirin. Ji ber vê, bi tevî gelek şairêñ kurd, şairêñ nijadturk û wd. jî ji bêgavîyê bi zimanê farisî yan jî bi osmanî nivîsandine. Ev bandor ew qas zêde bû ku di esra XVIyê de, kurdêñ wekî Fûzûlî jî, di bin bandora ziman û kultura osmanî de bi turkî nivîsandine. Ji wê şûn ve jî gelek şair û edîbêñ kurd bi zimanê farisî, osmanî û erebî nivîsandine. Ji wan yek jî Abdurehman Nacîm ê şair û edîbê sezimanî ye.

Digel kesayetîyê wekî A. Nacîm, gelek nivîskar, edîb û entellektuelêñ din ên kurd û tirkan jî di kar û xebatêñ nivîskarî de, zimanê cihê cihê bi kar anîne; yanî ew nivîskarêñ pirzimanî yêñ împeratorîyê bûn. Du sebebêñ girîng ên pirzimanîya nivîskarêñ kurd ên wê demê hene: Yê yekemîn, ji alîyê cografi û kulturî ve parçebûna Kurdistanê ye; yê duyemîn jî, ji ber desthilatdarî û qerekterê rewşa sîyasî, dînî û kulturî ya dema wan e.

Di wê demê de; zimanê dînî yê serdest erebî bû, zimanê edebî yê serdest farisî û erebî bû, zimanê sîyasî yê serdest jî osmanî û farisî bû. Zimanê kurdî di rewşeye herêmî de bû, ji ber vê yekê bi kurdî nivîsandin ne di rewacê de bû û kiryarêñ qumaşê zimanê kurdî jî gelek kêm û lawaz bûn. Hewldan û gazindêñ pêşewayê wekî Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Nalî, Hecî Qadirê Koyî û şopgerêñ li pey wan, ji bo xweskirina rê û peydakirina bazara berhemê edebîyata kurdî bû.

Li hemberê politikayêñ merkezîbûna Dewleta Osmanî, hîn di destpêka sedsala XIXyan de li Kurdistanê tevgereke civakî dest pê kiribû. Peyderpey geşbûna bûyerêñ civakî û sîyasî, di dawîya sedsala XIXyan de bûn sebebê hinek guhartinêñ pirr girîng. Di dawîya rûxandina Împeretorîya Osmanî û damezirandina Komarê de; nexşeya sîyasî ya herêmê guherî, di herêmê de dewletêñ nû hatin damezirandin û Kurdistan carekî

din bi her awayî ve hate dabeşkirin. “Kurdistan, di dawîya se-  
dsala XIXyan de, di navbera sazîyên kevn û nû, mîrektî, dîn,  
mezheb, ziman, alfabe, lehçe û împeratorîyan de parça bûbû.  
Ev rewşa parçebûyî ya cografyayê, bûye sebebê tewr girîng ê  
parçebûna edebiyata kurdî jî.”<sup>35</sup>

Di weşan û çapemenîya dewreya dawî ya osmanîyan de  
nivisîna pirrzimanî; ji alîyekî ve pêdivîya demê bû û ji alîyê  
din ve jî xisûsiyeteke rewşenbîr û entellektuelên wê demê bû.  
Rewşenbîr û nivîskarê kurd ên wê demê jî, bi pirranî ji ber  
rewş û bandora desthilatdarîya sîyasî ya demê, bi zimanê os-  
manî, farisî û erekî nivîsandine.

## 7. Di pêşkevtina edebiyatê de rola çapemenîyê

Dema em bala xwe bidin naveroka rojname û cerîdeyên  
wê demê, nivîsandina bi zimanê kurdî, bi tevî pêşkevtina tev-  
gera sîyasî û civakî ya kurd çêbûye. Di nav rûpelên *Tercûmani Heqîqet* de weşandina nivîsên A. Nacîm, Keyfî, A. T., Hesen Zûhdî û wd. piştî têkçûna mîrnişînîya Botan û rastî dema tev-  
gera Şêx Ubeydullahê Nehrî (1880-1882) tê.

Di rastiyê de edebîyat ji dîrokê nayê qutkirin. Metnek, ji  
dema nivîsandina xwe û bûyerên pêvajoya dîrokî nayê veqe-  
tandin. Ji ber vê yekê, lêkolîna dîroka civakî ji alîyekî ve lê-  
kolîna dîroka edebîyatê ye. Heman demê dîroka edebîyatê jî,  
parçeyek ji dîroka civakî ye û edebîyat bi xwe jî meseleyeke  
dîrokî ye. Dema edebîyat wek meseleyeke dîrokî bête nirixan-  
din, dîroka edebîyatê bi xwe derdikeve pêşîya me. Ev dîrok jî  
li gor dem û taybetîyên xwe, li ser dewreyê cihê cihê tête da-  
beşkirin û binavkirin. Eger metnên edebî li gor taybetîyên van  
dewreyê ciyawaz bêne nirixandin, dem û dewreya metnên  
ku têne şirovekirin, dikevebihûrîna navbera du serdeman.  
Serdema nû, wek destpêka edebiyata modern tête qebûlkirin.  
Terry Eagleton jî dibêje: “Bi wateya xwe ya modern têgeha

<sup>35</sup> Mehmet Fatih Uslu- Fatih Altuğ, J.b., r. 329

edebîyatê, encax di serdema XIXyan de ketîye rojevê. Bi vê wateya xwe ve edebîyat, fenomeneke aîdê dîroka nêzîk e.”<sup>36</sup>

A. Nacîm, Keyfi û yên din bi nîvîsên xwe yên di nav rû-pelên *Tercûman-î Hakikat [Tercûmanê Heqîqet]* de, bi giştî ronahî didin ser dîrok û teorîya edebîyatê û bi taybetî jî ronahî didin ser dîroka edebîyata kurdî. Ronîkirina dîroka edebîyata milletek, ji bo nasandina pêjn û fikryata wê pirr girîng e; ew jî tê wateya ronîkirina gelek xusûsiyetên kulturî û dîrokî yên wî milletî. Herweha dîroka edebîyata milletekî, heman demê dîroka berhemên nivîsandî û çapkîrî yên wî milletî ye û di bingeha xwe de parçeyek ji dîroka wî ye. Ji ber vê, rola çapemenî û materyalên çapkîrî, di dereceya yekemîn de wek çavkanîyên dîroka edebîyatê têne qebûlkirin.

Di vê çarçoveyê de lêkolîn û lêgerîna li ser kovar û rojnameyên kurdan, yên milletên cîran ên wekî osmanî, ereb, faris û wd. ji bo ronîkirina dîroka edebîyata kurdan gelek girîng e. “Kovar û rojname wusan li cîyê xwe da bûne meydan û bin-geha çapkîrin û belavkirina çîrok, serhatî, şîr, helbest, beyt û destanan. Kovar û rojname bûne meydana gelek şâîr û ni-vîskaran; wana şîr, xazel û helbestên xwe têda car-caran çap dikirin. Eger kovar û rojname çap nebûna, nivîsarên helbest-vanan, çîrokvanan, dîroknsasan û zanyaran têda çap nebûna, ew nivîsar û helbest wê wunda bibûna, wusa pûç bibûna û ji paşketîyan ra nemana. Hema ji saya serê kovar û rojnaman em dikarin tarîxa peydabûn û pêşveçûna lîteratûra millet bînin ber çavê xwe û biniwîsin”<sup>37</sup>

Ev xebata ber destê we, li ser destpêka dewreyek girîng a çapemenîya osmanî û rojnameya *Tercûmanî Heqîqet* hatîye kirin. Rojnameya navborî, du sal piştî ragehandina Meşrûti-yeta Yekemîn dest bi weşanê kirîye. Meşrûtiyeta Yekemîn, di

<sup>36</sup> Terry Eagleton, *Edebiyat Kuramı*, Sanat ve Kuram Yayınları, 3. Baskı, İstanbul, 2011, r. 32

<sup>37</sup> Prof. Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî (Kürd Edebiyatı Tarihi)*, We-şanê Öz-ge, 1992, Ankara, r. 23

sala 1876an de ji alîyê Andulhemîdê II. ve hatibû ragehandin. Du salên pêşî yên Meşrûtiyetê, ji bo geşepêdana çapemenîya osmanî, wek salên zérîn têne qebûlkirin. Lêbelê piştî ku ji alîyê Padîşah Abdulhemîdê II. ve Meşrûtiyet hate hilawistin, sansurek dijwar dest pê dike û peyderpey xebatên çapemenîye jî têne dereceya rawestandinê û naveroka wan jî diguhere. “Di navbera salên 1876-1878an de, her sal li Stenbolê neh-deh kovarên nû dihatin weşandin. Di sala 1888an de sansureke dijwar hate tetbîqkirin û bi salane hejmara weşanên nû daket yekê. Desthilatdarîya sîyasî, bi pêkanîna vê sansurê, dixwest gengeşeya li ser babetên sîyasî yên wekî liberalîzm, neteweyîfî û meşrûtiyetxwazîyê qedexe bikin. Di rojname û weşanên peryodîk de qedexekirina gengeşeya rojane ya bûyerên civakî û sîyasî, bû sebebê vê yekê ku rojname rûpelên xwe bi meqaleyên ansîklopedîk ên li ser berhemên edebî, dîrokî, cografi, zanist û teknolojî tije bikin. Têkilîya xwendevanên osmanî û cîhana derva bi vî awayî çêdibû. Wê demê tîraja rojnameyên navdar ên Stenbolê, di navbera 12 û 15 hezaran de bû.”<sup>38</sup>

Di dema desthilatdarîya Abdulhemîdê II. de ne tenê zixtên li ser çapemenîye, herweha zixtên li ser alîyên sîyasî û îdeolojîk jî bêtir bûne; bandora grubên îdeolojîk ên wekî parastvanên “rojavayîbûn”, “netewebûn”ê hatine lawazkirin û di şûna wan de îdeolojîya “îslamîparêzî” bûye serdest. Di çarçoveya vê îdeolojîyê de, pêkanîna yekîtiya unsurên îslamî wek armanca bingehîn hatîye destnîşankirin.

## 8. Nivîsên li ser edebîyatê

Dema em bala xwe bidin rojname û weşanên wê demê û dewreya piştî wê jî, xuya dibe ku gengeşeya derbarê hebûn û tunebûna edebîyata kurdî, lawazî û dewlemendîya zimanê

<sup>38</sup> Erik Jan Zürcher, *Modernleşen Türkiye'nin Tarihi*, İletişim Yayınları, 27. Baskı, 2102, İstanbul, r. 124, bak Orhan Koloğlu, Osmanlı Basını: İçeriği ve rejimi. (Yay. Yönt. M Belge).

kurdî bi berdewamî hatîye kirin. Li vê derê dixwazim hinek nimûneyên wan gengeşeyan bînim bîra we, da ku em karibin bêtir ronahî bidin ser vê babetê.

Li gor agahdarîyên rojnameya Tercûmanî Heqîqet (T. H.), kurdekî navdar ê bi kurteya navê A. T. di 5ê Hezîran 1880ê de nameyek ji rêvebirîya rojnameyê re rîdike, bi vê nameyê ew jî tevlî vê gengeşeyê dibe û dibêje: “Delîlê mukemelîyetîya zimanê me, hebûna şîrîn bijarte û berhemên dîwanan edebî yên ku her yek qiteya wan karin bi berhemên nivîskarên wekî “Homeros”, “Lamartin” û “Wolter” re miqayese bibin. Ku pêdîvî hebe, ez dikarim hinek berhemên hevdemên me wek nimûne tercûme û teqdîm bikim. Digel vê, kurdî, li pirranîya deverên Iraqa erebî, Heleb û Şamê di dereceya zimanê fenê de tête xwendin. Li van deveran ereb û tirkên ku bi zimanê kurdî nizanibin, nikarin bibin alim. Di seha felsefeya bilind de jî wisa merivên mukemel hene ku yên wekî Wolter ji gorê rabin jî, dê di warê îlahîyetê de li hemberê wan aciz bimînin û ji xeynî teslimbûnê tu çare li ber wan namîne....

Di warê fen û edebiyatê de jî gelek xizmetên kurdan çê-bûne; mînak, berhemên kesayetîyên me yên wekî Ebû'l Fîda, Ebû'l Wefa ji alîyê encûmendanîşen Awrupayî ve hatine tercûmekirin, kesayetîyên me yên wekî Ebû'l Suud û Gûranî jî bi fazîlet û îlmê xwe yê gewre di mewqîyên bilind ên Xîlafeta Osmanî de cî girtine.”<sup>39</sup>

Abdurehman Nacîm jî di nivîsa xwe ya ji bo bersiva Kon-solosê Brîtanyayê de dibêje: “Ulema û şâîrên kurdan; wek eser û şâîrên arebêne bedewî, ehlê faris û zimanpakên turkî şîr nivîsandine û eser hiştine. Ji van navdarân wekî Hezretî Şêx Mewlana Xalid, Beytûşîyê Ellame, Şêx Marûfê Berzencî û miftîyê Bexdadê Şêx Mihemed Feyzî Efendi bi eserên matbu û muteber hatine nasîn....”<sup>40</sup>

<sup>39</sup> A.T., *Varaka: Kurdistan Tercüman-i Hakikat*, no: 594, s. 2-3, 5 Haziran 1880

<sup>40</sup> Abdurahman Nacim, *Tercüman-ı Hakikat [Tercûmanî Heqîqet]*, no: 982, s. 2-3, 29 Ekim 1881

Keyfî jî behsa dêrînî û kevnarîya berhemên edebîyata kurdî dike û dibêje: “Ez xebata ji bo qencîya vî qewmê esîl û hewldana temînkirina dahatûya wî, wek wezîfeyeke pîroz hîs dikim. Ji ber vê yekê, carina ez dê bi daxwaza çapkîrinê hinêk berhem û şîrîn edebîyata kurdî ji bo zatêñ heqîqetnasan rîkim...”

Konsolosê Brîtanya li Diyarbekirê, bê tefekûr gotîye edebîyata kurdî “nîn” e. Di rastîyê de li kutibxaneyan, gelek eserên edebîyata kurdî hene; li vê derê ez dê xazelekî 1300 salî yê sade û herî kêmhûner ê Kurdi, wekî “mukadîmeyek redkirina” tehqîqatêñ Konsolos, bi tevlî tercumeya wê ya turki ji bo rojnameya we rîkim. Hûn dê bibînin gotin û agadarîyêñ wî çiqas dûrê rastîyê ne.”<sup>41</sup>

Hesen Zûhdî jî dibêje: “Ew nêrîna ku bi pêşînhikum bibêje ev qewm ji maarîfet û edebîyatê mehrûm e, di nezera heqîqetê de ev nêrîn batill [beyxude] e. Batill bi temamî batill e, heq jî bi temamî heq e; ku ev yek ji bo îspatkirina îddeaya tête kirin nebes be, ji nav vî qewmî gelek kesayetîyêñ xwedî fazîlet, ulema, şâîr, xetîp û xizmetkarêñ wd. derketine, eser û qelemêñ wan li meydanê ne.”<sup>42</sup> Nivîskar di berdewamîya nivîsa xwe de dibêje: Qewmê kurd girêdayî bi îlm û fenê ye û di nav wan de gelek kesêñ ku bi qelema xwe berhem dane hene. Kurdêñ fazîletperwer ên wekî Hezretî Ehmedê Xanî, berîya 300 salan manzumeya xwe ya bi navê *Mem û Zînê* di şîklê “Romanê” de bi zimanê kurdî nivisîye ku nivîskarê wê bi qelema xwe ne kêmê Aleksander Duma ye. Herweha zatêñ wekî Şêx Ehmedê Cizîrî jî, hem di îlmê zahîrî û fenê de û hem jî dereceya zanîna wî ya li ser îlmên heqîqetê, ji yê gelek kezêñ fazîletperwer bilidtir e.”<sup>43</sup>

<sup>41</sup> Keyfi, *Cevabnam-î Manzûm*, Tercüman-i Hakikat [Tercümanî Heqîqet], no: 974, s. 3, 19 Eylül 1881

<sup>42</sup> Hasan Zûhdî, *Funun-Kürdler*, Tercüman-i Hakikat, no: 1014, s. 3, 8 Teşrin-i Sani 1881

<sup>43</sup> Hasan Zûhdî, J. b.

Mînakêñ li jorê, ji gengeşeyên berîya Meşrûtiyeta Dû-yemîn in. Piştî ragehandina Meşrûtiyeta Duyemîn jî, di navbera rewşenbîrê kurd û yên osmanî de gengeşeyên bi vî rengî çêbûne. M. Salih Bedirxan, di nivîseke xwe de bersiva kesêñ ku dibêjin “edebîyata kurdan nîne” dide û dibêje: “Şair û edî-bêñ herî bijare yên wekî Fuzûlî, Ehmedê Xanî, Nefî, Mewlewî, Kurdî, Harîk, Nalî, Hecî Qadir, Şêx Riza ji nav kurdan derketine.”<sup>44</sup>

Piştî bidawîhatina Şerê Yekemîn ê Cîhanî jî gengeşeyên bi vî rengî dom kirine û her carê jî rewşenbîr û nivîskarêñ kurdan ji bêgavîyê bersiva wan dane. Ji van bersivan yek jî, sernivîskarê kovara *Kurdistan* Mehmed Mîhrî Hîlav dide û dibêje: “Pirsên xav ên ronakbîr û zanayêñ Stenbola Xîlafetê hene û dibêjin; ma edebîyata kurdan heye, zimanê kurdî ji edebîyatê re musâid e?”<sup>45</sup> Wî pirsên weha, wek nîşana rewşa perîşan û dilşewat a komêñ alema İslâmî didît û rexne li wan digirt û digot bi vê nihîrînê “Tenê edebîyat û zimanê qewmekî na, eyñî wext hemû hebûna wê jî di bin perdeya jibîrkirinê de hatîye hiştin.”<sup>46</sup> Wî digot ez ê ji bo bersîva van pirsên xav, “bi goranî û kurmancî ji berhemêñ edebî yên hin kesêñ navdar hinek stran, xazelêñ gelêrî, beyt, goranî, heyranok, lawje û bêrîteyan di nav rûpelêñ kovara *Jîn*ê de binivsînim, wergerînim û pêşkêşê xwendevanan bikim.”<sup>47</sup> Û herweha wek bersîv û îspatê jî, navê Mela Ehmedê Cizîrî, Mela Ehmedê Xanî, Mela Xidirê Nalî, Mela Ebdurrehîmê Ma'dûmî, Mela Ebdurrahîmê Wefayî, Şêx Rizayê Kerkûkî, Mistefa Begê Kurdî û Hacî Qadirê Koyî wekî “dahîyêñ edebîyata milletê kurd” rêz

<sup>44</sup> M. Salih Bedirxan, *Kılıçtan evvel kalem [Berî Şûr Qelem]*, Rojî Kurd, no: 3, weşanêñ War, İstenbul, 2002, r. 78

<sup>45</sup> *Jîn*, M. M. Kurd Edebiyatından Bazı Örnekler, no: 2, Wergera M. Emin Bozarslan

<sup>46</sup> J. b.

<sup>47</sup> M. M. *Kurd edebiyatından bazı örnekler [Hinek mînakêñ edebîyata kurdî]*, *Jîn*, no: 2, Werger û transkripsiyona M. Emin Bozarslan, Sweden, 1985

dikir.<sup>48</sup> Kamuran Bedirxan jî di nivîsa xwe ya bi navê “*Tetkî-katên dîrokî û îçtîmaî*” de, beşek ji xebata Sayclî yê mamos-teyê Darûlfununa Kembrîçê neqil dike û dibêje: “Edebiyata kurdan ne di rewşekê îftîdaî de ye, ji cûreyên wekî şîr, stran û çîrokan pêk hatîye.”<sup>49</sup> Dirêjkirin û zêdekirina nimûneyên weha mimkun e, lêbelê vê gavê ji bo têgehîştina mexsedê ew qas bes in.

Dawîyê em dikarin bêjin ku di dema osmanîyan de gelek nivîskar, edîb û entellektuelên împeratoriyê di kar û xebatên nivîskarî de zimanên cihê cihê bi kar anîne; yanî ew nivîskarên pirzimanî yên împeratoriyê bûn. Bi nêrîneke neteweyî, şirovekirin û nirixandina edebîyata împeratoriyê ne dirûst e. Di salên dawî yên împeratoriyê de, ji ber tesîra fîkrîn sîyasî yên neteweyî, peyderpey fîkrîn kulturî yên qewmî peyda bûn. Ji ber vê yekê; di wê demê de parastina hebûna edebîyat, ziman û kultura kurdan, bi kurdî nivîsandin, helwesteke cihê bû û destnîşankirina cûdayîyeke kulturî ya “qewmî” bû. Em dikarin van xebat û çalekiyên kulturî û rewşenbîrî yên di navbera Meşrutîyeta Yekemîn û Duyemîn de, ji alîkî ve wek destpêka fikra neteweyî ya kulturî qebûl bikin. Lêbelê di wateya xwe ya modrn de, berhemên edebîyata kurdî ancax pişti Meşrutîyeta Duyemîn, bi rêka kovar û rojnameyên wê demê peyda bûne.

## 9. Pesnê Xan Andulhemîd

Bi taybetî di sîstemên împeratoriyê de û wekî din jî pesindana Kral, Şah û Padîşahan, rêvebir û gewreyên dewletan wek adet û cûreyek edebiyatê hatîye qebûlkirin. Pesindanên weha, ji bo sûdwergirtina izzet û kerema Şah û Padîşahan bû. Ji bo pesindanê qesîde, şîr û nazîreyên bi belagat hatine ni-

<sup>48</sup> Seid Veroj, *Mehmed Mîhrî Hilav û Kovara Kurdistan*, Weşanên Weqfa Beşikçi, Stenbol, 2015, r. 90

<sup>49</sup> Kamuran Âli, *Kürdler: Tarihi ve ictimai tetkikat*, Îçtihad, no: 130, 14 Teşrîni Sani 1918

vîsandin. Leşkerekî şair û dîroknivîs Emîn Feyzî, vê rewşa hanê rexne dike û sedemê vê yekê bi zordarîya desthilatdaran ve girê dide û li ser vê çeşidê edebiyatê dibêje: “Di nav şâirên Şerqê de ji berê ve pesindan û metihkirin adet e. Wan bi methiyeyan îsbata îstihqaqa xwe dikir. Ew ên ku bi vî awayî mukefat û dîyarî digirtin pirr bûn, ji ber vê yekê şîr û edebiyat ges bûye.

Lê ew ên ku di fitrata xwe de ji pêjnêن edaletê dûr bin, her hal kirinêن wan ci bin jî dê bikin. Weha xuya dibe, tiştê ku wan dike zordar ne şîr e. Tiştê ku hinek kesan ji wan re dike meddah, îstibdada (zordarîya) wan e.”<sup>50</sup>

Ev cûre nivîs, bûne parçeyek ji Edebîyata Dîwanê û pirranîya şairên wê demê gelek qesîde û şîrên weha nivîsandine. Fuzûlî jî di dema xwe de ji bo pesindana Sultan Silêman qesîdeyek nivîsandibû. Abdurehman Nacîm jî di nivîs û şîrên xwe de, gelek caran di dereceyeke bilind de pesnê Padîşah Abdulhemîdê II. dide. Dema em li meqam û mewqîya wî binêrin, bêguman ji alîyek ve tesîra postê û meqamê wî li ser vê pesindanê heye. Lêbelê ji nivîsên wî dîyar dibe ku ew vê meseleyê teorîze dike, bi meqam û desthilatdarîya “Selenet û Xîlafet” ve girê dide.

“Ji alîyê her kesî ve tête zanîn ku Padîşah, di rûyê zemîn de xelîfeyê dîn û heq e û hakimê mutlaq ê her tiştî ye. Padîşah; bi ihsana erêkirina Xwedê serbilind e, bi izzet û hukma Rebîyê Subhanî bûye xwedîyê itibar û îmtîyaz. Padîşah; ji bo alîkarîya heqê û riayetkirina xelqê hafîye wezî-fedarkirin û tayînkirin, hevsarê karûbarê civakî dane destê îqtidarê, sazkirina karê dîn û dînyayê emanet û teslîmê wî bûye. Sultan, di nava xelkê de sîya Xwedê, parastvanê şerîet û nîzamê ye. Ew ê ku bi qeweta şûrê sîyasetê zaliman bêdeng dike û mezluman di sifreya edaletê de têr dike, Sultan e. Îteatkirina li ber emr û qedexeyên Sultan,

<sup>50</sup> Süleymanielyi Emin Feyzi, *İlâve-i Şuâât*, Necmi İstikbal Matbaası 1341, İstanbul, r. 47

wekî ûteatkirina edaletê ye. Ûteatkirina ji Wî re, wekî histuxwarkirin û ûteatkirina Cenabê Xudayê mezin û Resûlê Ekrem e.... Di eslê xwe de gotina “Ulûl emir”, ji bo Padîşah û memûrên wî yên ku ji bo karêن dînî û dunyewî hatine wezîfedarkirin e.

Bi rastî jî ûteatkirina ji Padîşah re, sebebê lihevkirin û berhevbûnê, geşepêdana refah û ûntizama dîn, pêşxistina Îslamê, pêkanîna hizur û parastina hemû xelkê ye.

...

Huzeyfe bîn Yeman gotîye: “Qewm û milletên ku bixwazin padîşahê xwe zelîl bikin, Cenabê Heq jî wî qewmî di dinyayê de zelîl û di axîretê de jî rezîl û riswa dike.”<sup>51</sup>

A. Nacîm bi zimanê farisî, erebî û osmanî gelek şîr û nîvîs neşirkirine, pirrî caran jî di hevokên xwe de pesnê Xan Abdulhemîd daye. Wî, tenê ji bo Abdulhemîd nenivisandîye, ji bo şexsîyetên wekî Wezîrê Xaricîye Saîd Paşa, Mûnîf Paşa, Ahmed Nacî Efendî yê katibê qelema wîlayetê Behra Sefîd û Emîn Hîlmî Efendî nîvîsandîye. Li jêrê şîrek wî yê ku pesnê Xan Abdulhemîd dide, ji bo sala nû ya 1299ê ya Hîcrî hatîye nîvîsandin û di stuna edebîyatê ya rojnameya T.H. de bêserlewhe hatîye neşirkirin.

“Merheba ey sala bi bereket a Xan Abdulhemîd,

Ey mizgîna mezinayî û hikumdarî Xan Abdulhemîd.

Xwedê te bi vî rengî biggerîne,

Ciyê ziyareta te be derîyê Xan Abdulhemîd.

Sal û meh û hefte û rojên te pirr bi nûr gerîyan,

Bi ïnîqasa roja îstiqbala Xan Abdulhemîd.

Bi rayekî xweş ji nû ve ûntizam da milk û dîn,

Kiryarêñ herî qenc kiryarêñ Xan Abdulhemîd.

<sup>51</sup> Abdurahman Nacim, *Arap edebiyati ve Islam siyaseti-1*, Tercüman-ı Ha-kâkit, no: 967, 16 Şevval 1298-H/10 Eylül 1881

Bi alîkarîya Yezdan bû Şehînşahê Cîhan her dem,  
Bêşubhe nîne emsalî Xan Abdulhemîd.  
Sala nû ya pîroz bi bereket hat,  
Ronahî bû alem bi hatina Xan Abdulhemîd.  
Nacîm tarîxê bi vî awayî beyan kir -ku cewher belav bû-,  
Bi mizgîna xêrê hat salî Xan Abdulhemîd.”<sup>52</sup>  
Nacîm, pirtûka xwe ya *Rahnameya Diyabekir* jî, bi van  
rêzeyên pesindanê bi dawî tîne:  
“Wekîlê fexra zeman, sîya Xuda û Mecîd,  
yanî xaqqanê mezin Sultan Abdulhemîd.  
Xudayê teala daîm bike heybeta wî,  
Xuda alîkar be û bilind bike selteneta wî.”<sup>53</sup>

A. Nacîm di gelek pirtûkên xwe de pesnê Sultan Abdulhemîd Xan dide û dibêje; “Wî, ji bo pêşketina îlm û mearîfetê gelek xîret û xebat kirîye, bi sayeya fikir û zanîna wî, ewladênen weten bûne xwedîyê exlaqê baş, hînê fen û îlmên mifedar bûne.”<sup>54</sup>

## 10. Nivîsên wî yên di rojnameya *Tercûmanî Haqîqet* de

Dema em bala xwe bidin xebat û pirtûkên wî yên çapkirî, dîyar dibe ku nivîskarîya Abdurehman Nacîm, gelek dem berîya çapbûna rojnameya *Tercûmanî Hakîkat* [*Tercûmanî Haqîqet*] dest pê kirîye. Ji ber vê yekê, ku em bêjin nivîsên dewreya *Tercûmanî Haqîqet*, êdî nivîsên di formata nivîskarîya rojnamevanî de ne, bawer dikim dê bitir ciyê xwe bigire.

<sup>52</sup> Abdurrahman Nacim, “Başlıksız Şiir”, *Tercuman-i Hakikat*, no: 1045, s. 3, 22 Muharrem 1299/ 14 Kânunuevvel 1881

<sup>53</sup> Mudde-i Umumi serveri Abdurrahman Nacim, destnivîsa *Rahnameyî Diyarbekir*, 27ê Nîsana 1885

<sup>54</sup> Ali Birinci, *Tarih Gölgesinde Meşahir-i Mechûleden Birkaç Zat*, Weşanên Dergah, Stenbol, 2001, r. 289

Di nav rûpelên *Tercûmanî Haqîqet* de, nivîsên wî bi pirranî di stunêن “Edebîyat” û “Bend-î Mahsûs” de bi nav û unwanêن “Wekîl û Muaventê Muddeûmumû yê Edirneyê”, “Abdurehman Nacîm ê Muddîeumumû yê Wîlayetî Hûdavendîgar” û “Muddeûmumû yê Wilayetî Hûdavendîgar ê berê” hatine neşirkirin. Babeta piranîya nivîsên A. Nacîm, li ser edebîyatê ye û di nav wan de jî gelek şîr di şiklê nazîre de hatine nivîsandin.

Neşe Demircî di lêkolîna xwe ya li ser rojnameya *Tercûmanî Heqîqet* de, nav û naveroka hinek nivîsên A. Nacîm weha anîye ziman:

“- Di hejmara 631ê ya *Tercüman-î Hakîkat* de, li ser “*Mesele-i Medeniyet ve Ruhbaniyet /Meseleya Medenîyet û Ruhbâniyetê/*” nivîseke Abdurrahman Nacîm Efendî bi navê “Wekîl û muaventê Mudeûmumû yê Edirneyê” di stuna “Bendî Mahsûs” de hatîye belavkirin.

- Di hejmarêن 967, 968 û 969an ê T. H. de, bi îmzeya “Abdurehman Nacîm ê Muddîeumumû yê Wîlayetî Hûdavendîgar”, rêzenivîseke bêserlewhe di stuna “Bendî Mahsûs” de li ser “Edebîyata Ereban û sîyaseta Îslamê” nivîsandîye.

- Di hejmara 982 ya T. H. de, bi navê “Muddîeumumû yê Wîlayetî Hûdavendîgar”, di stuna “Edebîyatê” de ji bo bersivandina daxuyanîyên konsolosê Brîtanyayê, li ser “berhem û şexsîyetên navdar ên edebîyata kurdi” nivîseke dirêj, têr û tije nivisandîye.

- Di hajmara 1045an de, bi nav û umwanê “Nacîm Efendî yê Muddeûmumû yê Wîlayetî Hûdavendîgar ê berê”, di stuna “Edebîyatê” de ji bo “sal-î cedît [sala nû]” bi navê “Tarîh-î Dîger” nivîseke bêserlewhe nivisîye ku sala 1299 ê nîşan dide. Herweha di heman hejmarê de wek nazîre şîrreke erebî ji bo Alî Fuad Beg nivisîye.

- Di hejmarêن 1072 û 1084an de jî, wek nazîre di stuna

“Edebîyatê” de bi navê “Nacîm Efendî yê Muddeûmumî yê Wîlayetî Hûdavendîgar ê berê” du şîrên wî yên bêser-lewhe hatine belavkirin.

- Di hejmara 1171ê de, bi munasebeta tayînbûna Seîd Paşa ji bo Nazirîya Xaricî, di stuna “Edebîyat”ê de nivîseke dîrokî nivisandîye. Di hejmarê 1181, 1195 û 1211an de jî bi navê “Abdurehman Nacîm ê Muddeûmumî yê Wîlayetî Hûdavendîgar ê berê” xazelên wî hatine çapkirin.”<sup>55</sup>

---

<sup>55</sup> Neşe Demirci, *Tercüman-i Hakikat Gazetesi (1- 1500 sayılar), İnceleme ve Seçilmiş Metinler [Rojnameya Tercüman-i Hakikat (Hejmarê: 1-1500 Lêkolîn û Metnêن Bijarte]*, Teza Lîsansa Bilind, Sivas, Kanûna 2012, r. 181, 182

## 11. Keyfî kî ye?

Keyfî bi eslê xwe ji qeza Koyê ya ser bi Silêmanîyê ji dayik bûye. Li ser tarîxa ji dayikbûna wî, agahdarîyên ciyawaz hatine belavkirin; ji alîyê hinek lêkolîneran ve tarîxa jidayikbûna Keyfî, sala 1814 tête nîşandan. Bi îhtimaleke mezin ev tarîx ne dirûst e. Di lêkolîna hêja ya bi navê “*Koyê le Rewti Şaristanîyet da*”<sup>56</sup>, li ser cî û tarîxa ji dayikbûna Keyfî weha hatîye nivîsandin: “Ev şairê behredarê kurd, navê wî Fetullahê Ciwanroyî bûye û nasnavê wî yê şairîyê jî “Keyfî” bûye, şair li dewrûberê salên 1255 ên koçî bi beramberê 1839ê zayînî li Şehrezûrê ji dayik bûye.”<sup>57</sup>

Di berhema navborî de li ser xwendina wî ya li Koyê dibêje: “Xwendinî suxteyî û feqeyetî pêş hatinî bo Koyê wergirtuhe, le salî 1280 beramber be 1863 le Koyê le layî Hacî Mela Ebdullahê Celîzade wek musteîdêk xwêndinî ayînî û fiqhî (fiqhî) wergirtûwe we ta ku salî 1869 her le Koyê bûwe we lew maweyş da şâîrêkî lêhatûy dîkey kurd le heman mizgeftî Celîzadan le Koyê lelay Hacî Mela Eshedî Celîzade xwêndûyetî, ewîş (ew jî) Şêx Rezayî Talebanî (1867-1910) bû. Be şewan Keyfî û Şêx Reza û Hacî mela Ebdullah û desteyek le mela û şâîrî dîke, le medresekey Hacî Mela Eshedî Celîzade û hendêkê carîş le dîwanxanekey Emîn Axayî Exter qorrî edebîyan bestûwe.”<sup>58</sup>

Keyfî berîya ku biçe Koyê dest bi nivîsandina şîran kirîye; bi zimanê kurdî û farisî şîr nivîsandine. Di berhema bi navê “*Koyê le Rewti Şaristanîyet da*” de, li ser şairî û hatina wî ya Koyê dibêje: “Keyfî ke hatûwete Koyê şâîrêkî lêhatû bûwe

<sup>56</sup> Kerîm Şareza, Nazim Hewêzî, Osman Mistefa Xoşnav û Mecîd Asinger, *Koyê le Rewti Şaristanîyet da* (*Nûsîn û lêkolînewew bidiwadaçûni*), Birwane-Govarî “*Defterî Kurdevari*”, jimare: 2, sali 1970- Babetêkî Mesûd Mihemed be nawnîşanî Keyfî Ciwanroyî,

<sup>57</sup> J. b., r. 281

<sup>58</sup> J. b., r. 281

honrawey naskî be kurdî û farisî danawe, le hunerî şîrêk da legel şairî belîmetî kurd Nalî pencebazî kirduve. Keyfî le naw aw û hewayî şairîyetî Nalî da desûrêtewe û honraweyekî naskî le şîhre pirr hunerekanî ew şaire bilîmetey kemtir da-nenawe.

Le honraweyekî dîkey da zîyatir deçête naw asmanî hest û endêşeyî Nalî û ciwantirîn xazelî dildarî be nawî “*Em dilê reşe*” dadenê û goy hunerî şîhrî klasîkî kurdî debatewe û dellê:

Em dilê reşe bê rehme ferengêkî tewawe  
Res qelbî reşe fitne beçawnawî birawe  
Qewsî be super kirduve girtûye bedestî  
Sed xencerî xwênrêj û dûsed tîrî siwawe!  
Zincîrî edalet nîye ê zallime zulfe  
Her çende benî bende berûy ersî xwawe  
Ta ku le kotayî xazelekeyî da dellê:  
Jêrî kemerî basî bikem barî gunahe  
Keyfî lebin em barî gunehe milî nawe!!”<sup>59</sup>

Keyfî xwendina xwe ya li bajarê Koyê, di medreseya Hacî Mela Eshedê Celîzade de didomîne û li vê derê bi berdewamî tevlî qorr û kombûnên edebî yên medreseyê dibe ku wê demê Şêx Rizayê Talebanî jî di heman medreseyê de musteîdê berdest ê Hacî Mela Eshed bûye. Şêx Reza û Keyfî, li vê derê hev nas dikin û bi hev re diçin dersên Mele Ehmedê Celîzade. Şêx Riza Talebanî, xwendina xwe li qeza Koyê û li ber destê Mele Ehmedê Celîzade temam dike. Paşê ji ber dilşikestinek di navbera feqîyan de, Keyfî ji bêgavîyê medrese û Koyê terk dike û diçe Hewlîrê.

Di berhema navborî de dibêje: “Keyfî musteîdîkî (daxwaz-kirîyek) zîrekî xwêndinî melayetî û şâîrêkî lêhatûyî korr û

<sup>59</sup> J. b., r. 282-283

kobûne edebîyekanî medresekey Hacî Mela Eshedî Celîzade bûwe û Şêx Rezayî Talebanîş leheman medrese da musteîdî berdestî Hacî Mela Eshed bûwe. Legel Keyfî gelêk pêşbir-kêyî edebî û hecûkarî kirdûwe. Le encamî yekêk lew mil-milane û şerre şîhraneyan da Keyfî dilî deşikê, be taybetî ke hendek le feqêkanî em medreseye bo layengîrî Şêx Reza be xorêkî naşîrîn wêneyê Keyfî le ser dîwarî jûrî mizgewt dekêşin û le encamî ew naxoşes Hacî Mela Ebdullayî Celîzade le Keyfî pest debê le medresekey derî dekat. Ewîş be dilşikawî Koyê cê deylê û deçête Hewlîr û derçûneyîş le Koyê le salî 1286î koçî beramber be 1869î zayînî debê.”<sup>60</sup>

Piştî bi terkkirina Koyê, Reşîd Axayê Hacî Mela Bekir Axayî Hewêzî nameyek ji bo Keyfî dinûsê û ji wî daxwaz dike ku vegere Koyê. Lîbelê Keyfî di bersîva xwe de rexne li bûyerên pêkhatî dike û dibêje li hemberê min bêrêzî hatiye kirin, ez êdî venagerim. Herweha ji bo Hacî Mela Ebdullahê mamosteyê xwe jî dibêje:

“Çon heybetî birdim le xirurî hezeran  
Çon heybetî kirdim be ser û suretî dîwar!!  
Herçende cefay damew sefam lê nedî ema  
Şahne deket medh û enayî çakî be eşhar!”<sup>61</sup>

Keyfî piştî ku tê Hewlîrê, demek dirêj li wê derê namîne. Bi rîya Mûsilê re pêşiyê diçe Helebê, du-sê salan li wê derê dimîne û paşê berê xwe dide Stenbola paytexta Dewleta Osmanî. Keyfî li Stenbolê jî huquq dixweyne.”<sup>62</sup>

Li ser dema çûyina wî ya Stenbolê, dîrok û nêrînê cuda cuda têne nîşandan. “Li gor Mesûd Mihemed, Hacî di sala 1864an de ji Koyê derçûye û Gîw Mukrîyanî jî wesa bawer

<sup>60</sup> J. b., r. 283-284

<sup>61</sup> J. b., r. 285

<sup>62</sup> Aso Zagrosî, Hacî Qadirê Koyî, 20ê Avrila 2009, <http://aso-zagrosi.over-blog.com/article-30477328.html>, 01.04.2016

dike ku di navbera salên 1853 û 1854 an de çûne Stenbolê.”<sup>63</sup> Di lêkolîna hevpar a “*Koyê le Rewtî Şaristanîyet da*” de jî dibêje: “Keyfi maweyekî kurt le Hewlêr demênetewe, be rêgay Musil deçête Heleb û le salî 1255î koçî beramberî 1871î zayînî Hacî Mela Ebdullahî mamostê legel bawkî da deçin bo Hec, le Heleb çawîyan pêk dekewêtewe lew wexte da mamostayî taybetî mindalekanî walîyi Heleb debê û legel yekdî da aşt debinewe û duwayî yek-dû sal Keyfi rê dekate Estenbûll, lewê çawî be Hacî Qadirî Koyî dekewîtewe.”<sup>64</sup> Bi dîtina min, ev dîroka dawî bêtir nêzîkê rastî ye.

Ji nivîs û helbestên Hacî Qadirê Koyî dîyar dibe ku ew pirr qîmet dide Keyfi. Hacî Qadir bi rêzgirtinê behsa Keyfi dike, jîyana wî ya li Stenbolê wek “hepsa zêrî zemîn” tîne ziman û wî jî di nav de wek esîr dide nişandan û di *Dîwana* xwe de dibêje: “*Keyfi hacet niye bikem basî/ Em kitêbey bixûnî deynasî. Be kê billêm ke be Keyfi billê be keyfû sirûr: Xemî nebê ke felek akîfatî çille guzin. Le qurr binîse billê: Qewm û qîle haware/ Esîr e Keyfi le Roma le hebsî zêrî zemîn.*”<sup>65</sup>

Dema em têkilîya Keyfi û Hacî Qadirê Koyî bînin ber çavê xwe, têkilî û dorûberê Hacî Qadir li Stenbolê, heman demê tê wateya têkilî û dorûberê Keyfi jî. Ew jî dide nişandan ku wê demê têkilîya van herdû şairan bi rewşenbîr, giragir û malbatên pêşhatî yên Kurdistanê re hebûye. Em dizanin ku Hacî Qadir bi xwe, wê demê mamostetîya zarokên Bedirxanîyan kirîye. Ew yekemîn şairê Soranî ye ku di helbestên wî de temaya netewetîyê gelek aşkere û bi awayekî xurt hatîye honandin. Lêbelê di dema wan de, rojname û kovarêن peryodîk ên kurdan hîn dest bi weşanê nekiribûn. Sala ku cerîdeya *Kurdistanê* bi berpirsyarîya Mîthed Mîqdad Bedirxan dest bi weşanê dike, Hecî Qadir jî diçe ser dilovanîya xwe û rehma Xwedê dike.

<sup>63</sup> Aso Zagrosî, j.b.

<sup>64</sup> *Koyê le Rewtî Şaristanîyet da (Nûsîn û lêkolînewew bidiwadaçûnî)*, r. 285

<sup>65</sup> Hacî Qadirê Koyî, *Dîwan*, r. 81, 128, [http://www.nefel.com/epirtuk/pdf/haci\\_qadire\\_koyi\\_diwan\\_02.pdf](http://www.nefel.com/epirtuk/pdf/haci_qadire_koyi_diwan_02.pdf)?NR:79

Dîroka mirina Keyfî bi zelalî ne dîyar e, li ser vê babetê nêrînên ciyawaz hene; di lêkolîna bi navê *Koyê le Rewtî Şaristanîyet da*, dîroka mirina Keyfî, wekî sala 1882 hatîye dîyarkirin. Li gorî hin agahdarîyê din jî Keyfî di sala 1883yan de li Stenbolê çûye ser dilovanîya xwe. Em dizanin ku nivîsa wî ya dawî, di hejmara 1383. a rojnameya *Tercûmanî Heqîqet* de, di stuna “Edebîyat”ê de bi sernivîsa “Ne yapayim! Şâîr olamıyorum [Çi bikim! Nikarım bibim şâîr]”, di roja 13yê Rebîyûlaxir a 1300î [22yê Kanûna Sanî 1883 yê Mîladî] de hatîye belavkirin. Berîya dîroka weşandina nivîsê, mirina wî nemimkun e. Ji ber vê yekê, iştimala herî mezin ew e ku di dawîya salêن 1883 yan jî hîn bi derengî çûye ser dilovanîya xwe. Mehmed Mîhrî Hîlav dibêje: Keyfî û Xeyalî li Awrupayê wefat kirine.<sup>66</sup> Lîbelê dîroka wefatkirina wan dîyar nekirîye.

Yekemîn nivîsa Keyfî, di hejmara 545. a rojnameya Tercûmanî Heqîqet (T.H.) de, bi sernivîsa “*İstîfade Nîyetîyle İfade*” di 26 Rebîyûlaxir a 1297an û [7ê Nîsana 1880ê yê Mîladî] de hatîye belavkirin. Wekî ku li jorê hate dîyarkirin, nivîsa wî ya dawî jî di hejmara 1383. a TH de hatîya belavkirin. Ji dîroka belavkirina nivîsên wî dîyar dibe ku nêzîkî sê salan di rojnameya TH de nivisandîye.

Ji nimûneyên wisa dîyar dibe ku di berîya derketina weşanên kurdan de jî, nivîsên rewşenbîrên kurd di rojname û kovarêñ osmanî, ermenî, arnawidî û wd. de jî hatine çapkirin. Li vê derê, bi giranî em dê li ser nivîsên Abdurehman Nacîm û Keyfî yên di nav rûpelên rojnameya *Tercûmanî Heqîqet* de çapbûyî rawestin.

Hetanî vê gavê, em tenê di nav rûpelên rojnameya *Tercûmanî Heqîqet* de rastî nivîsên Keyfî hatine. Dema em bala xwe bidin şopa qelem û edîbekî wisa xurt, mimkun e ku wî qîma xwe tenê bi karê hiqûqê û bi vê rojnameya hanê neanîbe, di hin weşanên din de jî nivîsandibe. Ev mijar divê bi balkêşî

<sup>66</sup> Seid Veroj, *Mehmed Mîhrî Hîlav û Kovara Kurdistan*, Weşanên Weqfa Beşikçi, Stenbol, 2015, r. 204

bête şopandin. Nivîsên Keyfî di nav rûpelên rojnameya *Tercûmanî Heqîqet* de, bi navê Keyfî û musteara “K-Y” hatine belavkirin.

Dema em li naveroka nivîsên Keyfî binêrin; ji nivîsên wî dîyar dibe ku ew rexnigirekî girîng ê wê demê ye, tenê li ser edebiyatê nenivisandîye, herweha tevlî gengeşeyên li ser “belagat-î osmanî” û “belagat-î erebî” jî bûye û li ser *sarf ve nahwa Erebî* nivisandîye. Keyfî; li ser cografya û matematikê nivîsandîye, helbest nivîsîne û herweha helbest û xazeleke şair Kurdî bi tevî tercûmeya wê<sup>67</sup> rêkirîye rojnameya *Tercûmanî Heqîqet*, di hejmara 1375an de jî li ser peyva “Nuance” ya fransizî û têkilîya wê ya bi kurdî re rawestiyaye. Ji van nivîsin û gengeşeyan dîyar dibe ku wî, bi zimanê kurdî, osmanî û erebî baş zanîye û nivisiye. Ew, di nivîsa xwe ya navborî de dibêje: “EZ rêzimana sirûştî û eslî ya kurdî zanim”

## 11. 1. Bersiva Mr. Trotter ê Konsolosê Brîtanya

Wekî ku li jorê hate gotin, yekemîn nivîsa Keyfî, di hejmara 545. a rojnameya *Tercûmanî Heqîqet* de, bi sernavê “Îstîfa-de Nîyetîyle Îfade” di 26 Rebiyûlaxir a 1297an û [7ê Nîsanâ 1880an ê Mîladî] de hatîye belavkirin. Keyfî, di hejmara 969. a T.H. de, bi çend nivîsên têr û tije yên balkêş bersiva daxuyanîyê Konsolosê Brîtanyayê daye.

Keyfî di destpêka nivîsa xwe de dibêje:

“Mr. Trotter ê Konsolosê Brîtanya yê Diyarbekirê, li ser Kurdistanê nivîsek belavkirîye û bê tefekûr têde gotîye edebî-yata kurdî “nîn” e. Di rastîyê de li kutibxaneyan, gelek eserên edebîyata kurdî hene; li vê derê ez dê xazelekî kurdî yê sade û herî kêmîhûner, wekî “mukadîmeyek redkirina” tehqîqatên wî, bi tevlî tercûmeya wê ya turkî ji bo rojnameya we rêkim. Hûn dê bibînin ku gotin û agahdarîyê wî çiqas dûrî rastîyê ne.

<sup>67</sup> bn. *Tercûman-i Hakikat, Gazel*, no: 969, s. 2, 13 Eylül 1881, no: 974, s. 3, 19 Eylül 1881

## Xazelâ Kurdî

**1-** Kuwa darayî zer girte kemerçîn kûlme gulnarî  
Kilawxwar, çaw xumar, şîrîn xal miske Tatarî.

Tercûmeya wê:

Ey evîndara min a sorhinarokî, fistan sirrmeyî, kemer qatqaî, saqo qumaşî!

Ey evîndara min a kofîxwar, çavmexmûr û şanênen wê mîsalê miskê Tatarîstanê!

**2-** Ke Manî hate ser kêşan ebrûwî tû le paş çawit

Le mestî destî we lexezî ke keç hat xatî pir karî.

Tercûmeya wê:

Wexta ku Manî teswîra çavêن te yên mexmûr çêkir û hat ku birûyêن te bikêše,

Ji ber ku serxoşî sîrayetê wî bûbû, destê wî ewqas dilerizî ku xetê pergelê xwar kêşandin.

**3-** Muneccîm gûşêî çawî ke dît nûsî le teqwîm da

Ke emsal zû zenbê talî' bûwe efsadeê asarî.

Tercûmeya wê:

Wexta ku mûnnecîm; kenarê çavêن wê dîtin di teqwîma xwe de,

nivîsand got îsal stêrka bidûv hilhatîye, ev jî nîşanê tevli-hevî ye.

**4-** Etoş teqlîdî zûlfî yar dekî wa dîyare ey eqreb

Heya her wa le çaw da her ci to bikî kiwêre muxtarî.

Tercûmeya wê:

Ey aqreb weha dîyar e ku tu teqlîdê zûlfêن yarê dikî!

Ez bêjim ci hey nabîna, her ci dixwazî bike bi şertê ku şerm û heyâ li ber çavê te be.

**5-** Eger to rast delî bo qatil dil, nîyet edî bo çî

Dirûzen tîrê mûjganit be xor xwîn dî le sûfarî.

Tercûmeya wê:

Ger ku tu rast bibêjî, yê min dilbirîn kirîye ne tu bî, ma ev çî ye?

Ey evîndara min a xapînok, xwîna reş zû diherike ji birûyên te yên wek tîra kemanê.

**6-** Gul emro xoy muqabil kird be ruxsaret le layî xelqî

Belê herdêm dero we herze gûn mehbûbî bazarî.

Tercûmeya wê:

Gulê, îro li nik xelkê xwe muqabilê ruxsarê xwe kir,

Belê çavêن di bazarê de wek lewçe ne û daîm dêman diçirînin.

**7-** Wekû fewwarey xwêن detekî le goşeê mîhwerê gerdûn

Le dûrê çawekanî to le çawem hinde xwêن barî.

Tercûmeya wê:

Dema ji çavêن te yên mexmûr dûr dimînin, ji çavêن min ên xemgîn ewqas xwîn dibare ku anûka weka fîskeyê di koşeyê mîhwera gerdûnê de xwîn difûre.

**8-** Le çar shit qet meke umîd le çar kes “Kurdî” ta demirî

Le xot aqil we le dil sebir we le bext îmdad le yar yarî.

Tercûmeya wê:

Ey “Kurdî” ta mirinê ji çar kes û çar shit (tişt) qet neke umîd;

Yanî bi cîheta eşqê ji xwe aqil, ji dil sebir, ji bext îmdad û ji yara xwe yarîtî nepê.”<sup>68</sup>

Keyffî ji bo serrastkirin û îkmalkirina bersîva Konsolosê Brîtanyayê, bi navê “Cevabname-î Manzûm”, nivîseke din bi

<sup>68</sup> Keyfi, *Gazel, Tercûman-i Hakikat gazetesi*, no: 969, s. 2, 13 Eylül 1881

hêvîya çapkiranê rêdike idareya *Tercûmanî Heqîqet* û xazela li jêrê bi tevlî tercumeya wê tête çapkiran.

### **“Cevabnam-î Manzum**

Be şew û be neşwem nişte bêm xecil  
Dim şadî di sed ender wazeî dil  
Watem namanî hergiz ha çîşen  
Leb berde we çîş nameî new pîşen  
Netarîkî xetê manaş mec û şâ  
Çûn abî heyatê dil xas xas nûşa  
Ax qûwe-î zemîn derunim gum bî  
Bû le kî sufteê sir rayê xem bî  
Wer ne o şew nîm çû ser û mûşt  
Meşya be gerdaş û rewdeê bihîşt  
Ferma bêt îse çemîn camî cem  
Pasîce nîn tû dîn û çesim  
Tervê kala keş alatir bîn  
Sed keyan û bo lê balatir nîn  
Arî ta pê û men rû men çûn şew  
Şewqen bê xendeê subhê cebheê o  
Ta were ê derdê dilê men şanen  
Zerîfet turreê o dane danen  
Na sûfte ê qamet ê men û sime û şen  
Ebrûyê o maîl û kamankeşen  
Namen diwê sufteyê çıştem nesrîn  
Celayê ayineê o zîyatirîn  
Hay çîştê waten û rehmet şad bî  
Mer o sakim bî este zîyad bî

Er cîh zamê dil men nekat mekerd  
Mezanatê o zat o wasif bêkerd  
Ew naz û ew qews û ew xedeng  
Bîn hin mebû têkîlan çi reng  
Haleş dise mil û îstiqlalîn  
Îstiqlal çinî haleş yekmalin  
Barî dil û xiştê wêranê ewan  
Hiqqet û desten nedârî tawan  
Dilê tifl wazîz her rû nîşanî  
Her sat xedengî her dem nîşanî  
Ka çûn stare ê tarîkî seher  
Ka qemer ka xwer mey û menzer  
Destê Şîrînîş mawer û ew yad  
Ferhadê le taq ferqegehê Ferhad  
Xalû pê celal erkarê sazî şen  
Wade ê tecellayê tîr endazişen  
Bismillah o tîr pur peyda busteş  
Endîşaneê dil sed car şikesteş  
Çûn renge ger wazim naze damanim  
O mez yû dem gûne zamanim  
Zam ê ten û tîr belaş ziyatir  
Rayê îmşewê dil û laşê ziyatir.

### -Tercûmeya Cevabnameyê-

Di alema eşqê de wekî bêhempayek bi xembarî rûnişti  
bûm, ecêb e! kêfxweşîya ku hîç nebûbû qismet ji nişkê ve  
derîyê kela min vekir.

Min got: Tu hîç nedihatî bi alî min ve, çi bû ku tu hatî! Ew keniya, got: şikayetnameya te hatîyebihîstin.

Her çiqas xetê zulmet ên nameya te, wateyêñ biçoş ên naveroka wê wekî ava heyatê kezeba min hênik kir jî, tu fayde neda

Hinava min bûye wekî bargirê xwelîya mihnétaran û xemxûran, şiyana jîyanê nemaye.

Eger weha nebûya, dê wekî şebnema tîr a serê kanîyê bi rehmeta zirav û beraketa xwe di bexçeya bihûştê de bibûya nimûneyek.

Çawa ku te ferman kirîye ew cewherê wekî nîşana rindiya ayîneyê camê cem û cîhanê, ne mînanê rindiya nû ya can û şohret û mezinayîya wê ya berê!

Xwedêgiravî nûha ji bo derbaskirina hesreta dilan û nîv-çavpêkevtinek wê bejna rind û herî bilind, xwe ji canfedayîyê nade paş.

Belê ew roja min a ku bi zulmeta (tarîfîya) dûrkentinê bûye ronahî ta ku wekî şevtarîyê dilşikestî be, helbet ew tîj û ronahîya enîya te ya wek fereca sibê dê bibe ronahîya rojê.

Belê ev dilê min ê ku bi tîra hîciranê parce parce bûye, ta ku di şûna birekê derdê eşqê de wekî şe bête dîtin, ew gulîyên porê te yê tîmsalê cemala te, dê wekî dudilî û bêsebiriya min rastî şanekî (navdarîyek) zarîf û perîşanî bêñ.

Belê qameta min a zirav wekî kevanê bi cazîbeya eşqê xwar bûye, mûyên birûyên evîndara min bûne wekî têlêñ kemankêşan.

Belê, belê. Ev wicûda te ya agir pêketî çiqas dûd-î endud be, aw û ayîne jî ew qas diberiqe.

Ax... We gotîye çi! Ci difikirin! Hîç wisa dibe? Di wê rindiya cîhanî û ew canê cewher de delalî gav bi gav zêdetir bibe, ku aliyeq nûqsan bimîne hezar mixabin!

Ger we birînê dilê min bidîta, we dê bidîta ku ew zat, ew sifet, ew naz, ew keman, ew peykan di wê gavê de bimirîya, dimire û dê bimire.

We dît ku dema niho bi awayekî pêt bi dahatû ve girêdayî ye, dahatû jî jibihûrîyê ve nayê vegetandin.

Hetanî dereceyekê şikandina dilê ku ji ber ecelê bi xerça xerab hatîye çêkirin û bûye warê xeman, mimkun e wek heqek bête hesêbkirin.

Ez her gav tifaleke nûr li dest û safdil im, ew nazenîna min a bêînsaf her gav dibe şanek, her lehze dibe peykanek û her deqîqe dibe nîşanek.

Geh wekî heyvê, geh wekî roja beriqî, geh wekî stîrka dahî ya ferecê xuya dike.

Ew Xusrev; evîndara wê Şîrîn, di îcrakirina sinetê de destê xwe yê bi meharet, Ferhad jî di seraya Bîstûnê de ferqê Ferhadbûna xwe bi bîr tîne.

Xalhalokê min! Eger anûha seyadê bêmîsal dixwaze bi eşqa îzharê celal tîrên xwe bavêje, va ye tîrên wê yên perîşan, bila bi bismîlahê bavêje.

Bila bi dilê xwe li hedefê bixe, ew tenê ku bi hezar caran qûl kirîye.

Çi wext ku dawa min ji xwîna birînê taze sor bû, ji hesreta wê devê birînê kevnare av digrin.

Yara min; di wicudê min de çiqas birînan vede, di dilê min ê bi hesreta xakpayêن wê de ew qas rê vedibin.”<sup>69</sup>

---

<sup>69</sup> Keyfi, *Cevabnam-î Manzûm, Tercüman-î Hakikat* gazetesi, no: 974, s. 3, 19 Eylül 1881

## 11.2. Nivîsên wî yên di nav rûpelên rojnameya *Tercûmanî Haqîqet* de

Çawa ku li ser jîyana wî ya giştî agahdarîyên me gelek kêm in; herweha li ser nivîskarîya wî jî agahdarîyên berfireh li ber destê me nînin an jî min nikarî bigijim wan agahdarîyan. Ji ber vê yekê, vê gavê me qîma xwe tenê bi nivîsên wî yên di nav rûpelên rojnameya *Tercûmanî Haqîqet* de anîye. Lewra hetanî nûha em tenê rastê nivîsên wî yên nav rûpelên rojnameya navborî hatine. Bi îhtimaleke mezin merivekî wisa xwedî zanîneke berfireh û entellektuel, qîma xwe tenê bi van meqaleyê rojnameyê neanîye. Pêşerojê keys çêbe, li ser wî agahdarîyên nû derkevin meydanê, bêguman dê lêkolîn û xebatêñ taybet li ser wî bêne çêkirin. Ji nivîsên wî yên di nav *Tercûmanî Heqîqet* de xuya dibe ku wî; bi kêmanî zimanê kurdî, erebî, fransızî û osmanî zanîye. Di nav rûpelên vê rojnameyê de, meqele-nivîsên wî yên li ser gelek babeten cihê cihê hatine belavkirin û li ser hinek babeten jî bi nivîskarêñ din re ketîye nav polemîkan û rexneyêñ dijwar li wan girtine. Ji nivîsên rojnameyê dîyar dibe ku Ahmed Mîdhadê sernivîskarê rojnameyê bi xwe jî carina tevlî van polemîkan bûye û di hejmara 545 a rojnameyê de bi sernivîsa “*Bîr Numune-i Tenkît*” de, piştgirî dide rexneyêñ Keyfi û dibêje: “Nivîsa ku bi îmzeya Keyfi hatîye belavkirin, xeletîyêñ berhema H. Begefendî anîye ziman; negotîye ev berhem baş e yan xirab e, li ser şexsê wî jî tiştekî negotîye. Ji ber vê yekê, divê rexneyêñ wî wek nimûneyeke baş bêne qebûlkirin.”<sup>70</sup>

Meqele û helbestên wî yên di rojnameyê de gelek caran bêserlewhe û di stunên besen wekî “Edebîyat”, “Mevadd-i Fenniye”, “Varaka” de bi îmzeya “K(ef)-Y” hatine belavkirin. Nivîskarê Ermén Artîn Musdemciyan ê ku wê demê xwende-

<sup>70</sup> Neşe Demirci, *Tercûman-ı Hakikat gazetesi* (1- 1500. sayilar), İnceleme ve seçilmiş metinler, Sivas, Yüksek Lisans Tezi, [Rojnameya Tercûman-î Heqîqet (hejmarêñ: 1- 1500), Lêkolîn û metnên bijarte, Teza Lisansa Bilind], Sivas Ocak 2012, r. 206

karê Mekteb-î Hiqûqî Şahane ye, li ser nasnameya wî dibêje: “Ew zatê ku di nav rûpelên rojnameya *Tercümanî Heqîqet* de berdewamî bi mustearê “K(ef)-Y” dinivisîne, navê wî yê rastîn Keyfî ye û ew herdu tîp jî kurteya navê wî yê mustear e.”<sup>71</sup> Ji vê agahdarî dîyar dibe ku Artîn, Keyfî nas dike û herweha di nivîsa xwe ya stuna “Mevadd-i Fennîye” ya hejmara 917yan de, ji ber polemîka di navbera wî û Keyfî de dibêje: “Keyfî hequeret li min kirîye.”<sup>72</sup> Li ser vê polemîkê, di hejmara 919yan de jî, bi sernivîsa “*Turkçe Bîlmez*”, nivîsa xwendekarekî bi navê İdris hatîye belavkirin û di naveroka nivîsa xwe de piştgirî dide Keyfî.<sup>73</sup>

Neşe Demircî di lêkolîna xwe ya li ser rojnameya *Tercümanî Heqîqet* de, nav û naveroka hinek nivîsên Keyfî weha anîye ziman:

- Keyfî (K-Y): *Fenn-i Nahvden Bir Meselenin Halli, Tercüman-ı Hakikat* (T. H.), no. 526, r. 3.
- Keyfî: *İstifade Niyetiyle İfade, Tercüman-ı Hakikat* (T. H.), no: 545, r. 3-4. Ev nivîs, di stuna “Edebiyatê” de hatîye belavkirin û di naverokê de rexne li Rebî-i Marifet a Ebûzziya Tevfik hatîye girtin.
- Keyfî: *İmla Meselesi Hakkında*, T. H., no: 785, r. 3. (Ev nivîs, di stuna “Mevadd-i Fennîye” de bê lêkirina sernivîsê hatîye belavkirin. Di naverokê de hinek qaîde û mîsalên li ser Kavaîd-î Osmanî hatine nişandan.
- Keyfî: *Bir Mesele-î Riyaziye*, T. H., no: 787, r. 3. Ev nivîs li ser Riyazatê [Matematîkê] ye û di stuna “Mevadd-i Fennîye” de hatîye belavkirin.
- Keyfî: *Hazine-i Evrak Hakkında*, T.H., no: 865, r. 2. Ev nivîs, di stuna “Varaka” de bêserlewhe hatîye lêkirin û di

<sup>71</sup> Neşe Demirci, J. b., r. 243-44

<sup>72</sup> Neşe Demirci, J. b., r. 244

<sup>73</sup> Neşe Demirci, J. b., r. 303

naverokê de balê dikşîne li ser xelet nivîsandina sernivîsa mecmuaya *Hazîne-î Evrak*.

- Keyfi: *İdris Salim'in yazısına cevaben*, T. H., no: 869, r. 2. Ev nivîs jî bêserlewhe hatîye nivîsandin û bersiva nivîsa İdris Selîm dide ku di hejmara 868. a T. H. de hatibû belavkirin.
- Keyfi: *Tashihat*, T. H., no: 901, r. 2-3. Di naveroka vê nivîsê de rexne li berhemâ *Telhîs-î Sarf ve Nahv-î Arabî* ya Ahmed Hamdî hatîye girtin û hinek xeletîyên wê hatine sererastkirin.
- Keyfi: *Ağzı Satmak*, T. H., no: 914, r. 3. Ev nivîs di stuna "Mewadd-i Fennîye" de hatîye belavkirin û di naveroka wê de bersiva rexneyê Artîn Mûsdemîcyan dide ku nivîsa wî di hejmara 912. a T. H. hatibû belavkirin.
- Keyfi: Ev nivîs, bêserlewhe hatîye lêkirin û di naverokê de îtiraza qâideyêk "Mecelle-î celîle" dike. T. H., no: 909, r. 3.
- Keyfi: Nivîseke tewr balkêş a nivîskar jî di hejmara 969. a T. H. de hatîye weşandin. Ev nivîs, xazeleke helbestvan Kurdî ye û pêre jî tercumeya wê ya turkî hatîye nivîsandin û di stuna "Edebîyat"ê de bêserlewhe hatîye belavkirin. Di naveroka nivîsê de bersiva Mr. Trotterê konsolosê Brîtanya yê Kurdistanê dide ku di daxuyanîya xwe de gotibû; kultura kurdan pir lawaz e û edebiyata wan jî nîne."
- Keyfi: Di hejmara 974. a rojnameyê de jî bi serlewheya *Tercüme-î Cevabname*, di stuna "Edebîyat"ê de berdewamîya bersiva Trotter dide.
- Keyfi: Nivîsa wî ya bi navê "Hareket-î Arz", di stûna "Mewadd-i Fennîye" ya hejmara 1356. a T. H de hatîye belavkirin û di naveroka wê de behsa erdhejê dike."<sup>74</sup>
- Keyfi: Di hejmara 1375. de "Li ser tercumeya peyva Nu-

<sup>74</sup> Neşe Demirci, J. b., r. 310, 311, 312

*ance*” nivîseke bêserlewhe di stuna “Mevadd-î Fennîye” de nivisîye. Ev nivîs, bersiva nivîsa Mehmud Celaledîn e; wî di nivîsa xwe de pêşniyar kiribû ku di şûna peyva “çeşît” de peyva “nuance”ya fransizî bête bikaranîn. Keyfi jî di şuna “nuanca”yê de, peyva kurdî ya “gûn” pêşniyar dike û ji vê yekê dîyar dibe ku wî, bi zimanê fransizî û kurdî baş zanîye.

- Keyfi: Di hejmara 1383yemîn a T. H. de, nivîsa wî ya bi navê “*Tarîh-î Arz*” di stuna “Edebiyat”ê de hatîye belavkirin û di naverokê de dibêje “Çi bikim, ez nikarim bibim şair!”

Digel van nivîsan, wergerên wî jî di nav rûpelên rojnameyê de hatine belavkirin. Mînak; Di stuna “Varaka” de, bi sernavê “Cografya-yî Beşerî” di hejmarên 1372, 1373, 1374 rojmameyê de sê nivîs li pey hev hatine neşirkirin.<sup>75</sup>

Ji nivîsên wî yên di nav van stunan de dîyar dibe ku ew; bi xwe edîb, rexnegir şarezayê serf û nahwa arebî û heman demê werger bûye.

---

<sup>75</sup> Bn. T. H., no: 1372, 1373, 1374



# Beşa duyem

## 1. Berhemêن Abdurehman Nacîm

A. Nacimî bi navên Mewlanbegzade Abdurehman Nacîm Efendî, Nacîm Efendî, Abdurehman Nacîm, Muddeûnumumî-î wîlayet-î Hûdevendîgar Abdurehman, Abdurehman Nacîm Efendî, Sabik Hûdavendîgar Mudeûnumumîsî Nacîm Efendî gelek meqale û pirtûk nivisîne. A. Nacîm nivîskarekî pirzimanî bû; wî bi zimanê erebî, farisî û osmanî berhemêن manzûm û mensûr nivisîne. Ew dem nivîsandina bi van zimanan di rewacê de bû. Şairêن me yên navdar Fuzûlî, Nalî, Mistefa Beg (Kurdî) û wd. jî bi zimanê erebî û farisî nivisandine. “Ji ber ku nivîskar, edîb û alîmên navdar ên kurdan berhemêن xwe yên nemir ne bi zimanê kurdî, bi zimanêن bîyanî yên din nivisandine, axaftvan û milletêن ku van zimanan dipeyvin, ew berhemêن giranbiha wek şaheserêن ziman û edebîyata xwe qebûl kirine û xweyîtiya wan kirin.”<sup>76</sup>


Ji nivîs û berhemêن A. Nacîm dîyar dibe ku ew heman demî muqtedîrê edebîyat, belegat û gramera erebî, farisî û omanî jî bûye. Hinek nivîs û meqeleyên wî didin nîşandan ku ew li ser edîb, edebiyat û perwerdeya kurdî jî xwedî zanîneke berfireh û kûr bûye. Hetanî iro berhemêن wî yên bi zimanê kurdî nehatine dîtin, lêbelê di nivîsên wî de hinek cumle û hevokêن kurdî wek mînak hatine nivîsandin. Ev jî didin xuyakirin ku bi kurdî zanîn û xwendina wî bêguman e. Di vê babetê

<sup>76</sup> Muhammed Emin Zeki Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, Nubihar Yayınları. 4. Baskı, İstanbul, r. 307

de Alî Birincî jî dibêje: “Ew muqtedîrê axaftina kurdî bû.”<sup>77</sup>

Pirranîya berhemên wî ji alîyê İBB ve hatine dijîtalîzekirin û kopîyên wan ên dijîtal, di Kutibxanaya Ataturk a li Taksîmê de têne parastin û li ser malpera internet a kutibxaneyê jî têne daxistin. Berhemên wî, li gorî dîroka xwe ya neşirkirinê li jêrê hatine rêzkirin.

## 1. 1. Defter-î Kutibxane-yî Damad İbrahîm Paşa



Çapa yekemîn a vê pirtûkê, çapa kevirî ye û di meha Şabana sala 1279 [10ê Sibata 1863] de ji alîyê çapxane-ya Evkaf-î İslamiye ve hatîye çapkîrin û 64 rûpel e. Paşê ev pirtûk sala 1312an ji nû ve hatîye çapkîrin û di vê çapê de hejmara rûpelên wê 87 in. Ev pirtûk, çavkanîyeke se-

<sup>77</sup> Ali Birinci, *Tarih Gölgesinde Meşahir-i Mejhûleden Birkaç Zat*, Dergah Yayınları, Stenbol, 2001, r. 287

reke ya pirtûkxaneyê dema osmanî ye. Ev kutibxaneya ku deftera wê çêbûye, di nav medreseya Îbrahîm Paşa de û li nêzîkê Mizgefta Şêxzade bû. Di muqadîmeya pirtûkê de dibêje: “Her ci hîkmet e ku hetanî iro defterê kitêbên kutibxaneyê li Stenbol, bi awayekî pêdivî ne-hatine çapkirin. Ji bo ku li ser mulkê berhemên Hezretî Padışah Abdulhemîd Xan Efendî yê dilxwazê zanîn û perwedeyê, berhemeke nû ya xweşik zêde bibe û asanî ji erbabê zanîn û xwendinê re çê bibe, kitêbên mewcud ên pirtûkxaneyâ İbrahîm Paşa di vê defterê de hatine nivîsandin û ji alîyê Wezareta Mearîf a celîleyê ve jî hatiye çapkirin.”<sup>78</sup>

## 1. 2. Teshîlût Tahsîl

Ev pirtûka piçûk di 24 Zîlhicceya sala 1281ê [20ê Gulana 1865an] de hatîye çapkirin, naveroka wê li ser sentaksê ye û 24 rûpel e. Dema ku ev pirtûk hatîye nivîsandin, ew, misfetîşê kutibxaneyan bû.<sup>79</sup>

## 1. 3. Defter-î Kütübhane-yî Ragip Paşa

Yekemîn çapa *Defterê Kutibxaneya Ragip Paşa*, di 23yê Çirîya Pêşîn a sala 1868an de yanî piştî vegera wî ya ji Parîsê (1867), di çapxaneyâ Takvîmhane-yî Amîre de pêk hatiye û 80 rûpel e.<sup>80</sup> Çapa duyemîn, di sala 1310an de çêbûye û li ser hev 176 rûpel e. Di muqadîmeya vê pirtûkê de jî dibêje: “Ji bo ku li ser mulkê berhemên Hezretî Padışah Abdulhemîd Xan Efendî yê dilxwazê zanîn û perwedeyê, berhemeke nû ya xweşik zêde bibe û asanî ji erbabê zanîn û xwendinê re çê bibe, kitêbên mewcud ên pirtûkxaneyâ İbrahîm Paşa di vê defterê de hatine nivîsandin û ji alîyê


<sup>78</sup> Abdurrahman Nacîm, *Defter-î Kütübhane-yî Damad İbrahîm Paşa*, Stenbol, 1312, r. 2

<sup>79</sup> Ali Birinci, *Tarih Gölgesinde Meşahir-i Mejhûleden Birkaç Zat*, r. 289

<sup>80</sup> Ali Birinci, *Tarih Gölgesinde Meşahir-i Mejhûleden Birkaç Zat*, r. 292

Wezareta Mearîf a celîleyê ve jî hatîye çapkirin.”<sup>81</sup>

Di destpêka pirtûkê de dibêje: “Ciyê kutibxanaya merhum Sadrzama Ragip Paşa li ser caddeya Koska ye û lîsteya pirtûkên di nav defterê de weha hatiye rîzkirin:



### Musahif-î Şerîflerî

- |                             |          |       |
|-----------------------------|----------|-------|
| 1- Mushaf-î Şerîf           | 9 nûsxe  | erebî |
| 2- İbrahîm Hattıyla “ahar”  | 19 nûsxe | erebî |
| 3- Cûzek ji K. Kerîm (Kufî) | 5 nûsxe  | erebî |

### Kitabên Tecvîd ve Kiraat

- |                                      |          |       |
|--------------------------------------|----------|-------|
| 4- Îthafû'l Beşer (Ahmed Dimyatî)    | 27 nûsxe | erebî |
| 5- Îqna'fîlqiraatîs-seba (Ebu Cafer) | 19 nûsxe | erebî |
| 6- Tehzîbû'l Qiraet (Saçaklizâde)    | 21 nûsxe | erebî |
| 7- Şerûş-Şatîbîye (Alîyû'l Kaşî)     | 25 nûsxe | erebî |
| 8- Şerhû'i Muqaddîme (Alîyû'l Kaşî)  | 6 nûsxe  | erebî |

<sup>81</sup> Abdurrahman Nacîm, *Defter-i Küttûbhane-yî Ragip Paşa*, Stenbol, 1310, r. 2

## Kitabê Pîroz ên Tefsîrê

- 9- Îtqan fî Ulumîl -Quran(Suyut Talîk) 15 nûsxe  
erebî
- 10- Esbabûn-Nûzul (Vahîdî) 21 nûsxe erebî
- 11- Esrarû't Tenzîl (Îmam Faxreddîn) 23 nûsxe erebî
- 12- Sual ve Cevaplarî (M. b. Ebubekir Talîk) 27 nûsxe turkî
- 13- Îşaretû'l İlahîye (Necmedin El-Bağdadî) 23 nûsxe erebî.<sup>82</sup>

### 1. 4. Safvetûl-Kelam



<sup>82</sup> Abdurrahman Nacîm, *Defter-i Kütbâhane-yî Ragip Paşa*, Stenbol, 1310, r. 2-3

Ev pirtûk, pirtûkeke dersdanê ye û ji bo dibistanê Rûştiye hatîye amadekirin. Pirtûk di 15yê Kanûna Ewel a sala 1869an de bi emrê Nazirê Mearîf Safet Paşa, di Çapxaneya Amîre de hatîye çapkiran û ji 48 rûpelan pêk hatîye.<sup>83</sup>

Di nivîsa destpêka vê pirtûkê de behsa mûcîzeyên Qurana kerîm û hîkmeta Xwedayê mezin dike û dibêje: “Cenabê Heq, însan wisa xuliqandîye ku dikare tehsîla hemû îlim û lîsanan bike.”<sup>84</sup> Di berdewamîya nivîsê de pesnê Sultan Abdulhemîd Xan dide û dibêje wî, ji bo pêşketina îlim û mearîfetê gelek xîret û xebat kirîye, bi sayeya fikir û zanîna wî, ewladênen weten bûne xwedîyê exlaqê baş, hînê fen û îlmên mifedar bûne.

Li ser kêrhatin û naveroka pirtûka xwe jî weha dibêje: “Ji bo ku xwendevanê mektebêن rûşdîyeyê çavpêketîyên zimanê erebî bibin, di vê xusûsê de melekeyên wan bi pêş-bikevin û bibin xwedîyê exlaqekî baş, ev rîsaleya bi navê *Safvetûl-Kelam* hatîye amadekirin.”<sup>85</sup> Eslê vê rîsaleyê bi erebî hatîye nivîsandin û ji alîyê Mehmed Nûzhet ve ji bo zimanê osmanî hatîye wergerandin.

## 1. 5. Hûvîyet-î Subhanî ve Mahîyyet-î Însanîye dair Eserê Risaledir

Ev pirtûka wî, di sala 1296an de li Stenbolê wek destnivîsa çapa kevirî hatîye belavkirin û ji 8 rûpelan pêk tê. Di naveroka wê de xazeleke nivîskar û şerha wê hatîye kirin.

Nivîskar vê berhema xwe wek rîsaleyek bi nav dike û di destpêkê de dibêje: “Ew zatênu ku bi yekîtîya Xwedê bawer dikin, dema bi xelkê re sohbetê dikin Xwedê îhmal dikin...”<sup>86</sup> Di berdewamîya nivîsa destpêkê de ji bo nîşandana rêya xelasîyê,


<sup>83</sup> Ali Birinci, *Tarih Gölgesinde Meşahir-i Meçhûleden Birkaç Zat*, r. 289

<sup>84</sup> Abdurrahman Nacîm, *Safvetûl-Kelam*, Stenbol, 1869, r. 1

<sup>85</sup> Abdurrahman Nacîm, *Safvetûl-Kelam*, Stenbol, 1869, r. 2

<sup>86</sup> Abdurrahman Nacîm, *Hûvîyet-î Sûbhani ve Mahîyyet-î Însaniye*, Stenbol, 1396


ayetekê bi bîr tîne û dibêje: “Fes’slû ehlez-zîkrî înkûtûm la-ta’lemûn (Tiştên ku hûn nizanin ji ehlê îlmê hîn bibin.)<sup>87</sup> Di dawîyê de jî dibêje: “Hûz mîn’el bahr’l-lûalî ve mîne’el-erdîz zeheb/ Ve îqbelî’l hîkmete mîmmen qaleha ya ze’l soheb”. (Hey kesê esilzade! Ji behrê încîyan û ji erdê jî zêran berhev bike/ Hîkmetê jî, ji xwedîyê hîkmetê bigre).<sup>88</sup>



<sup>87</sup> Abdurrahman Nacîm, J. b.

<sup>88</sup> Abdurrahman Nacîm, J. b.

## 1. 6. Rahnameyî Diyarbekir



Ev berhema piçûk a A. Nacîm, berîya pirtûka wî ya “*Gulzar-î Asar*” hatîye nivîsandin û destnivîsa wî jî li ber destê me heye. Di destnivîsê de wek “*Rahnameyî Nacîm*” hatîye binavkirin. Lîbelê heman berhem, bi hinek cûdayîyên pir piçûk, wek pêvekekê di pirtûka “*Gulzar-î Asar*” de jî hatîye çapkiran. A. Nacîm vê rahnameya xwe, bi zimanê farisî nivîsiye. Wî bi zimanê farisî û arebî baş zanibûye û bi farisîyek xurt, bi helbestî û bi qalibek arûzî, bi edebîyateke bilind anîye ziman. Herweha bi wesîleyên cihê cihê di gelek ciyên *Rahnameyê* de

pesnê Padışah Abdulhemîd dide û dibêje: “Stenbol, ku meqamekî pirr mezin e. Ji ber ku textgeha Padışah Abdulhemîd e, ku parêzgerê dîn e. Siha Xuda ye, îftixara dewran e, penahgeha alemê ye, pêsenkê cin û însana ye. Heta ku dinya hebe, roj û hîv rohnî bide, Stenbol ji wî şeref û bilindayî digre.”<sup>89</sup>

Nivîskar vê berhema xwe di şiklê mesnewî de nivisiye:

- a ----- a
- b ----- b
- c ----- c
- d ----- d

Yanî di farisiya wê de misreyên her beytek di nava xwe de qafîye girtîye. Çawa ku li jor xuya ye; qalibê vê mesnewîya hanê ev e: Faîlatûn Fâîlatûn Fâîlûn.

A. Nacîm, “bi wezîfeya reîstîya Mehkemeya Îstinafê di 12yê Sermaweza 1882yan de ji Stenbolê tayînê Diyarbekir bûye û di 10ê Sermaweza sala 1885an de li vê derê mewqîya wî bilind dibe ji bo reîstîya Mehkemeya Bîdayetê [Asliyeyê]. Wî di jîyana memûrtîya xwe de, dema herî dirêj li bajarê Diyarbekirê kar kirîye.”<sup>90</sup> Dema tayînê Diyarbekir dibe, ji Stenbolê ve hetanî Diyarbekirê di rê de çi tiştên ku dîtine û derbas kirine, bi zimanekî edebî yê xurt anîye ziman. Di vê rêuwîtîyê de, her cî û warê bînvedan û rawestandinê ku ji nav derbas bûne û li wir bûne mêvan, navê wan deran bi qelema rengê sor hatîye nivisîn. Di wergerê de, me navê wan deran bi rengê reş dîyar kirîye. Di vê rahnameyê de bi her firsetî hezkirin û heyranîya xwe ya ji bo Diyarbekirê anîye ziman.

Dema ku A. Nacîm wek reîsê Daîreya Ceza ya Mehkeme-ya Îstinaf a Dîyarbekir tête tayînkirin, gelek kêfxweş û dilşad dibe, bi heyecan û bêsebrî çûyina ji bo Dîyarbekirê dipê. Di

<sup>89</sup> Mudde-i Umumi serveri Abdurrahman Nacim, destnivîsa *Rahnameyî Diyarbekir*, 27ê Nîsana 1885, r. 2

<sup>90</sup> Ali Birinci, *Tarih Gölgesinde Meşahir-i Meçhûleden Birkaç Zat*, r. 288

vê navberê de gelek caran Dîyarbekir tê xewna wî. Ew, vê heyecan û bêtebatîya xwe, di *Rahnameya Dîyarbekir/ Rahnameya Nacîm* de weha tîne ziman: “Dema ku zivistan çû û bihar hat, qerar ev bû; dê biçim Diyarbekir yanî Amed. Ew tiştê ku di gelek şevan de dilê min wan dîtí bû, Ameda reş Diyarbekir bû....”<sup>91</sup> “Roja duşenbe dozdeyê meha Receb, pazdeh ji meha Nîsanê bêzehmet û eziyet. Gihîştim Dîyarbekir bi kêf û xweşî, ev nezma me jî gihişte paşî.”<sup>92</sup>

Wî, dema tewr dirêj a wezîfeya xwe ya fermî li bajarê Amedê derbas kirîye, bi rêvebir, minewer û şairên Amedê re têkilîyen wî yên germ û ges çêbûne. Wî dema ku li Xarpêtê jî kar kirîye, carina serdana Amedê û dostêن xwe yên li Amedê kirîye. Ji ber van têkilîyen gurr û germ, wî, bi munasebeta mirina şair Ahmed Xeyalî, hevokên herikbar ên li jêrê teqdîm kirine û bi hesaba ebcedê dîroka mirina şâîr jî daye dîyarkirin:

“Eyledim hayli tahayyül âlemi ey ehli hal

Hadisin her ferdini gördüm hayal ender hayal

Söyledim Nacîm, Hayali eyledik de irtiyal

Oldu tarihi vefatı “ha Hayali ha hayal”<sup>93</sup>

Alî Emîri di pirtûka xwe ya bi navê *Tezkîre-i Şuaara-yî Amed* de, tenê ev hevokên wî yên li ser Ahmed Xeyalî negi-handîye me, herweha wêneyekê wî yê pir hêja û yekane jî gi-handîye roja me, ku di wêneyê de panzdeh kesayetî hene. Ni-vîskar li ser ciyê kişandin û dîroka wêneyê hewa dibêje: “Ev wêne li Diyarbekir, sal û nîvek berîya wefata Xeyalî Efendî yanî di Tebaxa sala 1301ê ya Rumî de (6 Eylûla 1885) de, di bexçeya koşka Kaws de hatîye kişandin ku li perava çemê Dîjleyê û di nav mesîreya çiyayê Qirqlarê de ye. Kesayetîyen di wêneyê de, bi reqamê ji rêzeya navîn û alîyê çep ve hatine nîsandan û di binê wêneyê de navê wan hatine nîvisandin.

<sup>91</sup> Abdurrahman Nacîm, destnivisa *Rahnameya Dîyarbekir*, r. 1

<sup>92</sup> J. b., r. 12

<sup>93</sup> Alî Emîri, *Tezkîre-i Şuaara-yî Amed*, Matbaayı Amedî, Stenbol, r. 319



- 1- Ahmed Xeyalî Efendî.
- 2- Alî Beg; walîyê kevn ê Trabzonê û rêvebirê berê yê Duyunî Umumîye. (Bi unwanê mifetîşê giştî yê Duyunî Umumîye, li Dîyarbekir kar kiribû).
- 3- Qazesker Mehmed Mekkî Beg; misteşarê kevn ê Mifetîşîya Ewqâfi Humayun. (Bi unwanê naîbî şerî wîlâyet, li Dîyarbekir kar kiribû).
- 4- Salih Paşa; walîyê kevn ê Musilê û azayê şuarayî dewlet ê berê. (Bi unwanê mifetîşîya Adilîyeyê, li Dîyarbekir kar kiribû).
- 5- **Abdurehman Nacîm Efendî; reîsê kevn ê Mahkemeya İstinaf a Elazîzê.** (Bi unwanê reîsê Mahkeme ya Cezayê, li Dîyarbekir kar kiribû).
- 6- Terzî Mûrdîk Efendî.
- 7- Ji xalanê Xeyalî Efendî, Gulşenîzade Hecî Bekir Rewşen Efendî yê serkatibê tehrîrat ê Duyunî Umumîye.
- 8- Mîhran Ferîd Efendî yê sermifetîşê Wezareta Duyunî Umumîye ku wê demê hatîbû Dîyarbekirê.

- 9- Gulyar Efendî; mifetîşê kevn ê têlgrafa Diyarbekir.
- 10- Kandîla Efendî yê Beyrûdî; memûrê têlgrafa muxabere ya Dîyarbekirê bi zimanê ecnebî.
- 11- Husêن Efendî; serkatibê kevn ê muhasebeya Duyunî Umumîyeya Diyarbekir.
- 12- Ahmed Cemîl Efendî yê Dîyarbekirî; muddeyî umumîyê kevn ê Mehkemeya Îstînaf a Sûriyê.
- 13- Hemdî Efendîyê Mûsilî; mifetîşê kevn ê adliyeya Diyarbekir.
- 14- Abdulhemîd Nîyazî Efendî; serokê şaredarîya Dîyarbekir ê kevn.
- 15- Fetullah Efendîyê Çizmecîyan; memûrê îcraya Diyarbekir û xwarziyê Kalîb Efendî yê xwedîyê rojnameya *Tarîk*.<sup>94</sup>

Wexta ku nivîskarê vê kitêbê Abdurehman Nacîm, wek serokê Mehkemeya Îstînafê neqlê Dîyarbekir bûye. Ji Stenbol heta ku tête Dîyarbekirê, tiştên di rê de dîtine, bi vî mesnewîya hanê bi zimanê farisî anîye ziman û gotîye: Xuda Dîyarbekir ji her afet û xirabiyê biparêze. Herweha wî, di dawîya pirtûka xwe ya bi navê *Türkçe Mantık Hulasası* [Xulaseya *Mentiqê bi Turkî*] de jî dilxwazî û hezkirina xwe ya ji bo Dîyarbekirê anîye ziman û gotîye: “Xwedê wî bajarî ji afet, hîle û belayan biparêze.”<sup>95</sup>

### **Rahnameya Diyarbekir**

Dema ku zivistan çû û Bihar hat, qerar ev bû;  
 dê biçim Diyarbekir yanî Amed.  
 Ew tiştê ku di gelek şevan de dilê min wan dîtî bû,  
 Ameda reş Diyarbekir bû.  
 Ji ber ku bi emrê şahînşahê zeman,

<sup>94</sup> Ali Emîrî, *Tezkîre-i Şuaara-yî Amed*, Matbaayî Amedî, Stenbol, r. 319-320

<sup>95</sup> Abdurrahman Nacîm, *Türkçe Mantık Hulasası*, Weşanxaneya Mahmud Bey, Stenbul, 1306 (1890)

ez li wê bûm serwerê Mehkemeya Îstinafê.  
Ji bo Mehkemeya Îstinaf a cezayê,  
hukimkirin li ser xweyîyê cînayetan heq e.  
Eger tu dîroka wî dipirsî:  
Yek hezar û sêsed û du bû (Hîcî-1302).  
Hêvîya min ji Xuda û pêxember;  
ew e ku ji edaletê hîç cûda nebim.  
Bi xwestina dilê min,  
berê min kete Amedê.  
Ey dost, roja şenbe ji **Stenbol**,  
ku meqamekî pirr mezin e.  
Ji ber ku textgeha Padîşah Abdulhemîd e,  
ku parêzgerê dîn e.  
Siha Xuda ye, îftixara dewran e,  
penahgeha alemê ye, pêsenkê cin û însana ye.  
Heta ku dinya hebe, roj û hîv rohnî bide,  
Stenbol ji wî şeref û bilindayî digre.  
Di saet şesan de em li keştiyê siwar bûn  
û agirê xwe yê dojehî vêexist.  
Rêya me li ser **Deryaya Reş** bû,  
hevalê me alîkarîya Xuda bû.  
Em du şev li ser wê behrê man,  
binî behr û jor asîman.  
Ji bo rîwî tewekkûl lazim e,  
ber dayina Xuda her dem lazim e.  
Bi hemdê Xuda sehera roja duşenbê,  
em gihiştin bajarê **Semsunê**.  
Em li wê peya bûn,  
ji wî cih û warê pirr memnûn bûn.

Em şevekê li wê bi xweşî man,  
roja şenbê em ji wê cûda bûn (çûn).  
Bi heft mecidîyeyê me arebeyek kirê kir,  
xweyîyê erebeyê navê wî Murad bû.  
Ew muhacir bû û mirovek dîndar bû,  
dilsaf û xuypaqij û emîn bû.  
Di rê de du zatê namdar bûn heval,  
herdu jî bînbaşî bûn.  
Yek ji wan navê wî Selîm bû,  
yê dî Tewfiq û mirovek helîm bû.  
Ji ber ku her navek ji asîman tê xwarê,  
me ji navê wan xelasî hêvî kir.  
Navê wan bû delîla serkevtin û selametî,  
Xudayê Hadî ji bo me bes e û qenc wekîl e.  
Bi vê umidê, tirs û wesweseya me çû,  
we rîya me bi terefê **Sîwasê** bû.  
Wek dilê mirovê ber bi Xuda,  
ev rîya me saf û sade bû.  
Di vê rê de çavê me didît her zeman,  
dar û gul û avên cûyan.  
Gul û zîreat û çîmenên zêrîn,  
bûne wek xalîçe û hezar kîf û kenîn.  
Em di rê de şevek li **Çakallî** man,  
di wexta sibehê beriya avêtina rojê.  
Em ji xewa şîrîn zû şiyar bûn,  
li wî cihê xweş heta seherê.  
Em xweş raketin temamê şevê bi dilek ji dûrê xeman,  
bê tirs û te'b û elem em ketin rê heman.  
Em gihiştin **Amasya** bajarê namdar,

çi cihek dilkêş û xweş bû ew dîyar.  
Gelek mizgeft û gelek avayîyên qedîm,  
digel saetek pir mezin dihat dîtin.  
Di nava bajar çemek pir cesûr,  
der û dorêñ wî qesrêñ bêqisûr.  
Walîyê wî bajarê zatek alî bû,  
alîkarê rêya heq bû, gelek xweyî weqar bû.  
Navê wê Rif'et Xelîl Paşa bû,  
asefê dewran û wezîrek xweşxûy bû.  
Jî nû ve jîyan dabû bajar,  
ji bo rêuwîyan rêya xelasî çêkiribû.  
Ji bo çêkirina rêya mezin a bajar,  
rast û çep gelek çîyan rakiribû.  
Gelek pirêñ mezin ava kiribûn,  
bang dida: "Werin va ye rêya rast."  
Her dem difikirî ji bo karê çêtir,  
ne ji bo menfaeta şexsî kar dikir.  
Heta qiyametê xebata wî berdewam be,  
li ser wezîr û walîyan hukûmran be.  
Min çû dît zatê wî,  
heyran mam ji eql û zekaya wî.  
Em li wî bajarî şevekê razan,  
bi derketina rojê dîsa ketin rêyan.  
Di rê de xaneke hêja xuya kir,  
ew jî yek eserê padîşahê bêmîsal bû.  
Ruhê wî her dem bi rehmet şad be,  
heta qiyametê navê wî bi qencî bimîne.  
Rêya me rast bû, bênişib û firaz bû,  
ev car cihê sekna me Çengelboxaz bû.

Em şevekê li wê man,  
sibehê rêya me berdewam.

Rêya me bê eziyet û cefa dewam kir,  
em gihiştin **Tokatê**.

Bajarek e di nava şinahîyan de,  
bi der û dorê xwe di nav bax û baxçeyan de.

Baxçe û rezên wî ji daran xemilîne,  
ji gul û gulzaran wek qesrên Çîn e.

Hadî Paşa di wî bajarî de bû,  
bi dîtina wî dile me rohnî bû.

Ez û ew, dost û hogirê hev bûn,  
di rêya Tunûsê de em heval bûn,

Ez li wê derê razam heta seherê,  
paşê em rabûn me kir ezma seferê.

Di wexta mexrîbê de, bêzehmetî em gihiştin **Yenîxanê**.

Ez bûm mîhvanê rahibekî,  
ku xweyî îkram, edeb û xweşhogir bû.

Sibha wê şevê em ketin rê û çûn,  
heta gihiştin **Sêwasê**.

Bi navê Mîr Ehmed Şewqî Efendî li wê zatek hebû,  
bi dîtina wî em gelek kîfxwêş bûn.

Ji me re gelek wefa û îltîfat nîşan da,  
ji kerema xwe em dawet kirin, gelek memnun û dilxwêş kirin.

Peyvîn wî wek durr û cewheran bû,  
birayê Fehmî Paşa bû.

Ev zat nûha Nazirê Edliyê ye,  
temamê fikrêñ wî wek navê wî qenc in.

Em du şev li Sêwas man,

paşê bi tevî hevalan rê dewam kir.  
Ucreta erebeyê li vê zêde bû,  
ji Sêwasê heta Xarpûtê.  
Her yek ji me hijde mecidî,  
dea ji bo Abdulhemîd Xan.  
Ji lûtfâ xwe ew Padîşah li her cihê memleket e,  
bi sed hezaran rîyên mezin çêkiribûn.  
Li her terefî hizur û emnîyet hebû,  
her alî ava bû, her kes kêfxwêş bû.  
Sebebê her rastî rîya xeyrê bû,  
Şah adil e, sewaba wî qat bi qat.  
Ew serwerê hemû sultanan,  
fexra wî li ser temamê pêxemberan.  
Ew pêxemberê xwedîyê exlaqê mezin,  
di heqê Noşîrewan de binêrin ci gotibû.  
“Ez di zemanê şahêkî adil de ji dayik bûme”,  
Noşîrewan ji dinyayê çû, welê navê wî bi qencî ma û ma!  
Milk û seltenet bi dîn û edalet dewam dike,  
dua ji emîrûlmuminîn re bike.  
Ev peyvan wek rîya mezin rast in,  
kar û hikum her yê Şahînşah in.  
Roja selteneta wî dê her dem ronahî bide,  
sîya wî daîm li ser me be.  
Eger sedeqet hebe xizmet tê kirin,  
ji çewtîyê bi sedan afet çêdibin.  
Ji behsa rastî û duristîyê gelek hat gotin,  
di vî warî de me jî di rê de gelek tişt gotin.  
Behsa edalet û rastîyê hîç naqedede,  
em dîsa werin mewzûya rîya xwe.

Ew roj bê ezîyet me rê dewam kir,  
ku bû şev li **Deñiktaşê** me ïstirehet kir.  
Ew şev em razan heta wexta seher,  
paşê em rabûn me da qerara sefer.  
Me rê dişopand û eskerên bihar,  
sef bi sef di ïstiqbala me bûn aşîkar.  
Berf hindik mabû li ser çiyayan,  
av diherikî bi ser gul û gulzaran.  
Ji cûdayîya berfê çiya digirîn,  
ji girîna çiyayan lalezar dikenîn.  
Bi kêf û xweşî bê xem û keder,  
di nav deşt û newalan de em rê diçûn ser ta ser.  
Em diçûn û diçûn bi kêf û surûr,  
dilê me tije bû ji erq û nûr.  
Ji bayê nesîm û jibihna nebat,  
çi zewa û sefa bû, çi reng û heyat.  
Heta ku gehîştin bi **Alaca Xan**,  
ji bo raketinê, em şevekê li wê man.  
Sibehê em ketin rê, rêya pir kevir,  
gihiştin **Hekîm Xanê** wexta êvar.  
Cihek pir xweş û dilhebin bû li wê,  
xew û rehetîkî xweş me kir li wê.  
Em bûn mîvan li mala Mehmûd Efendi,  
zatekî mîhvanperwer û jîr û xwende bû.  
Ew şev hat cem me yekî pir zana,  
zana, jîr û bi xweş ziman bû.  
Hişyar bû û dinya dîtibû,  
gelek tecrûbeyan derbas kiribû.  
Ji daîreya têlgirafê malnişîn bû,

navê wî Eflatûn bû.  
Yek mudir jî li wê bû,  
ew jî xwenda û jîr û zana bû.  
Hîmmeta wî li ser sulh û aştî bû,  
navê wî Evdila Efendî bû.  
Ji ber ku em di rê de pir westiyabûn,  
ew şev em xweş raketin.  
Bû sibeh em ketin rê,  
ku bû êvar em li **Hesenbitrîkê** man.  
Li wê der xor tek bi pey me ket,  
Wê şevê me kir mîhvanê xwe.  
Pir delal bû û navê wî Hisêñ bû,  
Xuda wî ji çavan biparêze.  
Ew xort bi mayina me gelek şad bû,  
ku bû sibeh em dîsa ketin rê.  
Rê mezin û intizam bûn,  
lîbelê hinek cih nîvçe bûn.  
Em di wan cih û rîyêñ xweş re diçûn,  
deayêñ me ji bo padîşah bû.  
Dema çavê me bi der û dor diket,  
gund li pey gund xuya dikirin.  
Her teref şen û ava bû,  
edaleta padîşah li her cih xuya bû.  
Di nav deştên pehn û fireh de çem in,  
her gundek weha mezin wek bajar in.  
Dilê me bi vî seyranê pir xweş bû,  
em gihiştin **Meletiyê** şev bû.  
Bajarek pir dilgîr û şîrîn e,  
ji rez û bostan û gulan wek cenetê ye.

Pir in eywan û qesr û rewaq,  
pir in qubeyên wek asîmanê heft qat.  
Ji her teref av diherike,  
bax û bexçe wek cenet in.  
Li wê Şakir Paşa hebû,  
ji ehlê keremê bû û muhterem bû.  
Can û dilê me bi dîtina wî mesrur bû,  
ji hûsn û cemala wî çavêن me xweyî nûr bû.  
Serok Îbrahîm Efendî me bi mîhvanî qebûl kir,  
gelek hogirî nîşan da.  
Ji pêşî ve dostanîya me hebû,  
me dawetê mala xwe kir.  
Heqîqeten heqê wefayê bi cih anî,  
dostanîya temamî bi cih anî.  
Sidq û rastî nîşan da,  
pir izzet û îkram nîşan da.  
Ew şev ku hat wextê seher,  
em rabûn rê bi ezma sefer.  
Em gihiştin **çemê Muradê**,  
ava wî gelek pirr bû û bi tirs bû.  
Em li kelekê siwar bûn,  
bi rehetî derbasê alîyê dî bûn.  
Li wê bi navê **Qadî Koyî** cihek hebû,  
mirovêن wî kurd bûn.  
Li wî gundî alimekî pir binavûrûmet hebû û hecî bû,  
gelek muteber bû û navê wî Hafiz Mihemed bû û ji ehlê  
hâl bû.  
Ew şev em li wê razan,  
û sibehê dîsa ketin rêyan.

Ji nêzbûna Amedê dilê me pir vebû,  
can û beden û ruhê me şad bû.  
Arzûya zû gihîstinê şewqa me zêde kir,  
agirê eşq û mihebeta me zêde kir.  
Wexta gihîstina yarê nêz bibe,  
rehtî û westandin ji dilê aşiq dûr dibe.  
Bihna bayê Amedê ye rehberê me,  
bê eziyet xweş diçû ev rêya me.  
Der û dorê me zevî ne, şînayî ne û çîmen,  
em di nav de diçin pir bi kîf û ken.  
Em gihîstin **Xarpêtê** cihek bi navê **Mezrê** ye,  
em li wê man û dîsa xweş bû cihê me.  
Walî Hecî Hesen Beg,  
bi navê Raîf Efendî kesek şandibû îstiqbala me.  
Ew zat di mehkemê de serkatib bû,  
ji her alî mirovekî zana û meşhûr bû.  
Wî bi mihvandarî em dawetê mala xwe kirin,  
ji bo zîyaretkirinê min pirsa walî jê kir.  
Got: Anûha walî di nav mehkemê de ye,  
wek amîyan di seyra mehkemê de ye.  
Ji bo bibine hukmê edaletê,  
ji ber ku roj rojên sultanê edaletê.  
Ji bo zîyareta wî em çûn mehkemê,  
me dît ku zêde bi qedr û qîmet e.  
Me li wê derê Reîs Wehbî Efendî dît,  
bi îlm û qanûn û zanîn me dît.  
Hem jî Mehmûd Efendî,  
ku hafizê Quranê bû me dît,  
Dostekî berê bû,

digel Şerîf Rûşdî Efendî.  
Ew Şerîf xweyî îlm û emel bû,  
zana û xettatek pir xweş bû.  
Serokê Belediyê hem zatek durist û zana û şîrînziman bû,  
ji bo rîwiyan xizmetkar û mîhrîban bû.  
Salih Beg ku muawînê serok bû,  
bi zanayî me tevan dawet kiribû.  
Mifetîşê marif ku navê wî Rûşdî bû,  
ehlê hikmetê bû, xizmetkarê îlm û îrfanê bû.  
Dostekî min yê berê bi navê Ensarî,  
memûrê kadestro bû, me ew jî li wê dî.  
Me demek bi hev re hevaltî kiribû,  
hem sirr û hem kar û hem fikir bû.  
Ev kes hemû xizmetkarê ehâlî bûn,  
di ferманa wî padîşahê alî de bûn.  
Walî hem hîmmet bilind bû zatê wî,  
tev xuya bû cûmle û îcreatê wî.  
Fikir û rey û îkrama wî qenc bû,  
peyv û fiîlyatê wî qenc bû.  
Ji bo me gelek izzet û îkram nîşan da,  
lûtf û xizmetek zêde nîşan da.  
Em ji îltifat û xizmetên wî,  
ji peyv û sohbet û îkramên wî gelek memnun bûn.  
Me sê şevan li wê îstirehet kir,  
sibehê rêya xwe berdewam kir.  
Digel herdu hevalan Tewfîq û Selîm,  
li hespan siwar bûn bi qelbekî selîm.  
Rêya me gelek qenc û rast bû,  
li serê çeman û pirê bêqisur bûn.

Li her terefî gund û bajar çêbûne,  
zevî û çem û bexçe bûne.

Ava zelal diherikî ji her cihî,  
bihar bû û her der çîmen û şînayî bû.

Jî ba û hewayê xweş,  
wek gonceyê gulan dil dipiškivî.

Em di wan rê û cihêن xweş de,  
bê xem û derd dibihûrîn.

Ew roj her teref ronahî û xweşî bû,  
ji bûkêن biharê her cih tijî bû.

Li kenarê rê deryaçekî avzelal û saf û rûken,  
derûdorêن wê ciyayêن xweş ên bilind û rûşen.

Navê wê **Golcik** bû yanî gola piçûk,  
lêbelê pehn û dirêj bû wekî behrek.

Deşt û sehra teng hatibû ji bo wê,  
dikelî hîdet û xezeb û pêlên wê.

Rê li xwe vekiribû li ser çemê Bexdadê,  
yanî Dîjle ku diherike li bin Amedê.

Eger ev av ji vê deştê vala be,  
dê gelek gund di cihê wê de ava be.

Li kenar avê hebû **Xanê Gêzîn**,  
em ji hespan peya bûn ji bo bêhna xwe bidin.

Sînorê Amedê ji vir dest pê dikir,  
eşq û şewq û kêfa me zêde dikir.

Ew şev em li wê man û istirehet kir,  
me bi şev çay vexwar û bînvedanê kir.

Me ji wê çayê gelek lezet girt,  
kêfxweşî û zewq û gelek izzet girt.

Em bi şev man li wê û xeweke xweş kir,  
sibehê rabûn rê û me dilê xwe geş kir.  
Rojê ku rohnî dida deşt û çîya,  
wek çîyayê Tûr dibûn xerqê zîya.  
Her teref xweş û tijî bû ji bêhna bihar,  
li her teref av diherikî ji çeman û ji cûbaran.  
Di wan rêyan de mirov pirr diçûn,  
ji çûn û hatinê wek rêya Sêwas bûn.  
Ew çem digel me dimeşîn,  
serê çiyayan digehîste asîmanan.  
Di nava çîyan de ev rêya nûyîn,  
çi qenc û xweş bû wek rêya hesin.  
Li ser van çeman û pirên pirr qewî,  
me dîtin gelek mehkûmêne wek kevirêne mermerî.  
Gerçî li hinek ciyan ji ber lehîyan,  
kevirêne mezin ji çiya hatibûn xwarê.  
Di wê rê de hem heywan û hem erebe,  
bi rehetî karibûn derbas bin.  
Dema Maden xuya kir,  
me dîtina wî ji dil arzû kir.  
Me berê xwe da nava **Madenê**,  
ji bo em saetek îstirehet bikin.  
Min li wê derê kesek hêja û bi hezkirin dît,  
ji Palo bû û xweşziman bû.  
Navê wî Mihemed bû û exlaqê wî xweş bû,  
xeber da serokê belediye.  
Paşê Hecî Mihemed hat,  
û ji bo me derê meclîsê vekir.

Tam di wê demê de serokê belediyê hat,  
gelek xweşî û îltifat nîşan da.

Alîkarê serok jî hat,  
navê wî Tewfiq bû û xweşxeber bû.

Katib û azayên meclîsê jî hatin,  
hêja bûn û xweşsohbet bûn.

Piştî ku me hinek îstirehet kir,  
ji Madenê ve hîna me berê xwe da **Erxenîyê**.

Dîsa dixwazim behsa Şahê Cîhan bikim,  
medh û senayê zatê fexrê zeman bikim.

Ew xelîfe ye û Emîrûlmûmînîn e,  
xweyîyê emr e û pêşewayê musilmana ye.

Navê wî Xan Abdulhemîd e û leqaba wî Xazî ye,  
neseba wî sultanê Osmanî ye.

Rêya wî ya mezin rêya edaletê ye,  
Xuda wî li ser her kesî şahînşah kirîye.

Ewsafê wî zatê mezin dawî lê nayê,  
em tekrar bizivirin bi ser rêya xwe.

Li Erxenî em bûn mîhvanê Sidqî Paşa,  
gelek heskirin û gelek qencî nîşan da.

Xanîyê wî bilind û xweş bû,  
zatê wî mitewazî û pirr wefa bû.

Ew şev em di mala wî de razan,  
pir xweş û latîf bû digel herkesan.

Di wexta limêjê ku em şiyar bûn,  
ji bo rêya xwe bi lez û kar bûn.

Rêya me di nav deştek mezin bû,  
gul û çîmen û zevî û şînayî pirr bû.


Li rast û çepê rê, zevî pir hêşîn bûn,  
her teref rengareng gul û hêşînayî bû.  
Li her cih û her derê zewq û sefakî hebû,  
di her rû û her dilî de tam aşîyek hebû.  
Dema em gîhîstîn ber **Dewe Gêçidîyê**,  
qulubeyek nû min li wê dît.  
Di hundirê wê de zabitek hebû navê wî Elî,  
çawîşê zabit û rebta li ber wî derî.  
Ji bo me gelek îkram û xizmet kir,  
ew şev me li wê derê xew û îstirehet kir.  
Paşê min rêya xwe dewam kir,  
ew rêya xweş û mezin jî derbas kir.  
Roja duşenbe dozdeyê meha Recebê,  
pazdeh ji meha Nîsanê bê zehmet û eziyet.  
Gihîstîm Dîyarbekir bi kêf û xweşî,  
ev nezma me jî gihîste paşî.  
Walîyê Amedê Semîh Paşa bû,  
muşîrê esker bû, mirovekî hêja bû.  
Bi şecaeta xwe nav dabû Dinyayê,  
bi şûr û qelem bû, îftixara gişan.  
Bi şûrê zorê dijmin re mirin bû,  
qelema wî ji milk û dewletê re heyat bû.  
Ji ber vê yekê vî zatê pak,  
dijminê dîn û dewletê kî bûn, dida wan helak.  
Her daîma vî asefê dewran,  
ji bo dostêن milk û millet dibû emn û eman.  
Alîkarîya Xuda ku bûye hevalê min,  
vî cihê pîroz bûye warê min.

Nacîm di nîmetê Xuda de xerq bû,  
şukrê van nîmetan li ser min heq bû.  
Min alîkarî xwest ji Xuda û Pêxember,  
di destpêka xizmeta min li Diyarbekir.  
Hêvîya min tewfiqa Xuda ye,  
îmdada min Resûlê Kibriya ye.  
Xizmetê min bigehîne qebûlê,  
li ber Xuda û wî Padîşahî.  
Menzûmeya min li vir bû temam,  
navê wî “Rahname”ya rîwîyan.  
Ji bo Sedirezam dibe hedîyeyek,  
ku zatek hêja ye xweyî qîmet e.  
Seîd Paşa ye bizane navê wî,  
gihîst milk û millet seadet ji wî.  
Eger meqbûl bibe li ber sedrê xweyî kar,  
ev “Rahname” beşê min e ji bo iftîxar.  
Nacîm eger çi be nam û nîşan,  
lûtfa sedr ji bo wî bilindî û şan e.  
Eger li ser herîya min bike yek nezer,  
ji tesîra wî tev dibe zîv û zêr.  
EZ çi bêjim ewsafê wî Sedrê Ezam e,  
ewsafê wî wek zatê wî hemû muhterem.  
Ji kitaba hezretê Melayê Rûmî,  
yanî Mewlana Celaleddînê Rûmî.  
Ev gotina wî her dem di bîra min e,  
“ku roj şahidê hebûna rojê ye”.  
Seadet û xweşî her wext hevalê wî be,  
wek hîva çardeyî sedrê şahînşah be.

Wekîlê fexra zeman, sîya Xuda û Mecîd,  
yanî xaqanê mezin Sultan Abdulhemîd.  
Xudayê teala daîm bike heybeta wî,  
Xuda alîkar be û bilind bike selteneta wî.  
Gihîste dawî û qedîya gotin û kelam,  
li ser ruhê paqîjê “Ehmed” selat û selam.

12 Receb 1302 (27ê Nîsana 1885)  
15 Nîsana 1301 (27ê Nîsana 1885)<sup>96</sup>  
(Wergera ji farisi: **Ahmet Yalar**)

## 1. 7. Türkçe Mantık Hulasası [Xulaseya Mantiqê Bi Tirkî]



<sup>96</sup> Mudde-i Umumi serveri Abdurrahman Nacim, destnivîsa *Rahnameyî Di-yarbekir*, 27ê Nîsana 1885

Ev berhema wî jî wek rîsaleyeye ji bo dersê hatîye amadekirin, li ser hev 16 rûpel e û sala 1306ê li Stenbolê di çapxaneya Mahmud Beg de hatîye çapkiran. Li ser bergê pirtûkê hatîye nivîsandin ku: “Muellîfê wê: Abdurehman Nacîmê reîsê Mahkemeya Îstînaf a Diyarbekir e. Ev pirtûk bi destûra nivîskarê wê û rusxeta Wezareta Marîf a bilind ji alîyê Şêx Ehmed Şukrî yê xwedîyê Kutibxaneya Gayret ve hatîye çapkiran û belavkirin.”<sup>97</sup> Di dawîya pirtûkê de dîyar e ku wek tarîxa xilaskirina nivîsandina wê, 11 Muharrema 1304 hatîye lêkirin û nivîskar dibêje: “Xwedê wî bajarî (Diyarbekirê) ji afet, hîle û belayan biparêze.” Metna tirkî ya vê rîsaleyê, di besê sêyemîn ê vê xebatê de bi temamî hatîye wergerandin û weşandin.

### **1. 8. Hedîyetû'l-Umem we Yenbuû'l Adab we 'l-Hîkem**

Ev pirtûk, yekemîn berhema wî ye ku li dervayê Stenbolê hatîye çapkiran. Pirtûk, sala 1308ê li Beyrûdê çap bûye û 584 rûpel e. Di naveroka pirtûkê de li ser mewzuyê wekî “îlim, aqil, edeb, hîkmet, belagat, fesahat, xett, kîtabet, şîîr, medh û heca” hatîye rawestandin. Piranîya pirtûkê ji nivîsên müelîfîn areban û birrê mayî ji nivîsên wî yên di şîklê nezm û nesrê de pêk hatîye.<sup>98</sup> A. Nacîm di nîvîsa xwe ya bi navê “Arap edebîyatî ve İslâm sîyasetî [Edebîyata ereban û sîyaseta İslâmî]” de, li ser vê pirtûka xwe dibêje: “Ev pirtûka min ji heşt cildan pêk hatîye û di cilda wê ya heştan de bi xulase li ser “Seltenet û Xîlafet”ê hatîye rawestandin. Ji bo menfeet û faydeya wê ya giştî, vî besê wê teqdîmê rojnameya *Tercümanê Heqîqet* a bijarte dikim ku bête weşandin û belavkirin. Ez wehd dikim ku ji iro şûn ve, çiqas keys bibînin û wexta min çêbe ez dê nivîsên wesa kîrhatî pêşkêşê we bikim.”<sup>99</sup>

<sup>97</sup> Abdurrahman Nacîm, *Türkçe Mantık Hulasası*, Matbaaya Mahmut Bey, Stenbol, 1306, r. 1

<sup>98</sup> Ali Birinci, *Tarih Gölgesinde Meşahir-i Meçhûleden Birkaç Zat*, Weşanê Dergah, Stenbol, 2001, r. 289

<sup>99</sup> Abdurrahman Nacîm, *Tercüman-ı Hakikat*, no: 967, 10 Eylül 1881

## 1.9. *Gulzarî Asar*

Ev pirtûka nivîskar jî li dervayê Stenbolê, sala 1309ê (Nisan 1892) li Beyrûdê hatîye çapkîrin û li ser hev ji 272 rûpelan pêk tê. Di naveroka pirtûkê de gelek şîfrên nivîskarêne areb, faris û osmanî hene û pirtûk jî bi sê zimanan hatîye nivîsandin. Di dawîya pirtûkê de jî seyhatnameya wî ya bi navê *Rahname-yî Diyarbekir* wek pêvek hatîye danîn.

Li ser bergê pêşî yê pirtûkê weha hatîye nivîsandin: “Nivîskar û berhevkar: Abdurrahman Nacîm ê Mudde-î Umum ê Wîlayeta Beyrûdê. Bi ruxsata Wezareta Giştî ya Perwerdeyê, Hiqûqa çapkîrinê aîdê nivîskar e. Di Çapxaneya Edebiye ya Beyrudê de hatîye çapkîrin. Sal: 1309 (1892)”<sup>100</sup> Di rûpelê pêşî yê pirtûkê de destnivîseke A. Nacîm heye û ji wê dîyar dibe ku ev pirtûk jî bo Sevgî Beg hatîye dîyarîkirin. “Ev mecmuaya “*Gulzarî Asar, Tahmîsi gazel Hazretî Mevlana* û *Rahnameyî Diyarbekir* ji mîvanê berêz ê komandanê cendirme yê Beyrûdê Mîralay Sevgî Beg Efendî re hatîye dîyarîkirin. (1309/1892)

Nivîskar û berhevkar:

Serwerê Mudde-î Umumî


**Abdurrahman Nacim**

Herwekî ku min di rêzikên pêşîyê de jî gotibû: pirtûka *Gulzarî Asar*, bi sê zimanan; erebî, farisî û osmanî hatîye nivîsandin.

A. Nacîm di nivîsa destpêkê de pişti ku hêvî, silav û selatêن bêhejmar pêşkêşê Serwerê Kaînatê dike, efû û bexişandinê ji Xudayê mezin dixwaze û dibêje: “Bi navê Xudayê mezin û dilovan; hemd ji Xudayê mezin ê ku zimanê şairan wek mifteya sirrên hîkmetê û dilê edîban jî bi nûra marîfet û îlmê ronî dike û wekî di beyana mucîze ya hedîsa şerîf de hatîye gotin:

<sup>100</sup> Abdurrahman Nacîm, *Gulzarî Asar*, Çapxaneya Edebiyeya Beyrudê, 1309, r. 1

“înne mînêş’şî’rî le hikmeten” [Bêguman di hinek şîran de hîkmet hene]. Bi vê gotina Serwerê Kaînatê (Hz. Pêxember), payeya şîran bilind bûye. Nivîskar bi vî awayî pişfî meram û sewkî kelam dike û dibêje: Bi tevî ku di şîrên taîfeyê turk û ecem û qewmê ereb de xeylî hîkmet û mezîyet hene, lêbelê ji ber ku wekî mûrîyêñ manzûmeyêñ wan rîyyayî, ji hev ketine û li erdê bi awayekî perakende belav bûne, rêya sôdwergirtina wan xetimîye. Ev berhemên hanê, li nik xelkê xwedî raxbet û xweşikîyê ne. Ji bo ku ev helbestên bijarte bêne parastin, min ew di meceleyekê de wek guldesteyek berhev kirin û navê *Gulzarî Asar* li wan kir û teqdîmê dîtin û şiroveyêñ edîban kir. Hêvî dikim Xudayê gewre ji bo berhevkirina edeb û hîkmetan rêya rast û qencîyê bexşê me bike.”<sup>101</sup>



<sup>101</sup> Abdurrahman Nacîm, *Gulzarî Asar*, Çapxaneya Edebiye ya Beyrudê, 1309, r. 2

## 2. Dawî

Dawîyê em dikarin bi kurtayî bêjin ku Abdurehman Nacîm, yek ji danerê sîstema kutibxaneyên Stenbolê bû, memba-ya îlim û zanînê, xwedîyê kultureke dewlemend û berfireh bû. Ew bi nasnameya xwe ya nivîskarî, perwerdekarî, huquqzanî, edîbî û şairî tête nasîn û herweha nivîskarekî pirrziman bû; ku wî bi zimanê erebî, farisi, turkî nivîsiye. Herweha “Ew muqtedîrê zimanê kurd bû” û li hinek ciyan rêzikên kurd jî di nav nivîsên xwe de dariştine. Lîbelê heta vê gavê berhemeyeke wî ya xwerû kurdî bi dest me neketîye. Di mudetê jîyaneye kurt de, gelek pirtûk û li ser babetên cûr bi cûr meqaleyên balkêş dîyarîyê me kirine. Ew, bavê rojnamevan û sîyasetmedarê navdar, xwedîyê rojnameya *Serbestî Mewlanzade Rifat e.*

Wî, hem di seha îlmîye û hem jî di seha mulkiyeyê de kar kirîye. Pişti ku A. Nacîm, derbasî mulkiyeyê dibe, bajarêñ wekî Diyarbekir û Xarpêt jî di nav de, bi wezîfeyê fermî li gelek deveran xebitiye. Sala 1888ê, bi egara ku rîyatî hukmê qanunan nekirîye û li hemberî mesûlên xwe bêîtatî kirîye, demekê ji memûriyetîya dewletê tête dûrxistin. Di encama tehqîqatê de, sala 1890î, dîsa di heman mewqîyê de vedigere ser karê xwe.

Xasleten bi nivîsên xwe yên li ser edebîyatê, ronahîyeke girîng daye dîroka edebîyatê. Hezar mixabin ku ew kanîya zanînê zû çikiya, ew, “23yê Hezîrana 1895ê, di 62 saliya xwe de li bajarê Elezîzê çûye ser dilovanîya xwe.”

Min gelek hewl da ku ciyê gorê wî bizanim, mixabin bi ser neketim. Ev xebata ber destê we, 122 sal pişti mirina wî hatîye amadekirin. Bi derengî be jî, yadkirin û bîranîna seksiyetên wekî A. Nacîm, ji alîkî ve tê wateya tazekirina bîra me ya civakî û neteweyî. Bi hindikayî be jî, ger xebata ber destê we ji pêkhatîna mexsedê re xizmeteke piçûk kiribe, gihişîye armanca xwe.

# Beşa Sêyem

## 1. Hinek nivîs û helbestên Abdurehman Nacîm û Keyfî di nav rûpelên *Tercûmanê Heqîqet* de

Ji xeynî pirtûk û pirtûkçeyên çapkirî yên A. Nacîm, tenê nivîsên wî yên di şiklê meqale, xazel û nazîre yên nav rojnameya *Tercûmanî Heqîqet* de hatine tesbîtkirin. Eger bi balkêşî li ser rojname û kovarêne wê demê lêgerînên berfireh bêne kirin, mimkun e di hinek weşanên din de jî nivîsên wî derkevin meydanê. Entellektuel û zanyarekî demê; nivîskarekî pirziman, pispor û dilxwazê pirtûk û pirtûkxaneyan, yek ji “edîbê esrê”, hiqûqzan, perwerdekar û şairê wekî Abdurehman Nacîm bi îftimaleke mezin berhemên zêdetir ji bo me hiştine. Ku hebin, lêgerîn û lêkolîna xebatên veşartî û mayî, bar û berpirsyarîyeke li ser pişta kesên dilxwaz e.

Zanîna me ya li ser Keyfî û xebatên wî yên nivîskarîyê jî gelek kêm e. Di vê xebatê de, tenê nivîsên wî yên di nav rûpelên rojnameya *Tercûmanî Heqîqet* de hatine berhevkirin. Bawer dikim lêkolînên li ser weşanên wê demê bêne berfireh-kirin û şopa şairên wesa bêne gerandin, dê gelek agahdarîyênen nû derkevin meydanê.

Di nav rûpelên rojnameya *Tercûmanî Heqîqet* de ji xeynî nivîsên A. Nacîm û Keyfî, hinek nivîsin din jî li ser kurd û Kurdistanê hatine belavkirin. Bi taybetî jî di naveroka nivîsên ku ji alîyê nivîskarê bi kurteya “A. T.” ve hatine nivîsîn; li ser

têkilîyên kurd û ermenan, biryarêن Îslehetê û di heqê propagandaya ermenan de ku di çapemenîya dewletên Awrupa û wd. de li ser kurdan dihate kirin, rawestiyaye. Hesen Zûhdî jî, bi nivîseke balkêş piştgirîya meqaleyên Keyfî û A. Nacîm dike ku ji bo rexnekirina konsolosê Brîtanyayê hatine nivîsandin. Di hinek nivîsan de jî, behsa tevgera 1880an û rengê wê yê sîyasî û têkilîyên bi Îranê re hatîye kirin. Digel vana, hinek nivîsên bêîmze jî hene ku mijara wan jî li ser rewşa wê demê ya Kurd û Kurdistanê ye.

### 1. 1. Kurdistan ve *İstanbul gazetesi*<sup>102</sup>

Geçen günler *Vakit* gazetesi *İstanbul* gazetesinin mütercimlerinden şikayet ediyordu, hakkı varmış. Biz ise yazarlarından dahi şikayet edeceğiz. Zira bahiste o kadar büyükçe tavırlar alıyorlar ki mukabillerinde bulunanları zimnen ve serahaten hafife alma ve hakaret derecesine varmayı adeta başarı sayarlar. Zannederiz ki okurlar arasında bu yoldaki sözleri beğenmeyenler beğenenlerden çok olur.

Geçen gün *İstanbul* gazetesi Abidin Bey'in Kurdistan ıslahatını yetersiz görerek Kurd beylerinin yalnız sürgün ile yetinilmemesini ve kanunen lazım gelen cezalara çarptırılmasını beyan eylediği sırada, biz bu ıslahat hususunda itidalin lüzümunu izah etmişik. Bu izahatımıza dahi cevap veriyor.

Tuhaftır ki biz bir kavmin nüfus miktarı az olmakla mazlum olması lazım gelmeyeceğini söylemişken, refikimiz "Ermenilerin nüfusça azlığı mazlumiyetini gerektirecek bir hak mıdır?" diye yine bizim sözümüzü bize hitap ederek "dolayısıyla bunu *Tercüman-i Hakikat* dahi tasdik etmek istiyor" diye garip bir hükümde bulunuyor.

Hep şu yolda olarak mütalaası mevzu bahis olan meseleye bir ciddi fayda sağlamayacak bir takım lâkırdıdan sonra refikimiz; asıl özel fikirleri olmak üzere bizim tavsiye ettiğimiz

<sup>102</sup> *Tercüman-i Hakikat*, no: 393, s. 2, 22 Şevval 1296-H/8 Teşrini Evvel 1879

itidali doğru görmeyip bu Kurd yağmacıları hakkında Bab-ı Âlî merhamet ve yumuşak davranışmayı her hududun en ucuna kadar vardırdığı, yani pek ileriye vardıgı için Kürdlerin Ermeniler hakkındaki mezalimine çare bulunmadığını açıklamak istiyor.

Eğer *İstanbul* gazetesi Kurdistan'ı ve Bab-ı Âlî'nin Kurdistan hakkındaki muamelatını iyi biliyor ise şu fikirde ısrar etmemesi ve âcizane mülahazamızı tasdik etmesi lazım gelir.

Bab-ı Âlî'nin Kürdler hakkında merhamet ve şefkatı aşırılık derecesine vardırdığını biz biliyoruz. Bilakis o taraflar hakkında daima şiddet muamelesinde bulunulduğunu ve Kürdlerin hala silahlı bir kavim olarak varlığıyla eşkiyalıkta devamlarına dahi bu şiddet muamelesi ile sebebiyet gösterildiğini itikat etmek istiyoruz.

Bedirhan Bey meselesinde İsmail Paşa ıslahatına gelinceye kadar Kurdistan'da asker ile aşiretler arasında savaş eksilmemiş gibi bir şeydir. Para tahsili için bile ordu sevk ediliyor du. Bu sebebe binaendir ki Kürdler devlete karşı koymak için elli nde bulundurdukları silahla içinde bulundukları koşullar hasebiyle her zaman lüzum görerek yalnız Ermenileri değil, sair itaat eden Müslüman ahaliyi de vurmağa kadar kullanmakta idiler.

Biz Bab-ı Âlî'nin merhamet ve şefkat gösternesine de lüzum görmeyiz. Merhamet ve şefkat hiçbir zamanda siyasetle iştirak kabul edemez. Zulüm ne kadar fena ise, siyasette merhamet ve şefkat dahi hemen onun kadar fena bir şeydir.

Biz önceki bendimizde "itidal" tavsiye etmiştık. Fransızcası "indolzanis" olan şeyi değil, "modorasyon" olan şeyi tavsiye eyledik.

Bizim görüşümüz kabul olunursa biz Kurdistan'ın şu yol da ıslah etmek görüşünü sunarız:

Şiddette en ileriye giden eşkıya reislerini Abidin Bey'in sürgüne göndermesi, itidal üzere bir ceza ve haklarında bir ıslah demektir. Onları defyledikten sonra, diğer reisleri

toplamlı, bugün âlemin ahvali umumiyesini onlara çocuk okutur gibi anlatmalı, zira onlar yarı vahşi adamlardır. Hem-şerileriyle rahatsız yaşamaları, Rumeli tarafında ne kadar facialara neden olduğunu tamamıyla anlatılmalıdır. Hatta köy yakıp yağmalamakta bulunduklarından dolayı şimdi sürgün edilen adamların kanunen idamları lazım gelirken cehalet hallerine mebni son defa olarak bu ıslah ile yetinildiğini ve bundan sonra ise işte kanun hükümlerini yüz yüze ve şifahen söyletip iştikkleri cihetle haydutluğun cezası idam olacağını tamamıyla anlatmalıdır. Hatta Kurd kavmine mensup olan ulema veya hut talebeden kişileri memur ederek yapılan zulümlerin Allah'ın rızasının olmadığını ve bu konudaki dini ve şer'i ahkâmin vaaz suretiyle de tebliğ etmelidir. Ondan sonra jandarma durumunu muntazam olarak tesis ederek eşkiyalıkta bulunan olursa derhal cezai icraya sürat göstermelidir.

Yoksa *İstanbul* gazetesinin lüzum gösterdiği cihetle, şimdiye kadar hıyanette bulunanları şu an ceza vermeye kalkışmak ve bu konuda căretli ve şiddetli tavır almak, Kurdistan ve Ermenistan “ıslahatı” değil, adeta bir Kurdistan ve Ermenistan “mukatelesi” [savaş] derecesine varacağını onları iyice bilenlerin hiç birsi inkâr edemez. Bu ise Kürdler için de Ermeniler için de bilahare devlet için gayet zararlı bir şey olur.

O yerleri harita üzerinde temaşa etmemelidir efendim. Zahmet buyurup da oralara bir de seyahat etmelidir. Kürdler hala “Tanzimat-ı Cedide”den bile haberdar değildir. Nerede kaldı ki çağdaş adaletten haberleri olsun. Şimdiye kadar bunların ıslahatına yalnız silahla gayret olunup asıl “ıslah” lafzından anlaşılıabilen surette müracaat olunmamıştır. Dolayısıyla mızrağımla cihani sarsarım zannında bulunan böyle yarı vahşilerin iki yüz eli bin, üç yüz bin tanesi hakkında şiddetli muamelede bulunmak biraz güç olacağını, kendilerini görerek mülahaza etmelidir de işin kolayı varken zor olana gitmemelidir.

**İMZASIZ**

## 1. 2. Varaka: Kurdistan<sup>103</sup>

Kurd faziletperverlilerinden olup varlığıyla iftihar ettiğimiz bir zat tarafından aldığımız mektubun aynısıdır:

“Mal ve canlarını temin etmek üzere dar ve diyarlarını terk ederek Yüce Sultan’ın adalet ve himayesine sığınmış ve Osmanlılar sayesinde adamlar sırasına girmiş olan İstanbul Ermenilerinden bazlarının bir mümtaz mevki tutabilmek için Kurdistan’daki Ermeni komşularımızı alet etmekle tartıştı ve teraziye gelmeyen bir takım yalan iftiralarıyla göstermeyecekti. Oldukları aşırı milli duyguların esiri olduğu ve bu ise hassasiyetlerine iftihar numunesi addedildiği cihetle buraları kendilerince tebrik olunacak meziyetlerden sayılırsa da, fakat Bulgaristan faciaları akabında Ermenistan nامıyla Kurdistan’da ıslahat laflarının iştilmesi ve bu fikirlerini desteklemek için bazı Avrupa gazeteleri ile karşı gazeteleri, Ermenilerin taşın yalanlarına kapılarak Kürdler aleyhine köرük körüğe kalemlerini denemek gibi cahillik alçaklığını irtikâb edilmesi [kötü bir iş yapma], türkütebilecek kötü tesadüflerden bulunduğu cihetle bizce fevkalade teessüf yeridir.

Muharrir Efendi!

Karşı gazetelerin bu günlerde tarafımızdan gösterilen müdafaya mukavemet göstermeyerek işi mizaha dökmüş, bahis ve münazara meydanından kaçarak meseleyi anlaşılmaz duruma boğmuş oldukları halde bununla da yetinmeyerek insanlığı âleminde işitilmeyecek vadide sözü uzattıklarını, medeniyet namına binlerce arzı teessüf etsem yine vicdanımda peyda olan üzüntüyü hakkıyla yenemem.

Bununla birlikte biz yine edep dairesinden çıkmayarak hukukumuzu söyle, halle ve kalemlle müdafaya her an ve dakikada hazırlız. Ermeni tarafgırlığı tasarlayan gazetelerin bu konuda söylemeyecekti. Oldukları delillerin başlıcası; Ermenilerin

<sup>103</sup> A. T., *Tercüman-i Hakikat*, no: 594, s. 2-3, 26 Cemaziyyelahir 1297-H/ 5 Haziran 1880

haddi zatında eğitime liyakatları varken Kürdlerin buna mani olduğu sorunudur. Gerçekten Avrupa gazeteleri tarafından Ermenilerin talepleri zımnında pek çok siyasi incelikler mevcut olup birincisi Bab-ı Âlî'nin üzerine müdahale kapılarını açmaktan ibaret olduğu cihetle Ermenileri bu taleplere sade bir gönülle sevinmelerine, hallerini görmemiş olsaydım fevkalade garipsemiş olurdum.

Hülasa Kürdleri isti'dâd [kabiliyet, anlayışlılık] ve liyakat dairesi haricine çıkarmak ve Ermenileri yalın cevher unvanıyla somutlaştmak gibi âlemde gülünç bir şey olduğunu Van Ermenilerine bile sorulsa tereddüsüz tasdik edeceklerinde şüphe yok iken Ermeni matbuatiyla bunlara peyrev olan [izinde giden] karşı gazeteleri bu deli vadiye bile bile mi düşüyorlar yoksa akılları mı ermiyor?

Acaba Ermenilerin ilerlemesine bizim Kürdlerin engellemesi ne gibi bir şeydir? Kurdistan'da Ermeniler okul yaptılar da Kürdler mi engel oldular? Veyahut başka bir suretle sanayi ve maarifin ilerlemesine çalıştılar da Kürdler mi engel oldular? Eğer bizim bildiğimiz Ermeniler, bin iki yüz seneden beri bizimle komşuluk eden Ermeniler ise, zerre kadar bu fikirlerde bulunmadıkтан başka, komşuluk hukukuna hakkımızda riayeti dahi özel saygı ve hürmeti esirgemez.

Fakat ne yazık ki Kurdistan'la hiç alakası olmayan bazı Ermenilerin Kürdlere mutlaka vahşi mezalimi isnat ile biçare Ermenileri mazlum göstermek ve Kürdlerin ahvaline vakıf olanlarca malum işlerden olduğu gibi, Ermenilerin ilerlemeyi isteme arzuları bizlerden ne derecelerde aşağı olduğu, Ermenilerin ahvalini bilenlerce dahi gizli degildir.

Bu cümle ile beraber Ermenilerin ilerlemeye istidadını itiraf edipde Kürdleri ilerleme arzusundan mahrum tutmak ne kadar haksızlık olduğu Kürdler ve Kurdistan'ın ahvaline vakıf olanlarca malum işlerden olduğu gibi, Ermenilerin ilerlemeyi isteme arzuları bizlerden ne derecelerde aşağı olduğu, Ermenilerin ahvalini bilenlerce dahi gizli degildir.

Haymenişin olan [çadırda yaşayan] Kurd aşiretleri idaresinde bile fen ve maarifin kadri ve kıymeti meçhul olma-yıp hayvanlarını otlatmak için daim surette seyyar oldukları halde, yine her obanın maiyetinde ücretli bir hoca ve bir de mektep çadırı vardır ki her nereye konsalar, derhal çadırlarla beraber mektep çadırı kuruluyor ve çocukların o çadırda toplanıp her biri kabiliyetine göre hocasından ders alır. Bunu açıklamaktan murat o yolda olan tahsilin önemini büyütmeyeip belki bir milletin ilerleme arzusunu somutlaştırmak için göze çarpacak bir misalın göstergesidir ki, ehemmiyeti hasebiyle buna bizden başka hiçbir milletin muvaffak olmadığını ifti-harla söyleyebiliriz.

İşte Kürdlerin en cahilinde böyle bir ilerleme hissi mevcut olduğu ve Ermeniler ise bu konuda adeta cansızlar nev'inden bulunduğu halde, kendilerinde ne meziyet tahayyül ediyorlar ki kendi namlarına olarak teşkilat ve ıslahat icrası için Kürdlerin mezaliminden bahisle Avrupa'ya velvele veriyorlar. İlk başta dilleri yok ki konuşma vasıtası olsun.

Bir Ermeni, eğitim alabilmek için mutlaka başka bir dili öğrenmeye ihtiyaç duyar, hâlbuki küçüklüğünden beri Osmanlı Türkleri ile beraber iç içe oldukları ve son nefeslerine kadar devletin divan ve kalemlerinde ömürlerini tükettiler halde, yine gerek takririni ifadelerinde ve gerek yazı işlerinde Ermenilik kokusunu kokladıklarını ve bu ise Ermenilerce yabancı bir dilin tahsilinde olan zorluğun derecesini göstermektedir.

Bizim dilimiz ise, fevkalade mükemmeliyeti ile beraber herhangi bir dili murat etsek kendi dilimiz gibi kolaylıkla öğrenebiliriz. Zira Arapçayı Araplar gibi, Farsçayı Şirazlılar gibi, Türkçeyi İstanbululluların konuşma şivesi üzere yazmak gücü bizde mevcut olup ibare düzgünlüğünde Kürtlük kokusu varsa o da tabiatın sağlamlığı, fikir güzelliği, konuşma kabiliyeti ve görüşlerin isabet ve doğruluğundan ibarettir.

Kendi dilimizin mükemmeliyetine delil ise, her bir kitaşı

“Homeros”, “Lamartin” ve “Wolter”in eserleriyle tartılacak divanlar dolusu edebi eserler ve seçkin şirlerimizin varlığıdır ki, gerektirirse numune olarak çağdaşlarımızın bazı eserlerini tercüme ve takdim edebilirim ve bundan başka Arap Irakı, Halep ve Şam diyarının ekser yerlerinde Kürtçe, fen dili de-recesini bularak Arap olsun Türk olsun Kürtçeyi bilmekten sonra âlim olamaz, yüksek felsefede bir de öyle mükemmel adamlar bulunur ki “Wolter”ler mezarlardan kalksalar onlar ile ilahiyat felsefesi konusunda acizlik ve teslim olmaktan başka çare bulamazlar. Koyunlarını güderek hayalci şirlerini belagat kumaşıyla süsleyen çobanlarımızın fikirleri bile o kadar naziktir ki Ermeni “oraturları” onların derecelerine varmak meziyetine haiz olabilseler, kendilerince bundan büyük medarı iftihar olamaz.

İşte hazır duruma göre bizimle Ermenilerin nispeti!

Bir kere geçmiş asırlara bakacak olursak ilk önce yeni bir şekilde Avrupa’ya medeniyet arzedenler arasında yine Kürtleri görüyoruz. Beyoğlu’nda çıkan gazetelerin yazarları bu fikramızı görecek olsalar şüphe yok ki kahkahaları koparcaklılardır. Çünkü cehalet belası veya hukuk bir garazla hukuki görmekten tümüyle uzak kalmış oldukları hasebiyle, Avrupa’ya medeniyet arzettmekle Kürtler arasında tabii bir münasebet alıramaz.

Fakat Mr. Sidello’nun 1854 miladi senesinde Paris’té basılan Arap tarihinin lütfen 221. sahifesine müracaat küllefetine buyurulduğu takdirde, bizim bu konudaki doğru davamız göz önüne gelecektir.

Evet; tam bir asır içinde Avrupa kırvazatlarına yine keskin kılıç yiğitliğiyle mukabele eden Eyyubi emirlerinin Selahaddinleri ve Seyfüddinleri Avrupa’yı medeniyet yoluna sevkettmekle bugünkü günde şahit olunan Avrupa’nın dünya saadetinin Kürtler sayesinde olduğu hususu Fransız tarihçilerinin imzası ve dilleriyle itirafта bulunmalarıyla doğrulanmıştır. Hatta İngiltere Başbakanı Mr. “Gladiston” hazretleri,

bu birkaç sene zarfında Şark'ın durumuna dair irâd [verdiği] eylediği nutukların pek çoğunda Selahaddinleri medarı kelam [söz konusu] ederek Kürdlerin medeniyet âlemine ettiğleri hizmetleri anarak bu necip milleti kemali tazimle, methetmeyi ihmal etmediğini belirtiyordu.

Kürdlerin fen ve edebiyata olan hizmetleri de bilinen işlerden olup eserleri kemali itina ile Avrupa encümen danışları tarafından tercüme olunan Ebu'l Fida'larımız, Ebu'l Vefa'larımız olduğu gibi ilim ve faziletleri sayesinde Osmanlı yüce hilafetinin büyük mevkilerinde yer edinen Ebu'l Suud'larımız, mesela Gûranilerimiz vardır.

Acaba antoloji noktayı nazarından bakıldığı halde gerek siyaset ve gerek edebiyat âleminde medeniyetin ilerlemesi için hizmette bulunmuş ve Avrupa'nın eski veya yeni tarih sayfalarında o namla yadolunmuş bir Ermeni gösterilebilir mi?

Bununla birlikte Mr. "Gladiston"un siyasi toplantı salonlarında hizmetlerini takdir etmiş olduğu bir milletin sülalesini, Ermenilere feda etmeyeceği ve Kurdistan İslahatınca yine Kürdlerin ıslah hali noktası nazarından vazgeçemeyeceği ümitleri hatıra getirilse de, şayet bunun aksine göre hareket edilip işi imkân dairesi haricine çıkaracak olurlarsa o vakit dünya ve ahirette bunun mesuliyetini, müsebbiplerini [sebep olanların] üzerine atarak namusumuzla ölmeyi, yaşamağa tercih ederiz."

A. T.

### **1. 3. Varaka: Kurdistan<sup>104</sup>**

Muharir efendi;

*Havadis* gazetesinin 4328 nolu nüshasında “Kürdler” unvanıyla yazılmış bir makalenin karşı gazeteleri tarafından tasvip ve takdir olunduğu nazarı teessüfümüze uğradı. Bu konuda esef beyan edişim; *Havadis*’ın Kürdler aleyhine kalem idaresinden olmayıp belki öteden beri Osmanlı menfaatleri aleyhine en şerefli sayfalarını açık tutmakta bulunan gazetelerin övgüye layık olacak surette bir makalenin neşrine, Osmanlı âleminde saç sakal ağartmış bir gazetenin teşebbüsü, arzularımızın tümüylen hilafında bulunduğu ve vicdanımızla dahi buraları temin edildiği halde bize karşı vicdanımızı mahcup ve mesul bırakmasından ne kadar teessüf edilse azdır.

Gazete yazarı iyi bilsin ki eğer o makalede zerre kadar Osmanlı menfaatleri muhafazakârlığı bulunmuş olsaydı, Fardu Bosfur ve Kurye Duryan tarafından alkışlanmazdı. Kurye Durya’nın ifade şivesiyle, adıgeçen makalenin içeriği yan yana konulup biraz derinlemesine bakılırsa şüphe yoktur ki ikisi de bir destegahın kumaşı olduğuna hükmün olunabilir. Çünkü ilk başta gazete, ne bizim ve ne de Ermeniler tarafından hükmün alınmamışken kendisine hükmün sözünü vermekte, Rus entrikası hükümiyatından başka ne mana verilebilir.

Hem de Kürdleri kuyruklu ve killi diye tahkir etmekte ne safra bulunur ki, insan yaratılışının üstünde öyle doğa dışı şeylelerle sayfaları karalıyor. Gazetenin islahat için gösterdiği çareler ki Rusya ve İran’ın yardımından ibarettir. Eğer ki buna teşebbüs olunursa hem Kürdler ve hem de Ermeniler namını dünya haritasından mahf ve yok ettikten sonra, Ermenilerin Ermenistan diye tanımladıkları bölgeyi de Rusya’ya kaptırılmış olacaklarını tekrar söyleyebilirim.

İşte *Havadis* gazetesinin girdiği yol, fitne ateşinin neticesi bundan ibaret olup bu dakikalar nazarı dikkate almaması dahi

<sup>104</sup> A. T., *Tercuman-i Hakikat*, no: 596, s. 2-3, 29 Cemaziyahîr 1297/ 8 Haziran 1880

başkaca şayanı teessüftür.

